

berbang

Kovara Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê



Dijminên gelê Kurd vê carê jî
nameyên bi bombe bi kar anîn
û EFAT QAZÎ kuştin

**Adresên komelên endam yê
Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê**

1- Komela Kurd li Östersundê.

Box: 7059
831 07 Östersund

2- Komela Kurd li Alftayê.

c/o N. Haco
Parersv. 15 A
564 01 Alfta

3- Komela Kurd li Salayê.

c/o Amed Serdan
Johannesbergsg. 1, 2tr.

4- Komela Kurdistan li Uppsalayê.

Box: 250 28
750 25 Uppsala

5- Komela Kurd li Sandvikenê.

c/o B. Batte
Konsulg. 14 K
811 33 Sandviken

6- Komela Kurd li Lindesberg:

Köpmang.10
711 00 Lindesberg

7- Komela kurd li Västeråsê.

Box: 1369
720 13 Västerås

8- Komela kulturî li Örebroyê.

Box: 537
701 50 Örebro

9- Komela Kurd li Eskilstunayê.

Box: 595
633 53 Eskilstuna

10- Komela Kulturî Kurd li Katrineholmê.

Nyhemsgatan 40
640 51 Katrineholm.

11- Komela Kurd li Norrköpingê:

Torsg. 19
603 63 Norrköping

12- Komela Kulturî Kurdistan li Göteborgê

Box: 2263
403 14 Göteborg

13- Komela Kulturî Kurd li Trollhättanê

Box: 6043
461 06 Trollhättan

14- Komela Kultura Kurd li Falköpingê

Box: 227
512 02 Falköping

15- Komela Kurd li Linköpingê:

Hospitalgr. 3
584 27 Linköping

16- Komela Kurd li Jönköpingê.

c/o Bibani Juma
Tornfalksg. 12
552 69 Jönköping

17- Komela Kurd li Başûra Swêdê

Box: 2114
220 02 Lund

18- Komela Kurd li Umeåyê.

Box: 2116
900 02 Umeå

19- Komela Kurd li Sundsvallê.

c/o F. Nozhadzade
Söndagsv. 198
86300 Sundsbruk

20- Komela kulturî kurdistan li Hudiksvälê.

Stormyrav.13
824 00 Hudiksvall

21- Komela Kurd li Bollnasê.

Box: 320
821 01 Bollnäs

22- Komela Kurd li Söderhamnê.

c/o Tayfor Patai
Tallv. 24 C
826 00 Söderhamn

23- Komela Kurdistan li Spångayê.

Box: 4118
163 04 Spånga

24- Komela Demokrat a Jinên Kurd.

Box: 4033
163 04 Spånga

25- Komela Huddingeyê.

Box: 4088
141 04 Huddinge

26- Komela Kurdi li Upplandsväsby.

Box: 129
194 22 Upplandsväsby

27- Komela Kulturî Kurd li Järfällayê.

Box: 2016
175 02 Järfälla

28- Komela Stockholmê.

Box: 45 205
104 30 Stockholm

29- Komela Botkyrkayê.


Box: 3038
145 03 Norsborg

30- Komela Kulturî Kurd li Nynäshamn.

c/o A. Kakamami
Odinsv. 5B
149 33 Nyneshamn

Yekîtîya Ciwanên Kurd Li Swêdê

Box: 45 205
104 30 Stockholm



BERBANG

Organ för Kurdiska Riksförbundet
Organa Federeasyonê Komeleê Kurdistanê
li Swêdê

Ansvarigutgivare/Berpirsiyar:
N. Kiriv

Redaktion/Redaksiyon:
A. Tigrîs, Aso Germiyani, Cemşîd
Heyderî, L. Cengîn, Hesênê Metê,
Mahfûz Mayî, M. Ali K., Rohat,
Temo Zêrin

Amadekarê Beşa Zazakî:
H. Diljen

Sättning och Layout:
Bavê Rojbîn, C. Heyderî, N. Kiriv

Adress:
Box 45 205
104 30 Stockholm/Sweden

Telefon: 08/668 60 60

Postgiron: 64 38 80-8

Premumeration/ Abonem:
Kes/Enskilda: 100 Skr/sal/år
Meqam/Myndigheter: 200 Skr/år

Annons/İlan:
Rûpelên navîn/İnsidor: 1000 Skr

Redaksiyon ne berpirsiyara nivîsarên
bî înzê an nivîs û gotinên Federeasyo-
nê ye. Nivîsarên ku ji Berbangê re tîr
şandin, heke çap ji nebin, li xwedî
nayên veşerandin.

ISSN - 0281-5699
Sal: 9, Hejmar 5/90 (66)
İlon 1990

Apec tryckeri-Stockholm

Naverok

Beşa kurmanciya jor	Rûpel
Çi, ne siyaset e? N. Kiriv	5
Dijminên gelê Kurd vê carê ji nameyên bi bombe bi kar anîn û Efat Qazî kuştin	6
Koça dawîn ya Efat Qazî bû xwepêşandaneke siyaset	7
Xwedike binanê xwe û berde canê xwe, L. Cengîn-A. Tigrîs	8
Hevpeyvîn li gel Kak Selîm Cewher	13
Konferansa Kurdên Sovyetê li Moskovayê, Cemşîd Heyderî	15
Li ser "pîrsa pîrsan" çend gotin, Nacî Rodî	20
Dîtina ku "Her tişt bi min dest pê dike û ez yekemîn im!, A. Tigrîs	21
Pêwîst e ku hiqûqnasên Kurd li Swêdê û li hemû welatên Ewropayê rêxistina xwe xurt bikin, İbrahim Guçlu	22
Her ku diçe esrarkêşî di nav biyaniyan de zêde dibe, Abîr Diyarbekirî	24
Li ser romana Elîyê Evdîrehman, Rohat	26
Ji bo ku em gula berbero di berfê de ji bîr nekin!, Ehmed Huseynî	28
Ji evîna kevnegundî (helbest), M. Mayî	29
Ferhengoka Termînolojîyên hiqûqî bi swêdî-kurdî hate amadekirin. Şoreş Zîrek	30
Bibin abonê rojnama "Riya Teze," (Bang), Tîmûrê Xelîl	31
Ji weşanên nû li welêt, li ser kitêba E. Qeremî, Rastî Hirorî	32
Smirnoff (Çîrok), Hesênê Metê	33
Rond, (helbest), Ehmed Huseynî	35
Beşa zazakî (dimilî)	
Heme partiyê Kurdan jêw bê û nê fersendî meremnê!, H. Diljen	36
Ez bahrî ra fek nêviradana! Koya Berz	39
Tîmûrî Xelîl: Ma do dest bi herfandê latîniya bikerê	40
Du helbest ji Hemedê Mamekîz: Welat û Xime	40
Beşa kurmanciya jêr	
Postey Berbang	42
Penaberanî Kurdî Iraqî le Turkiye	44
Kurdqiran û yasay new dewletan	48
Rêgay heq (paşnawey jimarey rabirdû)	50
Konferansî Kurdekanî Sovyet le rageyandinî Sovyet da	52
Xwepêşandani Kurdekanî Sovyet le Moskow	53
Gotari Komeley Ronahî le Gurcistan	55
Bangawazek bo Gorbatçov	57
Beyanî Kotayî Konferansî Moskow	59
Li ser Konferansî Kurdekanî Sovyet le Moskow. Cemşîd Heyderî	61
Nameyekî kirawa	62
Dagirkirdinî Kuweyt	63
Le karwanî şehîdanî Kurdistan- Efatî Qazî	65

XELATA BERBANGÊ

Ji bo çîrok û helbestên kurdî

Berbang, kovara Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, pêşbirkeke ji bo çîrok û helbestên kurdî (ji hemû zaravan) li dar dixê û wê ji îsal pêve ji bo çîrok û helbestên kurdî xelat belav bike.

- * Navê xelatê, XELATA BERBANGÊ ye.
- * Hemû kurd, ên li welêt û li dervayî welêt, dikarin beşdarî wê pêşbirkê bikin.
- * Ji bo Xelata Berbangê, ji hemû zaravên kurdî, çîrok û helbestên yekem wê bîr hilbijartin. Qimeta xelatê ji bo çîrok û helbestên yekem 5000 kronê swêdî ye.
- * Hemû çîrok û helbestên heja wê wekî pirtûkekê bîr weşandin.
- * Hevalên ku dixwazin di wê pêşbirkê de beşdar bibin, divê berhemên xwe heta roja 31.10.1990'î bigihînin adresa Berbangê. Berhemên ku dereng bigihî adresa Berbangê, beşdarî pêşbirkê nabin. (Ji bo tesbîtkirina tarîxa hatinê, mora postê muteber e).

Şertên (mercên) Beşdarbûnê:

- 1- Endamên juriyê nikarin beşdarî pêşbirkê (musabaqê) bibin.
- 2- Berhemên beşdar divê li tu derî nehatibin weşandin.
- 3- Şair an nivîskar divê di binê berhema xwe de navê xwe î rastîn nenivîsîne, li şûnê divê NASNAVEK binivîsîne. Bo nimûne: Şîna Mehmet Uzun, divê nasnavek wekî "Rûgeş" bête nivîsandin. Navê rastî tevî navnîşana nivîskar di zerfêke devgirtî de û li ser zerfê tenê NASNAV nivîsandî be. Ev zerfa devgirtî û Berhema nivîskar di nav zerfêke din de, divê li ser navnîşana jêrîn bête şandin.
Navnîşana Şandinê:
Xelata Berbangê
Box: 45 205
104 30 Stockholm/Sweden
- 4- Berhem li xwedî nayên veşandin.
- 5- Berhemên şandî, divê bi daqîlo an ji bi destxetêke wisa be ku herkes di xwendina wê de bikaribe têbîghê. Berhemên şandî yê ku neyête xwendin, beşdarî musabaqê nabin.
- 6- Çîrok divê zêdetirîn 30 rûpelê daqîloyê (A4) bigre.
- 7- Herkes dikare hem ji bo beşê çîrok û hem ji bo beşê helbestan berhemeşî bişîne.
- 8- Xelata Musabaqê wê di roja 26.01.1991'ê de, bi şahî bê belavkirin.

Navên endamên Juriya Musabaqê:

- 1-Şerko Bêkes, 2-Hema Said Hesên, 3-Cemşîd Heyderî,
- 4-Rojen Barnas, 5-Mehmet Uzun, 6-Mahfûz Mayî
- 7-Malmîsanîj, 8-Mustafa Duzgun

Bi çîrok û helbestên kurdî

beşdarî XELATA BERBANGÊ bibin!

Roja dawîn : 31.10.1990



ÇI, NE SIYASET E?

" Ku em bi zanînen xelkê, bibin zane jî,
lê tenê bi aqilê xwe dikarin bibin bîaqil. " *Montaigne*

Ziman di navbera mirovan de pira danûstendinê ye. Ew, ji bo ku mirov hevdu têbigihijîn, îmkanê hêja ye. Lê çi heye ku pîrî caran mirov hevdu tênagihijîn. Û ev yeka di pêwendiyên navbera mirovan de dibe pîrseke girîng. Ji bo çareserîna vê pîrsê mirov dikare du rêyên fikrî, bifikire. Yek ji wan ew e ku divê mirov bikaribe bi serê xwe tenê bijî û ne muhtacî mirovên din be. Lê, tu kes û tu carî nikare şertên jiyaneke weha, îmkanên jiyaneke yek kesî pêk bîne. Mirov hebûneke civakî ye û muhtacî mirovên din e. Ji ber vê yekê pîrs, bivê-nevê bi rêya din, bi peydakirina îmkanên têgihîştina hevdu ve, çareser dibe. Bi ya min zimanekî zelal, bi mana û hêsan, yek ji wan baştirin îmkanan e.

Çawa ku gotinên zimanekî hene, wisa jî zimanê gotinan heye. Her gotin tiştekî îfade dike, yan jî ji bo ku tiştekî îfade bike, tê afirandin û bikaranîn. Ji bo ku mirov hevdu têbigihîje, divê gotinên zimên ker û lal nebin.

Min di hejmara çûyî de, li ser gotina îdeolojîyê û li ser armanca me ya jîbîrbûyî, dîtinên xwe nivisand. Hin heval di wê baweriyê de ne ku min bi wê yekê siyaseta kiriye, an jî ji çerçewa Berbangê derketime der.

Ez bi xwe li gel wê yekê me ku em bi pîrsên xwe yê rojane û yê berbiçav, mijûl bibin. Ji xwe, loma min xwest, ez bibêjim ku di derheqê jiyana de, ji bo me ne ramanên (fikrên) îdeolojîk, ramanên «berbiaqila» pêwîst in. Û dîsa min gotibû ku ji bo yekîtiya me armancake maqûl hebe, bes e. Ev her du noxte pîrsên metodîk in û ne tenê pîrsên siyasethokar, herweha yê herkesî ne. Bo nimûne; Ku em bixwazin bi «pîrsa jinan» mijûl bin, ma em ê ji xwe pîrsa pîrsan nepîrsin û nebêjin: Çima? An jî bi gotineke din, ji bo çi em ê bi «pîrsa jinan» mijûl bibin? Û bersîva rast ya vê pîrsê, armanca me ye. Pîrsa din: Em ê çawa «pîrsa jinan» çareser bikin? Hemû bersîvên vê pîrsê, an pêşniyar, an proje, an jî program in, lê hemû jî fikrî ne. Serqisê, ku jinên me bêjin: «pîrsa jinên Kurd sê cûre zordestî -çînî, netewî û cînsî- ye». Ku pîrs ev be, çare jî eşkere ye. Divê meriv berê biçe, jinên kurdan ji mîrên wan rizgar bike, dûre biçe çar dewletên dagirker ji Kurdistanê derbike, li wir, berê Sosyallîzmê û paşê jî komunîzmê ava bike ku ev «pîrsa jinan» çareser bibe! Kadroyên Federasyonê, redaksiyona Berbangê û hemû rêxistinên demokratîk çawa bikaribin vê pîrsa «nesiyasî» û hem jî îro çareser bikin? Ma ev îfadekirina pîrsê û stratejîya çareserîna wê, ne trajî-komediyên îdeolojîyê ne?

Lê, helbet di rastiyê de pîrsên xas û berbiçav yê jinan û herweha gelek pîrsên din yê civakî hene û divê bi awakî «berbiaqila» bîn îfadekirin û çareserîna wê.

Noxte sêyem ya metodîk jî bi pîrseke din derdikeve pêşiya me: Karê çareserîna pîrsên civakî, çi ye? Bi ya min ev kara bi xwe, siyaseta e. Çima?

Siyaset, birêvebirina jiyana civakî ye û ne tiştekî din e. Ev jî bo civakên normal weha ye. Îro, li civakên modern, mîna hemû warên civakî yê din, siyaseta jî realîze bûye. Jiyan li gor warên civakî, civak li gor warên jiyana parçe-parçe bûne. Her parçe jî xwe re sazgehên xwe, mirovên xwe peyda kirine. Herweha siyaseta jî, mîna hemû parçeyên din, bûye xwediyê mirovên (siyasetkar) xwe û bûye xwediyê sazgehên xwe (parlamento, senato, hukûmet, wezaret, partiyên siyasî û hwd.). Li welatên weha siyaseta nivîsîn, siyaseta gotin, ne siyaseta bi xwe ye. Ferqa siyasîbûn û siyasethokarbûn li cem xelkê pîr zelal e. Loma, ku alim, civaknas, hema yekser li ser siyaseta, lêkolîna bikin, binivîsîn, rexne bigrin, an jî nivîskar û rojnamevan kovareke siyasî bibeşînin, nabin siyasethokar. Karê wan xizmeteke civakî, bikaranîna îmkanê mirovî, kirineke siyasî ye û ewqas.

Rastî, li Kurdistanê ne mîna yê civakê modern in. Li cem me siyasîbûn û siyasethokarbûn mîna ku yek tişt bin, dixuyin. Jiyan li welatê me anormal e. Kurdistan bi tevayî jî aliyê dewletê dijmin hatiye dagirkirin û civaka Kurd jî hemû mafên xwe bêpar e. Hertîşt, lê hertîştê ku bi jiyana civakî ya kurdan ve girêdayî ye, pîrs e û civaka me bixwe girêka pîrsan e. Ji ber vê yekê, nabe ku mirov xelkê Kurd bide ber xelkê din. Bo nimûne: Dunya-alem jî bo ku mafên xwe biparêzin, aştîxwaz in, lê em jî bo ku mafên xwe bi dest xî, şerxwaz in. Dengbêjên dunya-alemê jî ber stranên xwe, pesn û xelatan digrin, lê yê me ku bi kurdî stranê li ser evîna xwe bistrê, cezayên siyasî digrin û dikevin hefsê. Zarokên xelkê roja navê xwe bi şahî pîroz dikin, lê yê me jî ber navê xwe yê kurdî, di dadgehan perîşan dibin û hwd... Helbet sedema, anormaliya vê rewşê, îdolojî û siyaseta dijminê me ye. Loma her kirinên bi navê kurdî û bi zimanê kurdî, di rastiya xwe de siyasî ne, lê ji me ve, mîna ku siyaseta bi xwe be, dixuye.

Tarîfa siyaseta ya «berbiaqila», birêvebirina jiyana civakî ye. Yanê siyaseta, ber bi armanca de, çareserîna problemên civakî, pêkanîna têkiliyên civakî, peydakirina îmkanên jiyana civakî ye. Ev rastiyeke e. Lê rastiyeke din jî heye: Mirov bi xwe hebûneke civakî ye. Hemû têkilî, îmkan, maf û pîrsên civakî, bi qasî ku civakî ne, ewqas jî şexsî ne. Divê herkes siyasî be, û ne ji bo xêra bavê xwe, lê ji bo mafên xwe yê şexsî, beşdarî birêvebirina jiyana wê bibe, bi vatîniya çareserîna pîrsên civakî rabe. Û hewl bide wê yekê ku «civakîbûna siyaseta, an jî siyasîbûna civakê» pêk were.

Û pîrsên min: Ku haya mirov ji mirov tune be û vatinaya xwe ya şexsî bi cî neyne, ma kesên ku vatinîyê bi cî binin dê tunebin? Ma dîrok nedaye xuyakirin ku ew kes dikarin bibin kesên çawa?

N. Kirîv

Dijminên gelê Kurd vê carê jî nameyên bi bombe bi kar anîn

û EFAT QAZÎ kuştin

- Efat Qazî, keça Qazî Muhemmedê pêşewa, di roja 6'ê Îlonê de, li Bajarê Västeråsê, bi nameyên bombeyî hate Kuştin.
- Şehîda Kurd, Efat Qazî 54 salî bû, li Västeråsê mamostetiya zimanê zikmakî dikir û dayika du keçan bû. Bavê herdu keçan Amir Qazî, serokê Partiya Serxwebûna Kurdistanê bû. PSK çend meh berê hatibû damezrandin.

Xuşka hêja Efat Qazî, di roja 6'ê Îlonê, saet 10.40 de, karê xwe ya mamostetiye li dibistana Stenkumla tewa dike û diçe malê. Ew di saet 12.45'an de digihîje ber deriyê mala xwe û qutîya postê vedike, nameyên ku hatine ji qutiyê digre û ber bi deriyê dimeşe. Nameyek bi bombe li ber derî diteqe û Efat Qazî şehîd dibe.

Dijminên Kurd, nameya bi bombe li ser navê Amir Qazî nivîsîne û bi xwe birine danîne qutîya postê. Name bi riya postê nehatiye şandin. Îfadê postecî jî bi vê yekê re ye. Postecî dibêje:

- Wexta ku min name bela dikirin, di nav qutiyekî de zerfêke qalîn dîtibû.

Amir Qazî li ser bûyerê dibêje:

- Hedefa dijmin ez bûm. Ev karê rejîma Îranê ye. Ez ê li hember terora dijmin serê xwe xwar nakim û têkoşîna xwe berdewam bikim.

Malbata Qazî di sala 1985'an de ji bajarê Mahabadê hatibû Swêdê û li bajarê Västeråsê bi cî bûbû. Malbata Qazî malbateke welatperwer û naskirî bû. Li welêt jî, li dervayê welêt jî ew her ji bo azadiya welatê xwe, li dijî rejîma Şah, li dijî rejîma Xumeynî, bi awakî aktîf xebatên siyasî kirin û dikin.



Efat Qazî di dehsaliya xwe de, bi çavê xwe damezrandina Komara Mahabadê, serokkomarî û şehîdbûna bavê xwe, peşewayê canfêda Qazî Mihemed dît û heta roja ku bi destê dijminên gelê Kurd şehîd bikeve, 54 sal bi bêxtreşîya gelê xwe jiya... Hemû hevalên Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê û redaksiyona Berbangê, kuştina Efat Qazî mehkûm dikin û sersaxiya Malbata Qazî û gelê Kurd dixwazin.

Koça Dawîn Ya EFAT QAZÎ BÛ XWEPÊŞANDANEKE SÎYASÎ



Keça Efat Qazî, ALA, 12 salî di hembêza xaltîka xwe de digrî û bavê wê bersîva pirsra rojnamegerên Swêdî difikire: "Baştirîn tedbîr li hember terora dijmin ew ku divê dewletên Ewrûpa nehêlin li balyozxana Îranê, pîlanê terore çêbin"



**Du hezar Kurdên ku dimeşin, ne ji çar parçeyên çar welatan e.
Ew ji yek welatî û ji yek miletî ne.**

Foto: Lase Dareberg

* Roja 12'ê îlonê, roja koça dawîn ya Efat Qazî bû. Nêzî duhezar kurdên ji Swêdê û ji welatên Ewrûpayê, ji bo birêkirina şehîda hêja hatibûn bajarê Västeråsê.

Berbanga sibê ya roja 22'ê îlonê, li gelek bajarên Swêdê û li Västeråsê, bi hezaran Kurd, bi xemgîniyeke bédeng xwe amadeyî çûyina dêra Donê (Domkyrkan) dikirin. Tava baranê ne xema wan bû. Ew her bêbextiya dijmin, dijwariya kurdbûyîna dianîn ber çavên xwe. Xwe bi xwe mana çûyina Västeråsê difikirîn. Ew dizanibûn, ku di rojekê weha de yekdestbûna Kurdan li hember dijminên bêbext, çekek ji wan xurtîrîn çekan e. Lewra diviyabû biçin û li wir amade bin.

Û ew hatin. Bi otobusan, bi otombilan, ji Stokholmê, ji Uppsalayê, ji Örebroyê, ji Eskilstunayê, ji Sanvikenê, ji Lindköpingê, ji Göteborgê, ji Sundsvälê, ji Söderhamnê, ji Salayê, ji Alftayê, ji Karlstadê, ji Östersundê, ji Bolnäsê, ji dehan bajar û kampên li Swêdê, ji welatên Ewrûpayê, nêzî duhezar Kurdên welatperwer û Swêdîyên hevalbend, ji bo ku xwişka me ya hêja birêbikin cem şehîdên Kurdistanê, li ber dêra Donê civiyan.

Û nêzî du hezar kurdên bi tevî hevalbendên xwe yên swêdî, bi qasî du saetan di bin baranê de, bédeng, lê xemgîn heta goristana Hovdstalundê meşîyan. Ew bû meşeke siyasî, xwepêşandeneke Kurdan û yekitiyeke bédeng. Lê te digot qey bédengiya Kurdan diqîrya û digot:

"Em li hember dijminê bêbext serê xwe xwar nakin! Em bi hezaran Kurdên li vir, ne ji çar parçeyî ne, em ji yek welatî ne, ji yek miletî ne û em namirin! Û dijminên bêbext! Vaye hûn îro dibînin, berî ku xwîna şehîdên me sar bibe, em helbestên şehîdan dinivîsinin û sibê, em ê dîsa li Mahabadê, li ber çavên we Ala Kurdistanê bilind bikin". ●

"XWEDÎKE BI NANÊ XWE

SEDDAM Û BAAS VÊ CARÊ KUWEYT WERGIRTIN GELO SEDDAM DAWIYA XWE BI DESTÊN XWE TÎNE?

Amadekar: Loran Cengîn û Amed Tigrîs

* 30 sal şer bi gelê Kurd re, 8 sal şer bi Îranê re û nuha jî şer li dijî Ereban bi xwe. Bi wergirtina Kuweyt'ê di 2'ê tebaxê de serkirdayetîya dewleta Iraqê carek din nişan da ku astenga herî mezin e li ber aştîya Rojhilata navîn. Lê, ev car, ji carên berê gelekî cuda bû. Dunya, ya ku heta îro li ber hemû zordarî, êrişkarî û terora partiya Baas ya faşistî Iraqê û serokatîya wê ya diktator bê deng dima, vê carê ji bo menfaatên xwe yê aborî û ewletîya herêmê, bi yekdemî û bi giştî hemberî êrişkarîya rejîma Bexda rawesta. Ev zêdetirî yek meh e, ku hemû danezanên ragihandinên cihanî, raya giştî agahdar dikin bi dîroka reş ya Saddam Huseyn El Tekrîfî. Berî hemû tiştî jî zordarî û jenosîdên ku li hemberî netewa Kurd li Kurdistana Iraq hatine pêkanîn, wekî nimune didin.



T îstekî diyar e û kes jî Netewa Kurd baştir nizane ku dîktatoriya Saddam ne berhema bi wergirtin û îlhakkirina Kuweytê ye, ne jî bi roja 2'ê tabaxa 1990'î dijminatîya Baas pêşberî aştîya herêmê destpêkiriye. Ji sala 1968'an heta îro, ku Saddam û Partiya wî BAAS, rejîma Iraq girtine dest, her roja wan nimûneyên şerê neînsanî hemberî têkoşîna meşrû ya gelê me ku bi hemû metodên zordariyê dagirtine, li ber çava ne. Lê çerxa cihanê bi awakî dî dizivire, pêwist bû Saddam, di çend saetan de bikeve Kuweytê, wê wekî xaka Iraqî bide xuyankirin, ji bo ku şerê

Wêneyek ji wêneyên Heleçeya xopan. Îro dinê bi du wêneyên Helepcê ketine, ji bo ku nişanê hevûdu bidin û îspat bikin ku Saddam çiqas bêbext û zalim e!

man yan nemanê ya gelê Kurd, bi awakî fereh bikeve rojevê.

REWŞA IRAQÊ BERÎ WERGIRTINA KUWEYTÊ

Piştî şerê 8 salan bi Îranê re, Iraq bi taybetî di nav welatên Ereban de bû xwedî peyveke giran. Bi rastî eger mirov bi çavekî realîst li netîca şerê Îran û Iraqê temaşe bike, wê bighe vê bawe-

riyê ku Iraq jî şer wekî aliyê serfiraz derket. Tebî, ya ku pêwist e neyê jibîrkirin, zêdeyiya dunyayê bi sedemên cuda cuda piştgiriya Bexdayê kirin. Nuha baş tê zanîn û di rojname û kovarên xwedî granî de jî hate diyarkirin ku rêxistina parastina Dewletên Yekbûyî yê Emerîka -CIA gelek wêneyên ku di dest de hebûne li ser cihên leşkerî yê stratejî yê Îran, diyarî Iraqê kirine.

Û BERDE CANÊ XWE"



Foto : Stefan Hjérten

Her wusa bi awakî berdewamî, musteşarên leşkerî yên Sovyetê di xizmeta ordiya Iraqê de bûne. Alikarî ji welatên Ewrûpa Rojava û Rojhilat her hatibûye kirin. Bi komkirina van tiştên jorîn, Iraq di dawiya 1980-yan de sistemeke giran ya leşkerî didan pêkanîn û xuyakirin ku di çekên kîmyewî û biyolojî de hêza sêyem ya dunyayê ye.

Lê şer bi xwe re barekî gelekî giran

jî anîbû ser aboriya Iraqê. Wekî hate zanîn, deynên Bexdayê nêzî 100 milyar dolar bû. Bêkarî bi awakî gelekî zêde bû û bû pîrsek ji yên herî giring. Gelek kargeh nedikarîbûn kar bikin yan jî berhemên wan bi nivî bûn. Ango aboriya Iraqê roj bi roj bi xerabûnek ferehtir diçû.

Di dema 8 salên şerê li dijî Îranê, têkoşîna hêzên opozîsyonê li Iraq ji bo

demokrasi xurtbûnek dît. Bi taybetî li herêmên Kurdistanê, pîrsa bidestxistina mafên netewî gihîste encamek bilind. Rejîma faşîst ya Bexdayê ji zeîfbûna xwe di adar û tebaxa 1988'an de, pêşî li Helepçe û dawî li Behdînan jenosîdên kîmyawî kirin. Bi hezaran zarok, jin û kalên Kurd bi gazên kîmyewî hatin jehrîkirin û şehîdkirin. Mixabin, di wê demê de dunya bêdeng ma, yan jî dengên zeîf li pêşberî van qetlîamên neînsanî derketin, lê tu tesîr nedan. Bêguman îro tê dîtin ku vê bêdengiyê xurtiyek dabû Iraqê ku heta bawer bê -çi bike wê jê re bimîne.

Lê dîsan gelê Kurd wekî gelek caran di dîroka wê de dubara bûye, piştî wê êş û derba mezin dîsa hate ser piyan û ji destpêka 1990'î ve, hêzên pêşmergan derbasî Kurdistanê bûn, dest bi çalakiyên leşkerî yên serfiraz jî kirin. Pîrsa Kurdî carek din derbasî rêza pêşîn di jiyana siyasiya Iraqê de dibû. Pêwendiyên têkoşîna netewa Kurd bi hêzên demokrat yên Iraqê re ferehtir bûn. Wekî tecrubeyek mejûyî-dîktatorî ji bo ku pîrsên di navbera welat de binerd bikin, pêwîst bû problemên mezin bin holê.

Di roja 2'ê tebaxa 1990'î de ajansên dunyayê, ev nûçeyê sensasyonel belav dikirin: "Hêzên leşkerî yên Iraqê, cîranê xwe welatê Kuweytê wergirt!"

ÇIMA KUWEYT?

Kuweyt welatekî herî dewlemend e, ne tenê di di Rojhilata Navîn û welatên Ereban de, lê li tevayîya cîhanê. Di belavkirina xezîna dewletê (butçe) de serî her kesî zêdeyî 15 hezar dolarê emerîkî dikeve. Her wusa ev dewlemendiya Kuweytê bûye sedema pêwendiyên bihêz di navbera wî welatî û piraniya dewletên dunyayê de. Ji sala

azadbûna xwe (1961'an) ve jî bi taybetî di gel welatên Rojhilata Ewrûpa û Emerîka bi hêztir bûye, nêzîkahiya Kuweytê.

Di şerê Iraq-Îranê de welatên Xelîc 30 milyar dolar alîkariya Iraqê kirin. Ji wan 14 milyar dolar ji alî Kuweytê ve hatibû dan. Piştî rawestina şer gava dem hate vegerandina van peran dijî-tiyên mezin destpêkirin ku derkevin. Iraq ji dervî vê dest pê kir ku bide xuyakirin -Kuweyt beşek ji xaka Iraqê ye ku sazûna vê dewletê meşrû nebûye(!). Tebîî ye her kesî ev pirs dida -baş e piştî dewleteke serbixwe ji 30 salî ve, gelo îro çima Iraq pirsê wusa tîne holê. Lê dihat jibîrkirin ku li aliyê din ya medalyonê Seddam Huseyn û BA-AS hebûn. Heta di destpêka rojên van dijîtiyan de, piştî pêwendî li gel nûnerên rejîma Bexda û ya Kuweytê, serokomarê Misirê Husnî Mubarek û qralê Urdir Huseyn diyarkirin ku "Iraq êrîşê

Kuweytê nake!" Piştî du rojan, leşkerên Iraq ji telewîzyon û radyoya Kuweytê bang kirin, ku "ji bo piştgiriya gelê Kuweyt da ji serokatiya gemar ya Şêyh Sabah xelas bibin, ketiye xaka Kuweytê û dest daniye ser mekanîzma dewleta Kuweytê."

Bi vî awayî dê nêzîkî sedî 10 petrola dunyayê di bin xizmeta Seddam û rejîma wî bibûya. Çawa ji buhayê "zêrê reş" zêde kiribana, pêwîst dibû herkes guhdariya wî bike. Bi kurtî dunya dê mecbûrê Iraqê bibûya(!) Wî bi kevirekî du çûkan bikûje! Seddam dibû xwedî dewlemendiya zêrê reş û her weha pirsê demokrasî û pirsê netewî Kurdî li Iraqê dê bihata veşartin.

ENIYA FEREH LI DIJÎ IRAQÊ

Ji roja wergirtina Kuweytê ve li hember Iraqê di destpêkê de jî ji bal DYA,

welatên xwedî giranî li Ewrûpa Rojava wekî Bîrîtanya, Fransa, Îtalya û hwd, ji dervî Yemen, Sudan, Lîbya ve hemû welatên Erebbî reaksiyonek xurt dane diyarkirin. Paşê jî Organîzasyona Yekîtiya Netewan di dîroka xwe de biryarên herî tûj li dijî Iraqê girtin.

Li ser daxwaza Siûdî Erebbîstan, Qatar û Bahreyn ji bo parastinê ji êrîşên mumkun yê Iraqê, leşkerên DYA, gelek welatên Ewrûpa Rojava, Misir û Sûriye, hatin xakên van welatan. Gerandina Planên xerîb dest pê kirin! Hate gotin ku îmkân heye alîkarî ji Îsraîl bi xwe bête xwestin.

Iraq bi hezaran însanên biyanî yê ku li Kuweyt û Iraqê kardikin û bi taybetî welatîyên Emerîka, Fransa û Bîrîtanya û wekî din girtin. Li gor daxuyaniya Partiya Demokrata Kurdistan, ew nuha wekî -mortalên parastinê- di kargehên çekên kîmyewî, çekên din û cigehên eskerî de, hatine bicihkirin.

LI SER KRÎZA XELÎCÊ DÎTINÊN ŞEXSÎ

Me di derheqê krîza xelîcê de li Stockholm û Uppsalayê ji çend kurdan "li gor te divê rawêja (tewr) Kurdan di derheqê krîza xelîcê de çawa be?" pirsî. Ew bersîvên wan kesên kurd bi kurta hî li jêr pêşkes dikin.

Aram Bêwey (31 salî, ji Kurdistanê Iraqê):

Berî her tiştî divê Kurd xebata yekîtiyek fereh-bikin. Ne bi tenê li perçeyê Kurdistanê, lê li seranserê Kurdistanê. Eger em li bend û hêviya Ereban bin, wê çaxê encama mafê Kurd nîne. Divê xebata Kurdan ji bo Kurd û Kurdistanê be.

Rizgar Soranî (29 salî, ji Kurdistanê Iraqê):

Ji bo Kurdan îro firset e, Kurdan ji şerê navbera Iraq û Îranê de ku 8 salan dom kir, tiştêk bi dest nexist. Diyar e, ku bi daxwaz û xebata otonomîyê Kurd hîç nagehên mafên xwe yê netewî.

Sîyaseta rêxistinên Kurd divê di nav Kurd û serkirdayetiye de rast û demokratîk be. Divê îro Kurd ji bo rûxandina Seddam hêzên xwe bikin yek

Perî Azadî (35 salî ji Kurdistanê Iraqê):

Kurdên me ta îro pişt bi Îran û Îmaman girê dabûn. Ji aliyekî din ve jî dixwestin guftogohan li gel Seddam pêk bînin. Ew rawêj û sîyaseteke çewt e. Pişt bi Erebbî, Fariş û Tirkan nayê girêdan. Divê Kurd bi hêz û destê xwe mafê xwe bigrin. Pêwîst e, Kurd mafê xwe yê çarenûs diyar bike. Divê di nav Kurdan de wekhevî û demokratî hebe. Kar û karyera şexsî tune be; kolektîf hebe. Divê Kurd yek deng û yek dest bin. Îro xebat ji bo rûxandina Seddam be.

Xorto (36 salî, ji Kurdistanê Tirkiyê):

Di mesela Kuweytê de hinek dibêjin Seddam û rejîma xwe li dijî împeryalizmê ne. Ne weha ye. Seddam û rejîma xwe li dijî împeryalizmê nînin. Ji aliyê

din ve, wek masmediya Rojava birê dide Emerîka û hevalbendên wê jî ne demokratîk in. Ev şerê wan ne li dijî dîktatoran e. Leca kûçikan li ser laşê kerê ye. Ew jî petrol e. Ez wek kurdekî, ji bo xelkê Iraq û Kuweytê nikarim bêjim "li cem kûçikê xwe cih bigrin". Ez dikarim bêjim kûçikê xwe ji desthîlatiyê bixînin. Li gor min çare şerê hundirîn e.

Leca me Kurdan jî ne leca laş e. Û cihê me ne li cem kûçikê mezin û ne jî li cem yê biçûk e. Leca me do çi bû, îro jî ew e. Prensîbên me do çi bûn, divê îro jî ew bin. Armancê Kurdistanê yekgirtî, serbixwe û demokratîk e. Ev prensîp ji bo vî şerê ha jî derbas dibe.

Rêber (36 salî)

Seddamê faşîst rûyê xwe yê reş hîn reştir kir. Ew dixwaze Helepçeyêke din pêk bîne. Lê vê carê ez ne bawer im, ku ev bûyer bi hêsanî wek plana ku Seddam amade kiribû pêk bê. Lê ji bo me Kurdan du tiştên girîng hene. Yek ji wan ketina rejîma Iraq Seddam e. Ya din jî, ji me Kurdan re, di roja îro de

Serokkomarê Emerîkayê Bush, Seddam wek Hîtlerê nuh bi nav kir. Yekîtîya Sovyet xwest ku Iraq bê qeyd û şert ji Kuweytê derkeve. Wezîrê derve Şevardnadze got ku Iraq, çekên Sovyetê yên ku ji bo parastinê hatine firotin, ji armancên êrîşkarî hatine bikar anîne. Bîrîtaniya, Fransa, Elmanya, peyvên wekî zordar, qatîl, dizê Bexdayê û hwd hemberî Seddam gotin. Gelo ev hemî ne encamê wekî di gotina pêşîya ya Kurdan de tê gotin "Xwedî bike bi nanê xwe û berde canê xwe" ye... ?

Bi van hemû tiştên jorîn, gelekî baş diyar bû; Dunyaya ku li pêşberî hemû zilm, zordarî, jenosîdên Seddam li hemberî milletekî ji dehan salan ve bêdeng mabû, gava pirs dihate menfaetên wan yên aborî û netewî, bi xurtî dengên xwe bilind dikir. Seddam û BAAS yên ku fêr bûbûn çî bikin, bo wan bimîne vê carê gavên xwe şaş avêtibûn. Bersîva xwe jî gelekî zû girtin:

Seddam pêwîst e cezayê şaşîtiya xwe bide. Seddam dîktator bû, Faşîst bû, numûne jî gelek bûn, tiştê ku pêşberî Helepçe û Behdînan kiribû her roj di televîzyonan de dihatin nîşandan. Gava Seddam bi zarokên Bîrîtaniyê re di televîzyona Iraqê de xwe nîşan dide, wekî mirovekî "zarokperwer", telewîzyonên dunyayê paşî zarokên Kurd yên ku bi çekên kîmyewî hatibûn şehîdkirin, di programên xwe de diweşandin. Herkesî nuha baştir didît ku Seddam li dijî Kurdan çî kiribû...

TEWRA TURKIYÊ, ÎRAN Û SÛRIYÊ

Welatekî ku beşekî Kurdîstanê dagir kiribû jî aliyê hemû Dunyayê ve dihat rûreşkirin. Gelo eger şer derkeve, pirs Kurdî dê bi tevayîya giraniya xwe, neyê rojevê jî bo çareserîkirinê? Ev bû pirsê herî girîng di pêşîya jiyana sîyasî

ya Enqerê de. Li gor dîtina aqilmend û şewirmendên rejîma Turkiyê, pêwîst bû dewlet bi awakî aktîv di krîza Xelîçê de cih bigre jî bo ku karibe bibe asteng di pêşîya aktuelkirina pirsê neteweyê Kurd de.

Enqere piştî biryara ambargoya aborî ya Organîsazyona Yekîtîya Neteweyan (OYN), pêşberî Iraqê, xeta petrola Kerkûk-Yumurtalikê girt. Parlamentoya Enqerê biryar girt ku karibe leşker bi kar bîne di şerekî dijî Iraqê de û leşkerên biyanî li Turkiyê bi cih bike. Gihîştê vê encamê ku serokkomarê Turkiyê T. Ozal diyar kir: "Ango Emerîka li bakurê Iraqê dewletek Kurdîstanê çê bike em ê bi ordiya xwe bikevin wir û wê xirab bikin". Ev nîşaneke din bû ku dîsa av ji devê tirkan tê jî bo destxistina petrola Kerkûk û Mûsilê.

Îran, belkî jî feyda herî mezin dît, ji îzolekirina Iraqê jî bal welatên cîhanê

polîtîkayêke durust divê. Ku li gor armanc û daxwaza Kurdan jî vê bûyerê fêde bê dîtin.

E. Cotkar:

Îro Kurd belav in. Berî her tiştî pêwîst e, ku Kurd yek bin. Kurd bi eqîl û çavên xwe li doz û bûyerê binêrin. Qîr û cîr li ser petrolê ye. Ev dewletên ku îro li dijî Seddam dertên, wan bi xwe Seddam kirin Seddam. Her kes jî bo kara xwe dike. Ji bo kara Kurdan jî çî pêwîst e, divê Kurd bikin.

Merzîye Ferîqî-Razazî (ji Kurdîstana Îranê):

Li gor bîr û bawerîya min divê Kurd ne alî Seddam û ne jî li alî Emerîka bin. Çûnkî kirin û xebatên wan jî bo me vekirî û ronahî ye. Kurd îro ne xwedî bi hêz û qudreteke mezin in, ku bikaribin li herêmê tesîr bikin û guhertinan pêk bînin. Îro hêz û qudret bi kar tê, ne qise. Ji bo hîç aliyekê divê Kurd xwe nekin berpal û mertal.

Zagros (28 salî, ji Kurdîstana Sûriyê):

Kurd wek rêxistin divê bi hev re bin. Niha kes alîkariya Kurdan nake, ne

Sovyet û ne jî Emerîka û ne yên din. Kîjan dewlet alîkariya Kurdan bike baş e. Niha rewşa pêşmerge gelek qels e. Ku Seddam here û li Kurdîstana Başûr dewletekê çê bikin, Sovyet û Emerîka wê dewletê qebûl bikin, wê demê rejîma Iraqê qels dibe. Bi kurtayî, ku Seddam bikeve, Kurd dê xurtir bibin.

Bavê Azad (35 salî, ji Kurdîstana Turkiyê, Kurdê Lubnanê):

Li herêmê çiqas xirabî çêbe, herêm çiqas li hevdu bikeve û çiqas xirabî bibe, bi Seddam dibe, bi bawerîya min dê hewqas jî ji Kurdan re baş bibe. Û çiqas Kurd ber bi hev bînin, bîr û enîyan çêbikin, dê ji milletekî me re baş bibe. Îro gelek îmkânên Berey (Cepha) Kurdîstana Iraqê hene. Dimîne ew şerê di navbera Iraqê û yên din de. Ez bawer dikim ku dê di nêzik de tiştêkî çêbibe, ne dîr e. Xwedê bi me re be!

Mustafa (35 salî, ji Kurdîstana Turkiyê):

Bi rastî ez dixwazim şer derkeve. Dema ku qetlîama Helepçe tê bîra min, ez dixwazim li Iraqê kevir li ser kevir nemîne,

Timûrê Xelîl (40 salî rojnamevanê Riya Teze, ji Yekîtîya Sovyetê -Erîvanê):

Dîtina min ev e, ku divê Kurd tevê vî şerî nebin. Çima? Ji ber ku ew ne şerê me ye. Ne şerê neteweyê Kurd e. Şerê dewletan e. Divê pirsê şerê bê saffîkirin. Ji ber ku şerê ku çêbe, dê li ser erdê Kurdîstanê be. Hem li Kurdîstana Turkiyê û hem jî li Kurdîstana Iraqê. Lê tiştêkî heye; kî gunehkar e, divê bê cezakirin. Seddam û dorberên wî gunehkar in, divê bînin cezakirin. Yê ku avêtiye ser Kuweytê ne gelê Iraqê ye, rejîma wê ye. Ew rejîm divê bê hilweşandin. Rejîmeke faşîst e. Milletekî me jî zû ve bi vê yekê dizanî bû.

Huseyîn Seîdî (41 salî, ji Kurdîstana Îranê)

Rewşa îro jî bo gelê Kurd rewşeke baş e. Divê hemû Kurd bê ihtîlafên sîyasî beşdarê rawêjeke (tewreke) weha bibin, ku tesîrê li ser Emerîka û dewletên din bikin û wan îqna bikin, ku ew qebûl bikin jî bo dabeşkirina Iraqê û pêkanîna Kurdîstaneke serbixwe.

ve. Bexda daxuyanî da ku peymanê Cezayîrê ya 1975'an qebûl dîke, êsîrên şerê Îran-Iraqê tê guhertin, ji xakên Îran ku wergirtibûn derdikeve. Daxwaza aştiyê û başçiraniyê jî, ji Tehran kir. Wezîrê derve yê Iraqê çû Îranê ku pêwendiyên deyne. Lê Îranê piştî van hemû tiştan jî nişan da, ku piştigiriya biryarên Organîzasyona Yekîtiya Netewan dîke. Piştî çareserkirina pirsê Kuweytê diyar kir ku li dijî leşkerên dewletên din di herêma Rojhilata Navîn de bimînin.

Sûriye reaksiyoneke xurt li dijî Iraqê nişan da û 4 hezar leşker şand Siûdî Erebîstanê. Şam dixwaze vê hejmarê zêdetir jî bike.

MA JI BILÎ ÇARESERKIRINA PIRSA KURD AŞTÎ DIBE?

Wekî hate diyarkirin piştî wergirtina Kuweytê ji bal Iraq ve, bi taybetî Kurdên dervî Kurdistanê Iraqê baş dibînin ku birayên wan li hember çî mekanîzmek leşkerî bi hêz ev 30 sal in bê rawestan şer dikin. Wekî berpirsiyarekî jî rêxistinekî Kurdistanê Iraqê nişan dida: "Me 54 rojan berdewamî sing bi sing bi 30 hezar leşkerên Iraqê ve, yê ku bi çekên giran, helîkopter û balafirên ve dihatin parastin di 1988'an de şerekî bi deng da.

Pêşmergeyên qehreman 8 hezar leşkerên Iraqî telef kirin. 25 şehîd jî me dan. Yek gav tenê Iraqî bi pêş ve nikeribûn bihatana, her bi paş jî ketin. Lê dewletek wekî Kuweyt bi mekanîzma leşkerî, tank, balafir û raketan ve di çend saetandê, ket!"

Baş tê dîtin û ev rastiya herî mezina ku bê çareserkirina pirsê Kurdî li Rojhilata Navîn wê aştiyek berdewamî nebe. Berî her tiştî jî, îro li ber çavan e, ku welatên dagirkerên Kurdistanê ne tenê asteng in li pêşîya têkoşîna netewê Kurd, ew asteng in li pêş ewletiya herêmê û cihanê bi xwe. Hêzên siyasî yê Kurd ev tişt di nama xwe de, ya ku em çap dikin ji bo hevdiîna bilind Gorbaçov-Bush dane diyarkirin. ●

* Nama vekirî ji bo civîna bilind di navbera serokê DYA G. Bush û serokê DYYS M. Gorbaçov de li Helstînkî 09 Îlon 1990

Serokên Hêja!

Îro hûn ji bo halekê peyda bikin, ji bo krîza Rojhilata Navîn ya ku bi wergirtina Kuweyt ji alî dîktatoriya Seddam û rejîma BAAS ya Iraq ve dest pê kir, bi hêja (Gorbaçov/Bush) re hev du bibînin.

Ekselans, wekî hûn dizanin, neteweyê Kurd yê ku 25 milyon e, di nav sînorên çar dewletan de, ji hemû mafên xwe yê netewî, demokratîk bê par diji. Kurdên Iraqê yê ku beşek ji gelê me ne, li hember serkirdayetiya dewleta Iraqê di pêvajokeke dirokî de her ji bo mafên xwe yê demokratîk, netewî û mirovatiyê şer da ne. Di sa her wekî hûn agahdar in, partiya BAAS ya Iraqî û serkirdayetiya wê ya dîktator, pêşberê gelê Kurd şerek ne-mirovatiyê û dijwar dajo. Numûneyên wan yê dawî, bikaranîna gazên kimyewî di herêma Helepçe-Adar 1988- û Behdînan-Tebax 1988'an- de ye.

Serkirdayetiya Iraqê ya îro ne bi tenê di nav welatê de li hemberê Kurdan, di sala 1980'yî de li hemberî Îranê û di meha derbasbûyî de li hemberî Kuweytê bi erîşên xwe, carekê din nişan da ku hêzeke asteng e ji bo aştiyê ewletiyê (emniyeta) heremê.

Girêdayê van tiştên jorin biryargirtina ambargoya aborî, ji bal Konseya Ewletiyê-Rêxistina Yekîtiya Netewan, bi xwe Iraqê ji karakterê wê ye erîşkar bi dîrnexist.

Serokatiya dîktatoriya Seddam, li hember mafên gelê Ereb yê Iraqê jî astengek e. Serkirdayetiya dîktator hemû mafên demokratîk yê gelê Ereb bi dawî anîye.

Serokên hêja, di vê civîna we de ya ku babetê heye ji bo peyda kirina aştiyê berdewamî û ewletiyê Rojhilata Navîn, wekî nûnerên gelê Kurd em daxwaz in ku hûn e ji bo aştiyê rastane û berdewamî wek aliyekî herî girîng pirsê netewî, demokratîk û meşrû ya neteweyê Kurd jî binin rojeva xwe.

Em wekî alî ji we serokên hêja,

- Di hemû pêngavên navnetewî de ku wekî naverok pirsê Rojhilata Navîn heye, nûnerîtiya neteweyê Kurd jî wekî aliyekî girîng bête ber çavan.

- Daxwazên meşrû yê Eniya Kurdistanê Iraqê, ya ku berpirsiyariya netewê Kurd dîke li Kurdistanê Iraqê divê berçav bête girtin û di sewiya navnetewî de bête parastin. Hêviya me ev e, ku hûn dê ji bo vê yekê pêngavên pêwîst bavêjin.

Bi hêviya ku hûn di civîna xwe ya bilind de, li ser Rojhilata Navîn û mafê neteweyên me, bigihînin biryarên hêja, em serfiraziya karê we dixwazin!

09 Îlon 1990

Eniya Kurdistanê Iraq

Tevgera Rizgariya Kurdistan (TEVGER)

Partiya Rizgariya Kurdistan (RIZGARI)

Partiya Demokratîk Kurdistan (TKDP)

Tevgera Sosyalîst Kurdistanê (TSK)

Rizgarixwazên Neteweyê Kurdistan (RNK)

Partiya Demokratîk Kurd li Sûriya (El-Partî)

Partiya Demokratîk Pêşverûya Kurdên li Sûriya

Partî Karkerî Kurdistan (KIP)

Berey Kurdistan ji bo çareserkirina pirsê kurdî programa xwe heye

Berbang: *Hûn sedemên li pey êrişê Iraqê li dijî Kuweytê çi dibînin?*

S. Cewher: Di dest pêkê de ez dixwazim spasiyên xwe bo we nîşan bidim ku we îmkân dan me ku em dîtina xwe bighînin xwendevanên Berbangê. Êrişê Seddam li dijî Kuweytê ne berhema pêgaveke demî ye. Ew encamê siyaseta Seddam bi tevayî ye.

Şerî 8 salan bi Îran re, Iraq xiste tengasiyê mezîn -di warê aborî, siyasî û dîplomasiyê de-. Eger em li êrişê Kuweyt temaşê bikin, pêwîst e em deh salên dawîn yê Iraqê jî binin ber çavan.

1- Li gor statîstîkên hatine belavkirin, dewleta Iraq nêzîkî 100 milyar dolar deyndar derket, piştî şerê bi Îran re. Eva deynekî felekî ye. Her berî şer jî Iraq 24 milyar dolar deyn hebû. Bi vî hawayî mirov dikare bîne ber çavan ku rewşa aboriya Iraqê çawa bûye.

2- Her di dema şerê 8 salan de, di rewşa hundirî ya Iraqê de fîrma, kargeh û şirketan xisarên bi milyaran dîtîn. Di sala 1985'an de aborîzanên Ewropî nîşan dan ku 50 sal pêwîst e bo Iraqê ku li rewşa xwe ya aborî ya berê vegere. Ew di rewşê wisa tengasî de bû ku alternatîf li pêşiyê ne dihat dîtîn. Ji welatên Ereb tenê Kuweyt 12 milyar dolar deyn dabû Iraqê. Her wusa welatên Xelîç bi giştî 35 milyar dolar deyn dabûn. Gava şer di navbera Iraq û Îran de rawesta, rejîma Bexda nikaribû tenê faîzên deynê xwe bide, yê ku di salê de digihîştin 11-12 milyar dolar. Petrola Iraq bixwe têrî vegevandina van faîzan nedikir.

3- Iraq weke tê zanîn yek milyon leşker heye, ya ku di rewşê aborî wusa xerab de ye. Eger ev ordî bête belavkirin yan jî kêmkirin pêwîst bû ku ji van kesan re kar bête dîtîn û bête

xwedîkirin. Encamên şerê 8 salan jî li ber çavan in. 500 hezar leşkerên Iraqê di vî şerî de hatin kuştin.

4- Kurdistan çandiniyek gelek bi xêr hebû. Lê Seddam 4000 gundên Kurdistanê wêran kirin. Her wisa bi dehan bajarên Kurdan yê ku rûniştvanên wan digihan 50-60 hazarî (wekî Pêcivîn, Çwarde, Qeredax, Mêrga Sor, Gelale, Şêrwan û hwd.) wekî herêmên qedexekirî hatin îlankirin. Nêzîkî yek milyon Kurd jî cihên xwe hatin belavkirin û li jêriya Iraq û Ordîgehên hatin bicihkirin.

Ev herêm jiyana insan tê de bêimkan hatekirin. Bi vî awayî di van cihan de xêra ku dihat bi awakî wisa 'hêsanî' hate birîn.

5- Rewşa polîtîkî li Iraq, piştî 8 salên şer hîn jî xurtir bû. Bi taybetî pirsê kurdî piştî van salan bi awakî girantir hate pêşberî rejîmî Iraqê. Hate dîtîn ku Seddam bi tu awayî ji bona anîna jiyana demokratî amade nîne. Problema 22 salan ya ku BAAS bi xwe re anî di encamê de bi zêdetirîn ketin rojevê.

Iraq jî jiyaneke wisa derbas dibû. Sedemêke taybetî ya êrişê Seddam li hemberî Kuweyt ew bû ku gelê Iraq bi problema din bêne mijûl kirin. Ji ber ku di berdewama şer de rewşa xerab ku têde ye, bikeve rêzên dawî. Pirsêke din ya giring ew e ku daxwaziya -strateji ya Seddam bi serokatiya millî ya Ereban ve girêdayî ye. Seddam bi vî yekê difikire ku bi destekê du ta bileyze.

Menfaetên Ewropa rojava, Emerîka û dunya mayî bi herêmê ve gelekî girêdayî ne. Seddam hesabê van tiştan bi gelekî tenikî difikire. Petrola Iraq û Kuweytê bi hev re wekî rezerv (li gora Înstîtuya Ereb li Londonê -1985'an de) ya Iraq 101 sal, ya Kuweyt jî 207 sal e. Xwedîbûna dewlemendiyeke wisa yek

ji sedemê temehiya Seddam bûye.

Aliyekî din jî giring heye, her dîktator di pêvajokê de her çiqas di zilm û zordariya xwe de pêş jî bikeve, şaştiyêke dîrokî ya mezîn dike. Hîtlêr di nava Elmanya de her çend pêş jî ketibû gava êrişê Polonya kir, dawîya xwe di wê rojê de bi destê xwe anî bû.

Berbang: *Hûn biryarên OYN û hatina leşkeran bo herêmê çawa dibînin, gelo ev kirin têr dikin?*

S. Cewher: Seddam di 22 salîya ku rejîm di dest de ye, çî kiryê ku ji wî hatiye gotin, Aferîn! Birîtanya û Emerîka bi plan jî 63'an ve ev rejîm anî. Piştî 1968'an ku Seddam jî piştî perde ve serokatiya vî rejîmê girtiye dest xwe, her zilm û zordarî, tade û teror li gel serokatiya wî bi hevdu re meşîne. Berî rewşa 1985'an (perestrojka) Bexda gelek mecalê manewre hebûye. Tenê di navbera salên 1982-87'an Yekîtiya Sovyet bi buhayê 10 milyar dolar çek firotime Iraq (Boris Yononov-Kovara 'Sovyetîska Kultura'). Ji dervê wî Iraq çek jî hemû dunyayê heye. Di dema şerê li dijî Îran de, welatên Ewropa Rojava jî bo Bexda sistemeke çekdarî ya bilind ava kirin. Van hemû tiştan Seddam bi hêz kir û niha dunya belayê vî tiştî dikî.

Hatina leşkaren, belê em bibêjin yê derve bi biryarên OYN çêbûye. Hebûna wan di herêmê de sedema wê ya herî mezîn Seddam e. Biryarên OYN heye ku welatek bikevê xeterê de, dikare alîkariya leşkerî bixwaze. Em li gel biryarên OYN in û em dibêjin ew pêwîst in bêne naskirin. Seddam dixwaze bide nîşankirin ku şer di navbera Iraq û Emerîka de ye. Ev propagandê bi awakî xurt di nav Iraqê de tê kirin. Ew dixwaze vî propagandê bi taybetî di

nav welatên Ereban de û herweha li dervî wan jî bike.

Daxwazeke din ya Seddam ew e ku kirîz her berdewam be. Çiqasî pirs berdewam be, di nav welatên Ewrûpa Rojava, Emerîka û welatên din de opozîsyonek bête sazîrin.

Berbang: *Li gor rewşa nû, dîtîna û xebata we di çi qonaxî de ye?*

S. Cewher: Xebata PDK berî wergirtina Kuweytê jî dîyar bû. Em weke Partîyeke xelkekî bindest û dagirkirî, her dem li ser bîngeha peymanê 11 Adar 1970'î daxwazên xwe dîyar kirine. Ta ku milletê me negihîje wan mafên xwe xebat û têkoşîna me wê her berdewam be. Piştî rawestana şerê Iraq-Îran, her wekî Kak Mesûd Barzanî, dîsa di Berbangê de nîşan dabû, paşî bikaranîna çekên kîmyewî, pêwîst bû em metodên xwe yê leşkerî biguherin. Me dest bi çalakîyên partîzanî kir.

Pêşgermeyên me bi hêzeke giran di tevayîya Kurdistanê Iraq de mawcud e. Ji destpêka 1990'î de wa çalakîyên leşkerî yê serkeftî pêk anîye. Îro, piştî rewşa wergirtina Kuweytê me ev çalakî hinekî kêmtir kirin. Baş tê zanîn di destî vî dujminê zordar de çekên kîmyewî û biyolojîk yê modern hene. Peşmerge bi gribûn biçûk (15-20 nefer) digerin ku karibin li dijî êrişên kîmyewî xwe biparêzin.

Berbang: *Ango rejîma Seddam bête ruxandîna, li gor we alternatîv çi ye?*

S. Cewher: Seddam Huseyn şansê xwe yê dawîna ku hebû, ji bo çareserkirina krîzê, heta civîna Helsînkî bi kar nanî. Seddam guh neda û nade pêşniyarên OYN û welatên Ereban. Riyên bi aşîti çareserkirina kirîzê gelekî kêmtir bû. Alternatîva yekem piştî ruxandîna Seddam, tabû ye ku opozîsyona Iraqê ye. Ew jî girêdaye wê çawa ev kirîz hel bibe. Problem îro ji opozîsyona Iraqê meztir e, lê dawîya wê jî ew e -Kî were ser hukum pêwîst e opozîsyonê û bi taybetî jî Cepha Kurdistanê bîne ber çavan. Berey Kurdistanê programa xwe ji bo çareserkirina pîrsa kurdî heye û ew bîngeha danûstandîna bi her rejîmê re ye -Pêkanîna peymanê 11'ê adara 1970'î bi awakî rastane. ●

Kurtên Sovyetê berî Konferansa Movkovayê, Meş û Mitîngek li dar xistin û dengê xwe bilind kirin:

"KURDISTAN, YEKBÛN"



□ Di roja 24.7.1990'î de, li bajarê Moskoyê nêzikî hezar Kurdan mitîngek ji bo daxwaziyên xwe çêkir.

Nêzikî hezar Kurdên Sovyetê û mevanên Konferansa Movkovayê beşdarî civînê bûn. Ji bilî nûnerên kurdên Sovyetê, Dr. Mehemed Salih Cuma ji PDK-Iraqê û Mehemedê Cuwanroyî û Cemşîd Heyderî di civînê de amade bûn.

Beşdarên civînê ala Kurdistanê û bi şîarên "Kurdistan, Yekbûn" dengê xwe bilîndikirin.

Şîarên ku di civînê de hatibûn nivîsandin ev bûn:

- * Kurd otonomiya xwe dixwazin
- * Du milyon Kurd daxwaza yekbûnê dikin

* Li Sovyetê du milyon Kurd ji hev hatine belavkirin.

Di mitîngê de Şairê Kurdê Sovyetê Elî Ebdulrehman helbestek xwend.

Paşê çend kes bi dirêjî li ser dîroka Kurdan axaftin û behsa bûyerên bikaranîna çekên kîmyewî û rakirina gundan li Kurdistanê Iraqê kirin.

Mitîng du saet dom kir û di dawî de çend biryar hatin girtin. Daxwaza wan ya balkêş ew bû ku cardin otonomiya wan (Kurdistanê Sor) bê naskirin û Kurdên hatine belavkirinê dîsa vegebin ser erdê bav û kalên xwe.

Konferansa Kurdên Sovyetê Li Moskovayê

Amedekar û wergerandin ji rûsî: Dr. Cemşîd Heyderî
Wergeradin bo kurmancî: M. Mayf

Salek dibe ku Kurdên Sovyetê mîna hemû gelên din, bi taybetî yên ku di dema Stalîn û Brejnev de, mafên wan yên netewî hatibûn windakirin û tûşî bindestî û derbederî bûbûn. Ev salek e, ew ketine xebatê ji bo daxwazîkirina mafên xwe. Berî salekê Kurdên Sovyetê çend name ji serokê encumena bilind ya Sovyetê re şandin û meş û civîn çêkirin. Bi taybetî, piştî bikaranîna çekên kîmyewî ji aliyê rejîma Îraqê ve li ji dijî gelê Kurd, Sovyetê xwe bêdeng kiribû. Her weha lidarxistina çend kongre û konferansan li dijî bikaranîna çekên kîmyewî û mehkûmkirina wê, û lidarxistina Konferansa Parisê, ev hemû tişt bûne sedema wê ku li Sovyetê jî bi awakî ne rastrast behsa pîrsa kurdî bike, ew jî wek pîrseke navxoyî, da ku dewletên dost mîna Îraqê û Sûriyê û yên cîran, mîna Îran û Turkiye tûre nebin.

Bê guman, rewşa hundir û derve ya Sovyetê û guhertinên cihanî û siyasî û perestrojka û tevgera ronakbîrên Kurdên Sovyetê û derketina pîrsa kurdî ji nav qefesa welatên dagirker, ev hemû bûne rêveker ji bo çêbûna konferansa Moskovayê.

Komîta amadekara konferansê ji 25 kesan pêk hatibû bi serokatiya akademîkê Kurd Nadîr Nadîrov. Ji wan 25 kesan 6 kes ne Kurd bûn. Ew jî ev bûn. 1- Begramov Edward Elîksanderoviç, Alîkarê serokê Komîtê. Doktor li zanîna felsefê. 2- Emilyanko Enatolî Vasîliviç, lîner li beşa têkiliyên netewî li komîta navendî (PKS), 3- Kîtayev Îvan Nikîferoviç, Alîkarê serokê Înstîtuya Marksîzm-Lenîniizm, 4- Riyabov Viktor Vasîliviç, Serokê seksiyona beşa têkiliyên navnetewî, ji komîta navendî ya PKS, 5- Sazanov Enatolî Elîksandiroviç, cîgirê serokê beşa têkiliyên netewî, ji komîta navendî ya PKS, 6- Trapêznîkov Giorgî Yevgîniviç, sekreterê berpîrsiyarê komîtê, doktorê dîrokê.

Biryar ew bû ku di du rojan de çar



civîn bêne kirin, lê ji ber kêmbûna wextî gelek rapor ne hatin xwendin, lê biryar da ku tevaya raporên û belgeyên konferansê bêne çapkirin û weşandin.

Di roja 25.7.1990'î, saet 10'an de Ivan Kîtayev dest bi vekirina konferansê kir. Wê ragehand ku di konferansê de, ji bilî zaneyên Kurdên Sovyetê û nûnerên Kurdan ji hemû Komarên Sovyetê û nûnerên dezgehên dewletê wek wezareten derve, kulturî û hunerî û nûnerên encumena bilindya Sovyetê Boris Nikolaviç Elênin kucîgirê serokê encumena netewî li encumena bilind û herweha nûnerê bajarê Moskovayê û hwd di konferansê de beşdar bûn.

Di sa Kîtayev got ku nûnerên Kurdên dervey Sovyetê yên ku hatine konferansê jî ev in: 1-Ezîz Mihemmed, sekreterê giştî ya Partiya Komunistê Îraqê, 2- Kendal Nezan, serokê Înstîtuta Kurd li Parisê, 3-Dr. Mihemmed Salih Cum'e, Partiya Demokrata Kurdistanê Îraqê, 4-Dr. Seîd Şerefkendî, sekreterê giştî yê Partiya Demokrata Kurdistan-Îran, 5-Samî Abdulrehman,

sekreterê Partiya Gel ya Kurdistanê Îraqê, 6-Dr. Kemal Fuad, endamê serkirdayetiya Yekîtiya Niştimanî Kurdistan-Îraq, 7-Dr. Îsmet Şerîf Vanlî, Profesore Dîrokê- ji Swîsre-, 8-Mehmed Alî Aslan, ji Turkiye, 9-Dr. Mehmed Elî Osman, endamê serkirdayetiya Partiya Sosyalîst a Kurdistanê Îraqê, 10- Salah Bedreddîn, sekreterê giştî, Partiya Hêvgirtina Gel-Sûriyê, 14- Dr. Cemşîd Heyderî, nivîskar û rojnamevan-ji Swêdê, 15-Ehmed Karamûs, ji Swêdê, 16-Seîd Mola, ji Swêdê.

Di destpêka konferansê de, Ivan Kîtayev li ser jiyana Kurdên Sovyetê xwend. Piştî wî Nadîr Nadîrov, li ser pîrsa Kurdên Sovyetê û çareyên wan pîrsan gotarek dirêj xwend. Wî di gotara xwe de behsa dîroka hatina Kurdan bo piştî Qafqasê û otonomîya sala 1923 û ji navbirina wê di sala 1929'an de, kir. Wî bi dirêjî behsa hemû Kurdên Sovyetê kir. Dûre, Boris Nikolayoviç bi navê encumena netewî li encumena bilind ya Sovyetê, gotarek xwend û tê de behsa wan biryaran kir

ku çarekê li rewşa wan gelan bikin, yê ku tûşî zulm û zodariyê bûne. Wî diyar kir ku hêviyek ji bo çareserkirina pîrsa Kurdên Sovyetê heye.

Di konferansê de Profesor Şakiroyê Miho jî, gotarek li ser rewşa qanûnî ya mafên neteweyên gelê Kurd xwend.

Di roja duwem de Memêd Babayev gotarek bi navê "Dîroka Peydabûna Otonomiya Kurdan" xwend.

Melayên misilmanên Kurd û Şêxên Kurdên yezîdî jî di konferansê de beşdar bûn û wan jî gotarên xwe xwendin.

Di êvara roja 26.7.1990'î de konfe-

ransê biryar da ku gaziyekê ji bo Gorbaçov bişine. Dîsa her di wê êvarê de ji bo rojnamegeran, konferansê hate civandin û nûnerên van ajans û rojnaman beşdarî vê konferansê bûn: Rojnama Al-Nîda -Lubnan, Le Mond û Frans Press -Fransa, Muxabîrê kanalê 4 ya Televîzyona Îngilistanê, Ajansa IRNA -Iran, Kovara Noveyevrêmya -Moskova, Rojanama Armanc, Serdema nû û Kovara Berbangê -Swêd. Di destpêka vê konferansa pressê de, Nadîr Nadîrov bi kurtî behsa sedemên çêbûna konferansê kir û xalên be-yannama da-

wîn ya konferansê xwend. Dûre rojnamegerên beşdar dest bi pirsên xwe kirin. Hinek ji pirsan li ser konferansê bûn û hinek jî li ser helwêsta Sovyetê li hember pîrsa kurdî û bêdengmayîna wê li ser bikaranîna çekên kîmyayî li dijî Kurdên Kurdîstana Iraqê, bûn.

Di êvara roja 27.7.1990'î de grûpa hunerî ji Kurdên Ermenîstanê, Gurcîstan û Kirxîzya û alîkariya hinek Kurdên Iraq û Îranê, şahiyek bi sitran û muzîka kurdî, şanoyek ji bo mêhvanên konferansê pêşkêş kirin. »

GAZÎYEK

Ji Bo Serokê Komara Yekîtiya Sovyetê, Heval Mixayîl Gorbaçov,

Ji Bo Meclisa Bilind A Yekîtiya Sovyet,

Ji Bo Serokatîya Bilind A Meclisa Yekîtiya Sovyet

**Hêja Mixayîl Gorbaçov,
Hevalên Hêjal**

Em, beşdarên konferansa zanistî ya bi navê "Kurdên Sovyetê: Dîrok û Serdem", ku cara yekem e di rojên Tîrmeh'a bûrî de li Moskovayê ji aliyê beşa tîkîliyên navnetewî ya Enstîtuya Marksîzm-Lenînîzm û bi hevkarîya Enstîtuyên ser bi Komîta Navendîya Partiyên Komunîst yê Azerbeycan, Gurcîstan, Ermanîstan û Enstîtuta Rohilatnas ya Akademiya Zanistîya Yekîtiya Sovyetê, hat lidarxistin.

Me guhdarî li rapor, gotar û kurtebehsên bi zanabûn li gor rewşa Kurdên deverên Kazaxîstan, Azerbeycan, Ermanîstan, Gurcîstan, Kirxîzya û deverên Krasnadar kirin û em li wan vekolîn. Dîsa gotarên mêvanên ji Ewropa û Rojhilata Naverast. Li gor bawerîya hemûyan, pêwîstiya konferansa seke weha bi tenê di dema prestroyka de peyda bû, ji ber ku Partî dest bi guhertinan kir ji bo tevayîya gelan li gor normên Lenînî, wekhev û bê cudahî bijîn. Ev prensîb heta ji bo ew neteweyên ku bê dewleta netewî ne, yan ji ketine ber darê zordariyê û derbederkirinê jî, tê parastin.

Em bi helkeftinê, daxwazê ji we dikin ku hûn pîrsa Kurdan çareser bikin, ku ew di dema Stalîn û mengbûnê de ji ser erdê xwe dûrketibûn. Beşdarên konferansê di baweriyekê de ne ku li ser bîngehên qanûna Yekîtiya Sovyetê, li gor azadî û pêşdebirîna neteweyên hevvelat li Sovyetê ku ji dervey sinora dewleta netewîya xwe de dimînin, yan jî yê ku dewleta wan li Sovyetê tune, bigihîjin

mafên xwe.

Em pêwîst dibînin ku:

- * Zivîrandîna devera otonomîya Kurdistanê (Kurdîstana Sor), ku di berê de hebû û zîyanên ku pê ketine bidin ber çavan. Damezrandîna otonomîya netewî, ku dibê alîkar be ji bo komkirin û hevgirtina Kurdên ku di dema Stalîn de tûşî jihevbelavbûn û jihevdukbûnê bûbûn....
- * Em di wê baweriyê de ne ku hukmeta me û gelên Azarbeycan, Ermenîstan, Gurcîstan, Kazaxîstan, Kirxîzya û Tîkrmenîstanê, daxwaza gelê zulmlêkirî tê digihîjin, wê dihilseingînin û alîkarîya çareserkirina pîrsgirêka wê dikin.
- * Em dixwazin ku nûnerên gelê Kurd, çî li organên desthilata navendî, yan jî navçeyî cihên xwe bigrin û dîsa ji bikevin nav komîsyona encumena bilind ya Sovyetê.
- * Li hinek welatên Asya Navîn, rewşeke xirab ji bo Kurdan peyda bûye û ew ditirsin ku bipeqe. Lewma em daxwazê ji we dikin ku sinorek ji bo zoriya ku li ser Kurdan heye bête danîn. Ji haletê tîrsa li ser jiyana wan, cihê veguestîna wan diyar dikin.

Li ser navê konferansê:

Nadîrov N.K., Kitayev Î. N., Babayiv M. S., Şakiro M., Bagramov M., Evdal A., Trêpezniçkov G.

Kurtfeyek ji Gotara Nûnerê Komela RONAHÎ li Gurcistana Sovyetê:

Di destpêkê de Yorî destnîşana wê dike ku di sala 1988'an de hejmara Kurdan li Gurcistanê 33 hezar bûn, ji wan 30 hezar li bajarê Tîblîsê diman.

Ew dibêje: "Ew Kurdên ku li Gurcistanê dimînin, neviyên wan Kurda ne ku di şerê yekem yê Cîhanî de ji Kurdistana Bakûr hatine û ketine pişt Qafqasê..."

Em perçek in ji civata xelkê Gurcistanê, em nikarin destberdayî li hember bûyeran rawestin, em piştgiriya xelkê Gurcî ji bona dewleteke serbixwe li Gurcistanê dikin...

Dûre Yorî behsa komela Ronahî dike û dibêje ku ew peçekî ji komeleke seranserî Gurcistanê ya bi navê ROS-TAVÎLÎ ye. Komela Ronahî di meha sibata 1990'î de hate damezrandin û di kongera damezrandina wê de 70 nûner beşdar bûn û di meha gulanê de bi resmî ji aliyê dewletê ve hat qebûl kirin.

Komela Ronahî komeleke kulturî-netewî û rêxistineke siyasî-civakî ye ku berjewendiya Kurdên Gurcistanê diparêze. Ew dengê hevî û daxwazên wan e.

"Ji sexmeratî çalakîyên komela me, niha xelkê Gurcistanê pitir giringîyê didine rewşa Kurdan û bizava rizgarixwaza kurdî, bi taybetî li Kurdistana bakûr. Rêxirawên siyasî yên Gurcistanê daxwaziya xeber û babetên objektîv li gor Kurdistanê ji me dikin, ji ber ku bi taybetî xelkê Kurd cîranê Gurcistanê ye. Em jî hewil didin ku daxwaziyên wan bi cî bînin, lê mixabin ku me jî xeber ji Kurdistanê kêm hene. Gerek em bêjin ku xeberên temam li gor rewşa Kurdên welatên Rojhilata Naverast, giringîyê siyasî heye ji bo rêxistina bizaveke piştgirtinê, ji bo Kurdên li Cîhanê. Ez ji we re vê nimûnê bêjim: Li Sovyetê radyo, Tv ûrojname, roj bi roj nûçeyên li gor xebata gelê Erebbê Filistinî digihîjine xelkê. Ji ber wê jî li welatê me piştgirtineke baş ji bo xebata niştimanperweriya Filistinê heye. Civata Sovyetê çend nûçe li ser xebata gelê Kurd bihistine? Gerek em di vî warî de bifikirin."

Yorî kar û barên li ser milên komela Ronahî hene, diyar dike û dibêje:

"Di roja îroyîn de pir pirs li pêşiya me ne. Hinek ji wan teknîkî ne û bi girêdayî rêxistinê ne. Niha em hewil didin şanayên destpêkirinê çêbikin. Dîsa di bajarên din de çaxên komela xwe çêbikin. Heta niha hejmara kesên ku daxwaza endambûnê kirine, gihaye 2500 kesan. Komela me mijûlî perekomkirinê ye û hemû tiştên teknîkî ji bo derxistina rojnameya "Ronayî" amade kirine. Rojname dê bi pîtên latînî derkeve. Dîsa em dê bultenek bi rûsî û bi gurcî jî derxin. Niha em rê xweş dikin ji bo vekirina melbendekî kulturî li bajarê Tîblîsê. Cihê dilxweşiyê ye ku hinek rêxirawên gurcî pêşniyar dikin ku li Gurcistanê komela piştgirtina gelê Kurd bê damezrandin..."

Em baş dizanin ku karê têkiliya navbera gelên Kurd û Gurcî dikeve ser milên me. Em baş jî dizanin ku devera pişt Qafqasê raste rast têkiliyê bi Kurdistanê ve heye, ev jî karek giring e ji bo xebata rizgarixwaza gelê Kurd. Lewma em dixebitin ji bo damezrandina bingeha rêxirawek siyasî û kulturî li bajarê Tîblîsê, ji bo bizava niştimanî ya kurdî...

Tiştê ku me nerehet dike, rewşa Kurdên sergerdan e. Gerek pere ji aliyê dewletê ve ji bo wan bêne dayîn. Dibe ku ew pere ji wan komaran bê wergirtin, yên ku Kurd jê derbider kirine. Li gor baweriya me, gerek konferansa me gaziyekê ji bo encumana bilind û hukumeta Sovyetê derxe û jê çareser kirina rewşa Kurdên sergerdan bixwaze...

Em ne li dijî wê ne ku pirs otonomîyê bigrin rojevê. Her çend em dizanin ev karekî dijwar e û dibe ku yekser bi cî neyê...

Rewşa siyasî, civakî û psîkolojî li Azerbeycanê, li hember pirsgerêka Kerbaxê, dibe ku îro ne di berjewendiya çareser kirina pirs otonomîya kurdî de be. Dibe ku me jî mijûl bike ku pirs a giştî ya tevgera rizgarixwaza gelê Kurd li welatên Rojhilata Navîn bi piştguh bikeve...

Komela me, nerehet dibe ku hinek kes dixwazin Kurdên misilman û yezîdî ji hev cihê bikin. Ji bo me diyar e ku ev

ne di xizmeta Kurdên Sovyetê de ye. Her kesê ku bixwaze dilnexweşiya bixe navbera me ku ev misilman e û yê din jî yezîdî, em dê bi xurtî li dij rawestin û wê bêdeng bikin."

Yorî daxwaza damezrandina rêxiraweke giştî ji bo Kurdên Sovyetê dike, ji bo ku bikaribin berjewendiya Kurdên Sovyetê biparêzin, sergêriyê amadekirina mamostan, kadroyên niştimanî bikin, bi zimanê kurdî kitêbên xwendinê çap bikin, bo hemû Kurdên Sovyetê programên radyo û TV biweşînin.

Komela Ronayî pêşniyar dike ku encumeneke niştimanî ya Kurdên Sovyetê bi rêya dengdana nehîni û giştîya Kurdên Sovyetê bête damezrandin. Encumana niştimanî ya Kurdî, xwestinên Kurdên Sovyetê diyar bike, ji alî qanûnî ve jî, nûnertiya Kurdan di organên bilind yên Sovyetî de bike. Endamên encumana niştimanî mafê wê hebe ku statuya wî ji aliyê parlamen-toya gelê Sovyetê bête naskirin.

Ew roj hatiye ku organek bi navê Kurdên Sovyetê bipeyive, ku ew jî bi rêyên demokratîk bête hilibjartin û ji aliyê qanûniya nêvnetewî ve îtîraf pê bête kirin.

Yorî Nebîyev di dawiya gotara xwe de behsa têkiliya di navbera Kurdên Sovyetê û yên dervey Kurdistanê kir û got:

"Bi deh salan bûn, Kurdên Sovyetê ji karê xebata netewî hatibûn dûrxistin. Pirs a kurdan di nava civata Sovyetê de, pirseke taybetî bû. Em pitir haydarî rewşa Nîkaragua û Efrîqa başûr bûn, ji wê pirs a ku li ser sinûra Sovyetê bi xwe diqewime. Hukumeta Sovyetê û dezgehên wê yên ragihandinê, xwe li ser wan gunehkariyên li hember gelê Kurd tîn kirin, bêdeng dike. Li gor baweriya me, ev bêdengiya jî beşdarbûna wan gunehkariyan e. Em weha dibînin ku yek ji giringtirîn karê li ser milên me li pêş Kurdên Sovyetê ew e ku em hewil bidin û kar li ser belavkirina nûçeyên rast û objektîv li ser faktora jenosîda li dijî gelê Kurd bikin, di vî warî de hevîya me bi Kurdên derve ye.

Ez hinek caran digihîjime wê bawe-

Olana Konferansa Moskovayê li Sovyetê

Rojnama Pravda bi tenê nivîsî ku Li Moskovayê Konferanseke zaninstî li ser Kurdan hatiye çêkirin.

Lê di çend rojnameyên din de, nivîs û gotarên baş li ser Konferansê hatine nivîsandin. Ji wan jî Organa wezaretê bergirî Rojnama Stêra Sor di roja 24.7.1990'î de gotarek bi navê Kurdên Sovyetê nivîsandibû:

"Komela Yekbûna Kurdên Sovyetê, di roja 24.7.1990'î de kombûnek li meydana Jonîkaxê çêkir ji bo başkirina rewşa Kurdan..."

"Piştî jinavbirina Otonamiya Kurdistanê li Azerbeycanê di sala 1929'an de, bi deh hezaran kurdên misilman bo Kazaxistanê û Asya navîn hatin belavkirin..."

Rojnama heftane Nuçeyên Moskova, di hejmara 31, roja 5.8.1990'î de gotarek nivîsî û got:

"...Konferansa Zanistî û Praktîkî ya Kurdên Sovyetê, li Moskovayê hat lidarxistin û şeweyekî siyasî girt. Bêtir ji 600 nûnerên Kurdên Sovyetê û kurdên ji Îran, Iraq, Swîsre û Swêdê beşdar bûn. Konferansê gaziyeke ji serokê Sovyetî Mixayîl Gorbaçov re da..."

Kovara Noveyavrêmya, di roja 10.8.1990'de weha dinivîsand:

"...Ew roj hatiye ku em bêjin, di welatê me de jî Kurd hene. Ev ji me hinekan ve ne tiştêkî nû ye. Lê piraniya me navê wî gelî nabêjin. Di nav Sovyetê de bi sedan gel û netew hene, vaye Kurd jî



hene ku hejmara wan bêtir ji 150 hezaran e, û kesên kurdnas dibêjin ku hejmara wan 3-4 car li vê hejmarê ye..."

Konferansa Moskovayê, ne bi tenê bala Kurdan û kurdnasan kişand, wê bala gelekên din jî kişand.

Piraniya tiştên di konferansê de hatin munaqesekirin, li gor pirsgerêkên cûrbecûr yê Kurdên Sovyetê bûn, ji derbederkirinê, bindestiya di serdemê Stalîn de, rê nedan ku bi zimanê kurdî bixwînin, jinavbirina kultura kurdî û yê din, helbet ji wan daxwaza otonomiyê.

Kurdistan, cihê dîrokî yê Kurdan e. Deverên rojava Asya û serekaniyên Dîcle ye. Ew ax niha li navbera Tîrkiye, Iraq, Îran û Sûriye hatiye parvekirin. Kurdên Rusyayê di dawîya sedsala

19'an û destpêka sedsala 20'an de hatine û li piştê Qafqasê bi cî bûne..."

Di gotarê de behsa dîroka otonomiya Kurdan û derbederkirina wan ya bi zorî, dike. Dîsa dibêje:

"...Xelkê Sovyetê kêrî haya wan ji xebata rizgarîxwaza gelê Kurd li derve heye. Ew bizava ku qasî bizava Filistinê eşkere ye. Lê Kurdan di çî parçekê de mafên xwe yê netewî wernegirtine û wek milletekî serbixwe û xwedî ziman û tradîsyona xwe, lê nayê nihêrtin. Rast e ku Kurdên Iraqê otonomî heye, lê kurd bi wê otonomiyê ne razî ne û ji bo mafên xwe yê netewî şerê çekdarî dikin.

Di welatê me de behsa siyaseta wan çar dewletên Asyayê, Tîrkiye, Îran, Iraq û Sûriye nehatiye kirin, ji ber ku me têkilî û dostanî bi wan re heye û yan jî wek diyar ku em nikaribûn behsa pîrsa kurdî bikin, yan jî ne di cihê xwe de ye û ne pêwîst e ku behs bikin.

Paşî nivîskarê gotarê "Me dengê bizava Kurdan bi rêya kuştina Olof Palme bihîst" dibêje û didomîne:

"Gelek rêxirawên civakî û siyasî li Ewrûpa piştgirtina xebata Kurdan dikin..."

Serokên Kurdan li derve çaverê wê ne ku êdî rizgarîxwaza niştîmaniya Kurdistanê dîr bixe. Herçend welatê me di rewşeke aborî de xirab e, lê ew venaşêrin ku hêviya wan ji Sovyetê hene..."

riyê ku, sistema me li derve, guhertinên bingehî bi ser de hatine, bi tenê li hem-ber xebata rizgarîxwaza gelê Kurd bê guhertin maye. Dibe ku di vî warî de em Kurdên Sovyetê jî gunehkar bin.

Li ber çavên hemû cihanê, bi eşkere, gelê me li Iraqê û li welatên din, ser jê dibirin, jehrê didinê, çekên kîyewî li dijî bi kar tînin, bi darê zorê ji cihên wan derdixin û ji hev belav dikin. Kesên niştîmanperwer zîndan dikin bi tenê ji ber ku dixwazin Kurd bin û bi azadî

mîna hemû mirovên li ser vî dunyayê bijîn. Em Kurdên Sovyetê di vî warî de çî dikin? Çima kes dengê nerazîbûna me nabihîse? Çima em meş û protestoyên nerazîbûnê li ber derên balyozxanên wan welatan nakin? Çima em daxwazyê ji hukmeta Sovyetê nakin ku ew peymanên xwe yê dostanî bi Iraqê re ji nav bibe? Çima em dostaniyê bi faşîstan re dikin? Çima em daxwaz nakin ku çekên taze ji Iraqê re êdî neyên şandin ku li dijî Kurdan bikar

tînin? Çima dengê Kurdên Sovyetê ji bo piştgirtina birayên li derve nayên? De bila destê xwe li dilê xwe daynin û bê tîrs û rast em bibêjin ka em çawa bijîn û li kuderê ji me re baştir e. Li vî welatî an jî yekî din, li vî komarê an jî yeke din. Em tim bîrîya Kurdistanê dikin. Ji bo ku em xwe û ziman û tradîsyona xwe biparêzin, Kurdistan ji me re gerek e.

De bila bijîn û ji Kurdistanê re kar bikin."

Kurdên Sovyetê: Dîrok û serdem

Ev navnîşana Konferansa Moskoyayê bû ku di rojên 25 û 26'ên tebaxê li seranserî Sovyetê hatibû lidarxistin.

Zanayên Sovyetê, kurdnas, civaknas, nivîskar û ronakbîrên kurd û biyanî, beşdarî konferansê bûbûn.

Di konferansê de bi awayekî giştî behsa rewşa kurdên Sovyetê hat kirin. Bi nêrîneke demokratîk û derbirînên azad, hemû aliyên dîroka rewşa kurdên Sovyetê xistin ber çavan. Di rapor û gotarên kesên beşdar de, aliyên pozîtîv ji bo pêşdeçûna kurdan di warên curbicurên jiyana civakî û kulturî de hatin destnîşankirin.

Dîsa rewşa kurdan di serdema Stalîn de, ku mafên netewî yên kurdan piştguh xistibûn û jinavbirina devera Kurdistana Sor (1929) li Azerbeycana Sovyetî, veguhastina bi zorî di salên 1930-1940'an de, rakirina xwendîngihan, qedexekirina kitêbên kurdî, veşartina rastiya hejmara kurdan, di konferansê de hatin behskirin. Tiştek diyare ku Perestroyka jî derdên kurdên Sovyetê derman nake. Bi tenê hebûna rojnamekê yan programa radyokê têra hemû kesan nake. Alîkarî ji bona bîdestxistina mafên netewî û hissî yên kurdan tune. Bi salan e ku nûnerê kurdan di organên bilind yên Komarên Sovyetî tune. Heta di wan hebijartên dawîn de jî nûnerê wan negihîste parlamentoyê, her çend niha dest bi rastkirina çewtiyên berê hatiye kirin di warê netewî de, lê dîsa jî rê li mafên netewî yên kurdan nayê girtin û birastî ew ber bi xirabtirinê diçe. Konferansê bêtir girîngî dabû ser tîkiliyên kulturî û yên din, di navbera kurdên Sovyetê û yên derve. Beşdarên konferansê bi wê qayil bûn ku niha ew roj hatiye ku weşan û nivîsandinên bi kurdî mîna yên ku li dervayê Sovyetê, bi pîtên latînî bêne nivîsandin, ji bo ku tev nivîskarên kurd karibin berhemên hevdu bixwînin.

Konferansê eşkere kir ku Perestroyka, kurd û xebata kurdan bi xwe ve

negirtîye û hêlengandina pîrsa kurdî di tîkiliyên navnetewî yên rojhilat û rojava de, cihê xwe negirtîye!

Kesên konferansê bala xwe kêşa ser bêdengîya Sovyetê li hember wê qetliama ku li dijî gelê kurd tête kirin, nexasim bikaranîna çekên kîmyayî di sala 1988'an de li Kurdistana Iraqê.

Kesên kongrê dibêjin: em alîkarîkirin û piştgirtina rejîma ku bi awayê zorîyê dixwaze xebata gelê Kurd ji nav bibe, bi karekî normal nizanin. Em di wê bawerîyê de ne ku dema wê hatiye Sovyet bi dirin û riha nû ve alîkar be ji bona ku pîrsa neteweya zorî lê tête kirin, bextê ber vekolinên rêkxirawên navnetewî de, nexasim Rêkxirawa Netezewyên Yekbûyî.

Rapor û gotarên di konferansê de hatin pêşkêşkirin, di warê netewî û qanûnî de rewşa kurdên li Sovyetê xuya kirin.

Konferans hilweşandina îdara otonomîya sala 1929'an, wek bînpêkirina mafên netewî dibîne û ji ber vê yekê jî daxwaza veğerandina otonomîyê û pêkanîna mekanîzmeyeke bihêz, sedemên xwe yên rast hene. Divê em hewl bidin, mekanîzmayek welê bête danîn ku sîyanete mafên netewî yên kurdan bigre, ji bo destbikarkirinê divê daxwazên jiyana kulturî û mafên netewî yên kurd bîn destnîşankirin. Ev kar jî divê bi destê Rêkxistina Seranserî Sovyetê, bê bicihanîn. Ji bo vê yekê jî divê çarçewa pîrsên konkret bê xuyakirin, desteyek serokatîyê ji bo danana merkezen kulturî yên kurdê li Moskova û li cihên din yên ku kurd lê dijîn, bê destnîşankirin, ku ev karekî girîng e.

Konferans hêvîdar e ku rêxistineke bilind a ku tê gotin, bi tememî xwe bide çareserkirina problemên Kurdên ku bi darê zorê ji cihên xwe hatine dûrxistin. Konferansê ew erk diyar kir ku ji bo danîna devera otonomîyê rê bête xweşkirin, izin ji bo xwecihbûna kurdan, yan li cihêkî xwerist xweş yê Sovyetê komkirina wan û li gor wê jî devereke oto-

nomîyê avakirin, bête dayin.

Konferans di wê bawerîyê de ye ku ji bo misogerkirina garantîya kontorola desthilatdariya organên deverî, fîrset bê dayin.

- Konferans li Moskoyayê hebûna programa radyoya kurdî giring dibîne.

- Avakirina weşanxanên bi kurdîya bi herfên latînî, ji bo çapkirina pirtûkên kurdî pêwîst e.

- Konferans ji bo guhertinên demokratîk piştgirîya xwe xuya dike.

Dîroka gelê kurd ya ku pir ji bûyerên dramatik, me digihîne wê bawerîyê ku azadî û xweşîya jiyana gelan, li ser bîngê berberî, yan berjewendîyên gelekî din bi cih nayê. Lê ji bo vê hebûna harmonî, rêz li hev girtin û bawerîpêanîne dibe, ku ji tev awayên nasyonalist û ezeziya netewî dûr be.

Di rewşa alozya welat de, kurd dîlsoziya xwe ya dîrokî û tradîsyonî û tîkiliyên xwe yên ruhî yên bi wan gelên ku pê re dijî, diparêze û di her warî de beşdariya pêşxistina jiyana gelên biçûk û mezin dibe.

Serokê Komîteya Rêkxer: Akademîkê Akademîya Zanistî li Kazaxistanê, Nadirof Nadîr Kerîmovîç.

Hevkarê Serokê Komîteya Rêkxer û alîkarê serokê Enstîtuya Marksîzm-Leninîzm, Kîtayiv. I.N.

Berendamê Akademîya Ermenîstanê, Şakiro Xido Mihoyî.

Sekreterê berpîrs û serokê Komela "Yekbûn", Memêd Suleymanovîç Babayiv.

Endamê Komîteya Rêkxer, serokê beşa Peywendîyên Netewî ya Enstîtuya Mrksîzm-Leninîzm, I Edward Bagramov.

Sekretera berpîrs ya Komîteya Rêkxer, rojnamevan, Azaya Evdal.

Berpîrsê Grûpa Lêkolînên Pîrsên gelên ku zixt dîtine; ji beşa Tîkiliyên Nete-wî ya Enstîtuya Marksîzm-Leninîzm, Trepêznîkov G. I.

LI SER "PIRSA PIRSAN" ÇEND GOTIN

Nacî Rodî

Di hejmara dawî (65) ya BERBANGÊ de, berpirsîyarê kovarê heval N. Kirîv li ser îdeoloji û sîyaset û her weha li ser mafên mirovayetiye sekinîye û bîr û bawerîya xwe bi giştî anîye ziman. Li ser van dîtinan gotinekî min nîne. Lewra ew pirsana bi salan dê bê munaqeşekirinê. Di vê nivîsa heval Kirîv de ya ku herî bala min kişand, perspektîfa wî ya li ser pirsî Kurd bû û ez dixwazim taybetî li ser wî bisekinim.

Heval Kirîv di nivîsa xwe (Pirsî Pirsan) de weha dibêje: "Ev çend salên dawîn li Ewrûpayê li ser pirsî Kurd, konferans, civîn û platform li dar dikevin. Rêxistinên me, ronakbîr û nûnerên welatê me yên ser bi rêxistinên sîyasî û yên serbixwe, beşdarê van konferansan dibin. Piraniya wan di van platformên navnetewî de, pirsî Kurd bi awayekî çewt îfade dikin û dibêjin 'pirsî Kurd ne pirsî mafên mirovî ye, lê pirsî sîyasî ye. Herweha pirsî Kurd bi metodên sîyasî çareser dibe' Mirov dixwaze li vir yekser ji wan bipirse: Yanê çi? Kî ji vê çi fam dike? Kes nizane ku em di civînên weha de çi dixwazin."

Ji bo çi em Kurd di platformên navnetewî de dibêjin, pirsî Kurd ne tenê mafên mijrovayetiye ye, her weha pirsî

sîyasî ye û tekabulê mafê çarenivîsa gelê Kurd dike? Eger em xwe nexapînin baş dizanin ku, berjevanda welatên Ewrûpa û ya DYA ne li gel Kurdistanekî serbixwe ye? Wana ji mafên mirovayetiye tenê ziman û çand fam dikin û me jî, wek aqelîyetekî dibînin. Divê ferqekî me û wan hebe, ku mafê mirovayetiye jî wî çerçewê derxînin. Durûtiya wan welatan, wana ji çerçewa Beyanname Mafê Mirovayetiye ya Helînkî dur xistiye û em jî wek netewekî divê viya bînin bîra wan û doza mafên xwe yên sîyasî bikin.

Ji hêla din, em Kurd ji her mafên xwe yên mirovî, aborî, sîyasî, demokratî bêpar in û herî girîng jî miletekî kolonî ne. Li vir divê meriv ferqa miletekî kolonî û devletên serbixwe bibîne û li gor wî mewqîfê xwe dîyar bike. Ger em jî, xwedî dewletekî bibûna, wê çaxê me doza mafên "sîyasî" nedikir. Giringîya platformên navnetewî bi taybetî ji bo me Kurdan manekî giranbuha heye û fersend dide ku, bi pîrr alî pirsên xwe bînin ziman û bidin famkirinê. Nûnerên me van fersendan birevînin, nasandina mafên gelê Kurd di warê dîplomasîye de, dê seqet bimîne.

Bi bawerîya min kêmasî ne ew tiştin ku heval Kirîv li ser sekinîye. Kêmasîya me ya herî girîng tunebûna dezgehên netewî ye. Kêmasîya me tunebûna yekîtîyên bi hêz e. Ji bo çi em wek rêxistin,

wek serbixwe di van platformên navnetewî de yeknabin? Ji bo çi em nikarin xwedî polîtîkayekî netewî bibin? Pirsî pirsî vana ye û me hêj di nav xwe de problemên xwe çareser nekiriye.

Heval Kirîv dawîya nivîsê xwe tîne û dibêje: "Û pirsî pirsan: Ku em bi metodên sîyasî, şerê çekdarî jî tê de, welatê xwe rizgar bikin û tew li ser erdê wî Kurdistanekî azad, yekbûyî, demokratîk û sosyalîst jî ava bikin, ma ew dê ne ji bo jiyanekî bi 'mafên mirovayetiye' be?" Belê ji bo mafên mirovayetiye ye. Lê bi avakirina dewletekî mafên mirovayetiye çareser nabe. Her çiqas rizgariya miletekî ji bo jiyanekî însanî jî bibe, jîyan xuya kiriye ku ne eynî tişt in. Buyerên ku di welatên sosyalîst de rû dane, nimûnên ber bi çav in. Çareserkirina mafên mirovayetiye pirsîke dîr û dirêj e û bivê-nevê bi çareserkirina hezar problemên civakî pêk tê. Ev pirsî di welatê Ewrûpayî (ku xwe parêzgerê mafên mirovî dihesibînin) de jî çareser nebûye û heta di nav welatên xwe de çareser nekin, nikarin bi sîyaseteke dirust nêzikê me bibin û yê me çareser bikin. Helbet ev tiştana nayên wî manê ku, em ji bo têkoşîna mafên mirovayetiye paştî gav bavêjin, an jî piçûk bibînin. Divê têkoşîna gelê me, ji yekbûna têkoşîna pirsî bi pîrr alî pêk bê û li rê bikeve. ●

HEFTA PIŞGIRIYÊ LI ESKILSTUNAYÊ

Komela Kurd li Eskilstunayê, di rojên 13 û 18'ên tebaxê de, li gel 25 komelên biyanî, li dijî nijadperestiyê hefteya pitgirî ji bo biyanî û swêdiyan li dar xist.

Li gor programê, roja pêşîn, civînek li navenda bajêr pêk hat. Roja duyem çeveke şahiyê li dar ket û hunermendên biyanî û nêzî 700 mêvan amade bûn. Roja sêyem li bajêr belavok hatin belavkirin û gruba zarokan ya komelê dîlanên kurdî pêşkêş kirin. Roja çarem civînek li meydana bajêr pêk hat û di civînê de hemû partiyên Swêdî ji dijî nijadperestiyê axaftin. Roja dawî liseyrangehê, musabaqa futbolê di navbera grûbên biyaniyan de pêk hat. Li wir Keçên Kurd dîsa dîlanên kurdî pêşkêş kirin.



"Her tişt bi min dest pê dike û ez yekemîn im!"

Bi salan in ku pedagog û perwerdekarên cîhanê li ser du têzan gotûbêj dikin. Ew li gor baweriyên xwe bûne du komên cuda û dijber. Ji komekê ra dibêjin hawîrdorvan (çevre-miljê) û ya din re jî perwerdevan.

Têzvan û piştgirên koma yekemîn dibêjin ku mirov bi perwerde û hînkirinê tê guhartin. Dibistan ji bo guhartina mirovan gelek girîng e. Ew kesên ku di dibistanan de perwerde dibin ji yê din cudatir in. Ew şexsiyet û karakterekî pak digrin. Hawîrdor ne girîng e û rolekî mezin nalîze. Li gor bîr û baweriyê vê koma han perwerda dibistanê jî li gor bilindbûna xwendinê ye. Ew kesên ku dibistanekê bilind an unîversîteyê bixwîne, ji yê din ên ku kêma xwendine baştir dibin. Wek xwendina wan a bilind şexsiyet û karakterê wan jî bilind dibe.

Têzvan û piştgirê koma duyem dibêjin ku "rola hawîrdorê li ser perwerde û hîndekariya gelek mezin û girîng e. Herçend perwerde nûjen be jî bêtir li ser mirovan tesîrek nake an tesîra wê kêma e. Giraniya hawîrdorê heye. Ew hawîrdora ku mirov tê de mezin dibe û dijî, ji her alî ve tesîr li ser mirov dike. Hawîrdor skeleta şexsiyet û karakterê dide mirov. Perwerde zû bi zû nikare tesîr lê bike. Û li gor ev koma ha perwerde û hîndekariya di pileya duyem de dimîne.

Di hawîrdorê de jî kevira hîmî ya yekemîn malbat e. Zarok di malbata xwe de dest bi perwerde dikin. Malbat dibistana yekemîn e. Tax, gund û bajar dibistana mirov a duyemîn tî. Perwerde û hîndekariya dibistanê di pileya sêyemîn de ye. Ji ber vê yekê dawîrdor ji perwerda dibistanan girîngtir e. Ew kesê ku di biçûkayiya xwe de li hawîrdora xwe formê xwe bigire, êdî wilo ne hêsa ye ku ew bikari be xwe bi perwerda nûjen a dibistanê biguhêre. Ji ber ku skeleta xwe ya şexsî li hawîrdora xwe digire. Lê dîsa îstîsna çê dibin.

Min berê hindik heq didan koma hawîrdorvanan. Piştî hewqas sal û bi taybetî li Ewropa mirov dema hinek

kirinên ronakbîr û serokên Kurdan dibîne, hîn bêtir heq dide koma hawîrdorvanan. Dema mirov hûr û kûr li ser hinek bûyeran dihizire, dibêje qey ev koma pedagogan a hawîrdorvanê hîpotêza xwe ya hawîrdorî ji bo me Kurdan çêkirine. An jî li ser me Kurdan ceribandine û ji bo me derbas dibe.

Serokên me xwenda ne. Hinek ji wan xwendina bilind kuta kirine û hinek jî li ser kutakirinê bûne. Dema îro mirov li rewş û şêla wan dinêre tesîra hawîrdora ku tê de mezin bûne hîç ji ser xwe navêtine. Wekî ku xwendin û zanabûna wan tune be, bi kar û şêla xwe ya pratîk, mantiqê hawîrdora ku tê de mezin bûne baş didin dîyar kirin. Ew hebin her tişt hene, ew tune bin hîç tişt tune. Ji bo ku ew hene rêxistin jî hene. Ango rêxistin ew her yek bi xwe ye. Dema behsa rêxistinê jî bikin, dîsa behsa xwe dikin. Ka em lê binhêrin, ev çend mînakên jêrîn çawan heq didin pedagogên hawîrdorvan:

1- Li gor yekî, berî wî hîç hilberîn, mîratî û berhemên şoreşgerî nîn e. Heta hebûn û dîroka neteweyê Kurd bi wî dest pê dike.

2- Yekî din rêxistina wî di navbera 20 salan de, ji 20 î bêtir endam nedîtîye, hê jî înat dike û dibêje: "îdeolojî û politîka min rast e. Ev bi min dest pê kirîye û bi min dê dom bike."

3- Yekî din; " cara yekem min bîr û baweriyên sosyalîst anî nav Kurdan. Ji derê me sosyalîstên Kurd tunin. Yê din hemû burjuvaziyê biçûk û miliyeçî ne."

4- Hinek xortên xwendevan ên Kurd di 15-20 saliya xwe de ji welêt derdikevin, tîna Ewropa li Ewropa jî unîversîte kuta dikin û dibin berrisîyarê sazgehên Kurdî. Û dibêjin; " zanabûna zanyarî bi min dest pê kirîye. Ji derê min her kes nezan e. Ez çî bêjim û çî bikim kes nikare rexne li min bigire. Ji ber ku cara yekemîn min vê sazgeha ha saz kirîye."

5- Kongre ye. Di kongrê de 60 î bêtir endam hene. Li ser mijaran gotûbêj çêdibe. Dema dengdanê tê, yekî

navdar bi serê xwe dimîne. Ew radibe dibêje " lê ra demokrasî nîye kaka" û diçe.

6- Rojnamegeriya Kurdî 100 saliya xwe tamam dike. Lê yek radibe li Ewropayê di hinek rojnaman de çend nivîsar dinivîse û dibêje; " rojnamevanê Kurd ê yekemîn ez im."

7- Piştî 1980 î nivîskarekî Kurd romaneke dinivîse; du sal li ser gotûbêj û semîneran çêdike: "Gelo heta niha romana kurdî hebû, an na."

8- Du kes ji xwe re kamerayê videoyê dikirin an jî çend rojan kirê dikin, çend wêne dikişînin; ew, "filima Kurdî ya yekemîn e."

9- Û qasî ku tê zanîn ji 500 salî vir de ye ku alfaba kurdî heye û ji dema Ahmedê Xanî şûn ve klasîkên kurdî pê hatine nivîsîn. Dîsa Celadet Bedir-xan di salên 1918-1932 î de bingehê alfabe û gramera latînî davêje û heta îro bi hezaran berhem bi vê alfaba kurdî ya latînî hatiye nivîsîn. Niha nivîskarekî Kurd radibe û di radyoya tirkî de dibêje: "Min cara yekem di sala 1968-an de alfaba kurdî li Tirkîyê nivîsiye û çap kirîye."

Hezar rehme li Kemal Badîli be û ez hêvîdar im ku Musa Anter jî bi vê danezanê wî nehese!..

Piştî van çend mînakên, mirov baş dibîne ku ji serokên politîk heta yê demokradîk û kesên ronakbîr ên Kurd, tev di yek dîtin û mantiqekê de ne: "Her tişt bi min dest pê dike û ez yekemîn im." Kes, duyemîniyê qebûl nake. Bi vê encamê, mirov girîngiya hawîrdorê bi awakî vekirî û zelal dibîne. Dîyar e, ku xwendin, ger, dîtin û li Ewropayê mayîn nikare bi carekê de mirov ji wê perwerda hawîrdora ku di nav de mezin bûye pak û rizgar bike. Ma ev, ne wek cil û bergên kevin û qirêj in ku mirov wan ji xwe bike û bavêje û di şûna wan de yê nû û pak li xwe bike. Weha xuya ye ku tîza hawîrdorvanan ji bo me Kurdan gelek rast e û derbas dibe! Û herweha pedagogên hawîrdorvan bi saya serê pêşewa û ronakbîrên Kurdan bi serfirazî bi ser ketin. Zor û hoza koma dijberê xwe ya perwerdevanan birin. Ji xwe roj roja hawîrdorvanan e. Ma em nabînin hawîrdorvanên politîk jî li her derê cîhanê bi ser dikevin. Di hîlbijartina çûyî de, li Swêdê jî Partiya Hawîrdorvan (Partiya Miljê- Kesk) bi ser ne ket û ne hat parlamentoyê?

De bila ew, li me pîroz pêpar bin!

Pêwîst e ku hiqûqnasên Kurd li Swêdê û li hemû welatên Ewropayê rêxistina xwe xurt bikin.

Beşkirina welatê me bû sedem, ku ew pêvanên hiqûqî, siyasî yên navnetewî, ji bo netewên din, bi giştî nebe jî bi beşekê derbas dibûn; li Kurdistanê tu cara derbas nebû. Di jiyana cihanê de, di demên tarîxî û krîtîk de, carna ji bo beşeka Kurdistanê şertên baş û xweş pêkhatine, lê di wan deman de, dijminên gelê me li beşên din bûne sedem, ku ew şertên baş û xweş ji bo gelê me nayê bicihanîn. Em neçin demên dûr, di ev rojên nezîk de, di Krîza Xeliçê de, ji bo Kurdistanê Başûr, ji aliyê herêmiyê û cihanî ve, gelek şertên baş û xweş pêkhatine: Lê hezar mixabin dijminê gelê me yê mezin û xwediyê hesabên gelek qirêj, nahêlê, ku li cihanê, di nav reya giştî de, pirsra Kurdî ne bi tevayî, ne jî bi kismî bê rojevê. Dewleta Tirk û karibdestên wan gelek vekirî dibêjin, ku "rejîm û heta dewleta Iraqê bê ruxandî jî, em îzin nadin ku li Rojhilata Navîn Kurdistana serbixwe ava bibe, heta em îzin nadin ku pirsra Kurdî bibe pirsra rojan e û girîng".

Bes li Kurdistanê Başûr, encama tekoşîna gelê me û statûkoya tarîxî ya bihurî, mafên netewîşîklî hatine qebûl-kirin. Li her çar beşên Kurdistanê jî, em dikarin bibêjin, ku mafên gelê me yên insanî û demokratîk tune ye. Ji mafên insanî û demokratîk yên giranbiha, bê şik, mafê azadiya rêxistinî û fikrî ye. Gelê me tu dema jî, xwediyê wan mafan nebûye.

Dijminên me yên xwînmêj, her demê xwastine ku gelê me, bê rêxistin û "bê serî" û bê pêşeng bihêlin.

Ji bona vê jî, her çiqas welatê me jî, di nav xwe de, xwediyê çînan û kategoriyên civakî ye jî; lê hezar mixabin, ev

çîn û kategoriyên civakî, bi azadî, bi rehetî û bi dîlfirehî nikarin ku rêxistinên xwe yên siyasî, aborî û demokratîk ava bikin. Ya jî avakirina van rêxistinên di gelek sedemên zehmet û dizî de bûne. Vê jî, bi xwe re, teng bûyî, di afirandinê de zeîfî xuluqandîye. Di şertên îro de, gelê me ji bo cûre û cûre rêxistinên xwe ava bike, li rê û awayan digere. Çareserkirina vê pirsî, ji bo ku pirsra Kurdistanê li cihanê bibe pirsra rojanê, bê şik pêwîst e. Pêvaneke gelek xweyayî û jî aliyê her rewşenbîrekî ve jî tê zanîn heye ku, "Gelekî bêrêxistin, gelekî kole ye". Ji bona vê jî, dijminên me ji bo ku pêşiya karên rêxistinî bigrin, her xirabiyê dikin.

Rewşa Hiqûqnasên Kurd Çawa ye?

Di rewşa Kurdistanê de, hiqûqnasên Kurd, di çar beşên Kurdistanê de jî, hejmareke girîng teşkil dikin. Lê ji bo gelê Kurd xwediyê mafên netewî û demokratîk nîne, hiqûqnasên Kurd jî li her çar beşên Kurdistanê, statûkoyeke qanûnî û rêxistinî teşkil nakin.

Hiqûqnasên Kurd, bes dikarin bibêjin "em Kurd in", bi dizî di tevgerên siyasî de cih bigrin û bîrûbaweriyên welatparêzî bi dizî diparêzin, dikarin bikevin dadgehên welatparêzan û yên xelkê; vekirî û qanûnî dikarin di dezgeh û rêxistinên milletên serdest de, yanî di rêxistinên Tirk, Ereb û Ecem yên hiqûqnasên de dibin endam û li wir xwediyê mafên demokratîk in. Ew mafana jî çiqas teng in, her kes baş dizane.

Rastî ev tişt, bi serê xwe ezîyet û

tedeyîyek gelek mezin e. Tê wê maneyê ku, hiqûqnasên Kurd mecbûr in ku xwe ji karên rêxistinî dûr bixin. Ev pirsra, îro jî, li Kurdistanê pirsra gelek girîng e. Pêwîst e ku gelê Kurd û rewşenbîrên wan, ji bo çareserkirina vê pirsê gav bavêjin, îmkanan pêk bînin. Li kuderê şertên avakirina rêxistin hebe, li wira, bi fidekarî kar bikin, xwe organîze bikin.

Ji bo kesên ku hiqûqnas in û mecbûr bûne li dervayî welêt bijîn, di vî warî de gelek îmkân hene.

Li dervayî welêt îmkânên organîzebûyîna hemû kategoriyên civakî yên Kurd hene.

Wek em hemû dizanin, ku girêdayî şertên Kurdistanê û dîsa girêdayî êrîşên dijminên gelê me; em mecbûr bûne ku li dervayî welêt, ji ax, gel û evînên xwe dûr, li ser erdên milletên din bijîn. Ev dema ku em tê de dijîn, bi sedhezaran Kurd li dervayî welêt jiyana xwe didomînin. Di nav van sedhezaran Kurdan de, gelek beşên civaka gelê me dijîn. Piraniya van kesan karker in. Piştî karkeran bi hejmar xwendevanên tî. Lê ev salên dawiyê, piştî ku li welatê me tevgera rizgarîxwaz bi pêş ket û dijmin ji bo ku pêşiya tevgera Kurdistana bigre, êrîşên mezin kir. Encama van êrîşan, gelek doxtor, hiqûqnas, mihendîs û kesên din yên xwedî kariyerekê bûn, dev ji Kurdistanê berdan hatin li welatê xelkê bi cih bûn.

Ji bo ku Kurdên derva, piraniya wan karker û xwendevan bûn û zutirîn hatibûn li welatên Ewropayê bi cih bibûn;

“ ... mirov dikare bibêje ku li dervayî welêt hebûna hiqûqnasên Kurd tu cara xweya nekiriye û xebera kesî jî, ji huqûqnasan tune. Nemaza li dervayî welêt hejmara hiqûqnasên Kurd ji sedî zêdetir be, di xebata navnatewî de qet xweya nekin, ev rewşa hîn trajedîtir dibe.

”

Ji zû va ye ku rêxistinên xwe pêk anîne. Di destpêkê de, ev rêxistinana gelek qels bûne, lê di nav wextê de, xurt bûne, gelek kes li dor xwe civandine û di nav reya giştî ya Ewropa yê de rolên gelek girîng lîstine. Doxtor û mamostayê Kurd jî, ji van deh salên dawiyê de, rêxistinên xwe pêk anîne.

Em rewşenbîrên Kurdistanê, dema ku em li welatê xwe bûn, ji bo gelê xwe, me gelek vatinyên girîng û mezin bi cih dianî. Hiqûqnasên Kurd jî, beşek ji rewşenbîrên Kurdistanê ne. Lê hezar mixabin, îro em nikarin li dervayî welêt, van vatinyên xwe bi firehî binin cih. Lê herkes baş dizane ku li dervayî welêt jî, em ê vatinyên xwe binin cih.

Ji bo vê jî, rêxistin gelek gelek girîng e. Çimkî mirovek bi serê xwe nikare wek rêxistinekê vatinyan bîne cih. Bi taybetî jî, hiqûqnasên Kurd li dervayî welêt rolek nelîstin û giraniya xwe diyar nekirin. Heta mirov dikare bibêje ku li dervayî welêt hebûna hiqûqnasên Kurd tu cara xweya nekiriye û xebera kesî jî, ji huqûqnasan tune. Nemaza li dervayî welêt hejmara hiqûqnasên Kurd ji sedî zêdetir be, di xebata navnatewî de qet xweya nekin, ev rewşa hîn trajedîtir dibe.

Lê gelek baş e, ku çend salan berê, çend heb hiqûqnasên Kurd ji bo rêxistina hiqûqnasên Kurd damezrînin derbasî hareketa dibin.

Damezrandina Yekîtiya Hiqûqnasên Kurd ya Merkezî û Liqa Swêdê

Beriya vê 6 ya jî 7 salan, çend hiqûqnasên Kurd li Parisê hatine cem hev û xwastine ku komeleke hiqûqnasên Kurd damezrînin. Lê bona ku kêm

hiqûqnas beşdarî civînê bûne, bîryar dane ku komîteka ku şertên damezrandina komelê pêk bîne ava bikin û ew komîte jî ava kirine. Hezar mixabin vê komîtê, karên xwe baş nedomandine. Di encamê de, komele bi awayekî gelek xweyayî damezrandine. Ji bona Kongra Yekemîn jî, ji qismek hiqûqnasên Kurd re jî vexwendin şandine. Li Swêdê jî, ji çend hiqûqnasên Kurd re jî vexwendin hatibû şandin.

Piştî vexwendina van hevalan, gelek hiqûqnasên Kurd yên li Swêdê dijîn, beriya ku em biçin kongrê, dest bi civîna û mûneqesê kirin.

Pêwîst bû ku pirsêka bingeşî çareser bibe. Ev pirsê jî ev bû: "Gelo em li Swêdê, bi serê xwe wek merkezekê komeleke hiqûqnasên Kurd pêk binin, ya jî girêdayî merkeze (ku li Parisê hatiye damezrandin), wek liqekê damezrînin?"

Piştî mûneqesên dûr û dirêj, bîryar hat girtin ku, encamên Kongra yekemîn ya Komela ku xwe wek Merkez bi nav kiribû li Parisê bigrin. Girêdayî vê bîryarê, hevlekî me beşdarî kongrê bû.

Piştî agahdariyên vî hevalî ev bîryarana hatin dayîn: 1- Em ê bibin endamên komela merkezi. 2- Em ê li Swêdê jî liqekê damezrînin.

Encama van bîryaran, hiqûqnasên Kurd, li swêdê, ji bo ku liqê ava bikin, kar kirin. Di dawiya vî karî de, li Swêdê liqa hiqûqnasên Kurd, bi riya kongreke ava bû.

Yekîtiya Hiqûqnasên Kurd, wek merkezi, heta îro aktîvîteke xurt diyar nekiriye. Em hevîdar in ku hemû hiqûqnasên Kurd, li hemû welatên Ewropa hewil bidin û li ser kar û barên merkeza hiqûqnasên Kurd tesîr bikin

û li welatê din jî, karên xwe û rêxistina xwe xurt bikin.

Gora destûra Yekîtiya Hiqûqnasên Kurd, ew kesên li Kurdistanê dijîn û hiqûqnas in, dikarin bibin endam. Di vê pirsê de, destûr wisa dibêje: "Ew hiqûqnasên ku armancên komelê qebûl dikin û li Îranê, Iraqê, Tirkîyê, Sûriyê û li cîyên (welatên) din dijîn, dikarin ji bo endametiye serî li Komîta Kargêr bidin û endametiye daxwaz bikin.

"Ew kesên Fakûlta Hiqûq qedandine û xwendavanên sinifa çar ya fakûlta hiqûq in, hiqûqnas tên naskirin".

Destûra Yekîtiya Hiqûqnasên Kurd Liqa Swêdê jî, li gora destûra merkezi hatiye amadekirin. Li gora destûra liqê, liq, "yekîtiyeke demokratîk û serbixwe ye. Ne girêdayê tu rêxistinên politîk û olî ye."

Di destûrê de armancên liqê wisan hatine diyarkirin:

"1- Ji bo piştigirtina bizava azadixwaza gelê Kurdistanê dixebite. 2- Ji bo berevanî û parastina mafên rewşa, bi taybetî ji bo mafê çarenûs yê gelê Kurdistanê di gel liqê din yê YHK xebat dike. 3- Gorî wesaîqên hiqûqa navnatewî û peymanî Koma Miletan berevaniya mafê mirovane li Kurdistan û li cîyê civaka Kurd lê dijî, dike. 4- Di gel hemû rêxistin û komelên Kurdistanî xebat dike, da ku doza gelê Kurdistanê di nav dezgeh û rêxistinên cihanê de bide naskirin û qebûlkirin. 5- Hevkarîyê digel hemû komel û rêxistinên hiqûqî, mirovanî û demokratîk ên Swêdî û ên biyaniyên li Swêdê dike. 6- Hemû dokûmentên zagonî (qanûnî) li dor mafên gelê Kurdistan kom dike û belav dike. 7- Li dij hemû tawan û destdirêjiyên Kurdistanê derdikeve, riswa dike û wan tawan û destirêjiyên di nav dezgehên hiqûqî yê navnetewî de ifşa dike. 8- Ji bo berevanîkirina mafên Kurdên li Swêdê destyekî ji awûkatên Kurd û ji dostên gelê Kurd pêk tîne. 9- Raya giştî ya cihanê di derheqê rewşa girtiyên politîk li Kurdistanê agahdar dike".

Ji liqê re endameti, li gora destûra merkezi ye. Ew kesên hiqûqnas in û li Swêdê dijîn, dema ku destûr û armancên liqê qebûl bikin û endametiya xwe bidin, dikarin bibin endamê liqê. ●

HER KU DIÇE ESRARKÊŞÎ DI NAV BIYANIYAN DE ZÊDE DIBE

* Abît Dîyarbekirî li Sockholmê wekî asistanê Buroya Pirsên Civakî (Socialbyrå), ji bo çereserkirina problemên narkotika yê kesên biyaniyan, kar dike. Ew di nivîsara xwe de weha dibêje: "Min li Stockholmê bi nexweşxana Sabatsberg, bi beşê tedawîya narkomanan re têkilî danî û ez serwest bûm ku heta nuha 100-150 biyanî li vir tedawî bûne. Ji van 10-15 kes kurd bûn, ev ji perçeyên cuda ên Kurdistanê bûne."

Van demên dawîn di nav biyaniyan de bikaranîna esrar, heroyin û hwd zêde dibe. Wek encama tebîî, ya li hemû welatan û li ser hemû mirovan, kê-m-zêde li Swêdê jî vê yeka han bi xwe re problemên civakî û psikolojîkî peyda kirine.

Ew kesên ku hînî esrar û tiştên din yê jhişbirinê bûne, ne tenê ji civaka swêdî, her weha ji civak û kultura xwe jî dûr dikevin. Jîyana wan a rojane tevlihev dibe, nikarin ji bo pêşeroja xwe tu plan û programan bi xîç bikin. Nikarin kar bikin û ji ber ku pereyê di destê xwe de ji bo kirîna esrar û tiştên din bi kar tînin, nikarin kirîya xaniyê xwe jî bidin û bi piranî jîyana wan li kuçe û kolanan, li ser cadeyan û li ber sibandan derbas dibe. Ji ber ku madeyên narkotîkî (esrar, heroîn, hebên hişbirinê û hwd) jiyana mirov ya rojane serûbinî dike û mirovan bê hiş û bê taqet dihêle. Ji aliyê din ve jî pirsên aborî peyda dike, jiyana xwe bi kişandina esrar û eroyîn, li kuça û kolanan didomînin. Jiyana esrarkêşekî li kolanan ji dîzî, şelihandin û ji kirinên bêqanûnî pêk tê. Ji bona ku esrarkêşek bikare esrarê bikire, pêwistiya wî/wê bi gelek peran heye. Wek nimûne: 1 mg heroîn bi 500 kronên swêdî ye. Ji bo mirovekî 3 mg heroîn pêwîst be, divê 1500 kronan peyda bike. Û xuya ye ku peydakirina vî pereyî ne hîsan e û bê guman yê-ya esrarkêş jî bo peydakirina vî pereyî qanûnî, yan

bêqanûnî, çî be, wê bike.

Di gel pêwistiya aborî û problemên psikolojîkî, şexsiyeta mirov zerareke mezin dibîne.

Celeb-Celeb tiştên tevîzîne hene û her wusa tesîra wan jî li ser mirov cuda ye. Weke heroîn, kokaîn, amfetamîn û hebên hişbirinê. Tesîra wan li ser mirov helbet dê cuda be. Eva mijarê nivîsareke din e. Li pêş ez dê hewl bidim ku di hejmareke din de li ser van cudabûna bisekinim.

Di gel cudabûna wan jî, tesîra neyînî ku tiştên hişbirinê li ser psikolojî û şexsiyeta mirov dikin, bi kurtî ev in:

-Jiyaneke şerperze û her gav bi hîsên xemgînî jiyîn..

-Li ba mirov hîsên nerast û xeyalî çêdibin.

-Mirov di bêhêvî û tevlihevîyê de dijî

-Mirov hişê xwe winda dike û problemên balkêşanîyê li ba mirov peyda dibe.

Ev diwarîyên psikolojîkî ku me li jor rêzkirin di wexteke dirêj de nexweşiyên psikolojîkî li cem meriv çêdikin. Eger di wexta xwe de çareyek jê re neyê dîtin, an di wexta xwe de tedawî nebe, mirov dikare hişê xwe bi tevayî winda bike (Ango dîn bibe!).

Sedemên ku mirovekî biyanî dikin esrarkêş:

Li welatekî biyanî bi cî bûyin demek dirêj digre û gelek çetîn e. Û gelek diwarîyên vê hene. Tevî ku tesîra li xerîbîyê jiyîn li ser her kesê ne ji wî welatî ne wek hev e, lê bi giştî mirovekî biyanî li welatê nû pêrgî gelek problemên nû dibe, bi tena xwe nikare çî ji problemên xwe yê berê - aîle, zarok, xwendin- çî ji problemên nû re - fêrbûna ziman, adaptasyona civaka nû, kultura nû, peywendiyên, angû bi her alî ve jiyaneke nû - çareyan bibîne, xwe pir bê karî dibîne, xwe li derî civakê hîs dike. Di serê wî de ew kesekî bextreş û bi serneketî ye. Bê çare ye û mixabin li civaka nû ew makenîzma jî tunene ku destê alîkarîya dirêjî wî bikin, yan bikarin bi awayekî bê problem çareyan jê re bibînin. Ev rewş zêdetirîn li cem penaberên siyasî peyda dibe. Ji ber ku ew penaberên siyasî berî ku werin Swêdê, li welatên xwe xwedî zanav (kimlik) û şexsiyeteke bûn. Lê li wî welatê ku nuh hatiye, divê jî nû ve dest bi hemî tiştî bike. Ango divê ziman, kultur û torên welatê nû fêr bibe. Eva jî wextek dirêj dajo. Ew wexta bi diwarî û zehmetîyan tijî ye. Ew mirovê ku di hundirê vê wextê de nikaribe li hember van zor û zehmetîyan raweste, li ba nexweşiyên psikolojîk çêdibin an jî dest bi esrarkêşiyê dike. Armanca bi-



Madeyên narkotîkî (esrar, heroîn, hebên hişbirinê û hwd) jiyana mirov ya rojane serûbinî dike û mirovan bê hiş û bê taqet dihêle. Ji aliyê din ve jî pirsên abortî peyda dike, jiyana xwe bi kişandina esrar û eroyîn, li kuşa û kolanan didomînin. Jiyana esrarkêşekî li kolanan ji dîzî, şelihanandin û ji kirinên bêqanûnî pêk tê.

karanîna esrar û tiştên hişbirinê ev e ku ji bo wexteke derbasî be ji mirov problem û meselên xwe ji bîr bike.

Eşkerekirina sedemên esrarkêşîya biyaniyekî ne tiştêkî hêsan e. Lê dîsa ji mirov dikare bibe ku jiyana mirovê biyanî ya berê li welatên wan tesîreke mezin li ser vê yekê heye; weke cihê wan di civaka wan de, ziman, sinet û rewşa fîlamîya wan, evan tev roleke mezin dileyzin. Lê mixabin di vî warî de hêj li Swêdê tu raport û lêkolînên ku vêya şîrove dikin zêde tune ne. Ji ber ku ev problema di van wextên dawîn li Swêdê zêde bûye... Lewra dîsan ji tecrûbeyên karê xwe dikarim van mirovan di çend grûban de beş bikim.

Gruba 1.: Ew xortên ku li vir hatine dunyayê û li vir mezin bûne. Sedema ku van xortan dixê reya nebaş meriv dikare bibê ku nelihêvhatina kulturî ye. Ango ev kes xwe ne weke Swêdiyekî û ne jî weke mirovekî ji civaka ku jê hatîye hîs dike. Ji ber ku exlaq û torên malê ne weke ên civaka Swêdê ne û eva jî bi xwe re dijîtiyekê tîne. Eger ku ev dijîti bi hawayekî erînî çareser nebin li ba mirov tevliheviyekê zanavî çê dikin.

Grûb 2.: Ev grûba jî ji ew biyaniyên navsere ne ku ji ber sedemên cuda-cuda hatine Swêdê. Gelek caran sedema ku ev kes dest bi esrarkêşî û bikaranîna tiştên tevizinê dikin, problemên malbatî ne. Weke mînak hevberdana jin û mêr. Lê helbet di vir de rola problemên

civakî û zanavî jî heye.

Grûb 3.: Di vê grûbê de ji meriv dikare wan biyaniyên ku hêj li welatê xwe esrarkêşî dikirin, bicivîne. Her wusa ew kesên ku bela û felaket ji jiyana û tedawî nebûne, ew jî dikevin vê grûbê.

Bikaranîna esrar û tiştên hişbirinê di nav kurdan de:

Berî ku min ev nivîs nivîsand, min bi hinek daîrên Swêdî re têkilî danî, ji bo ku ji wan îstatîkan (hejmar) bigirim bê çîqas kurd hene ku esrar û tiştên hişbirinê bi kar tînin. Lewra mîna ku di hemî tiştên din li vir jî kurd weke miletekî bi serê xwe di îstatîstîkan de tunene, lê weke ereb, tirk û farisan derbas dibin.

Min li Stockholmê bi nexşxana Sabatsberg, bi beşê tedawîya narkomanan re têkilî danî û ez serwext bûm ku heta nuha 100-150 biyanî li vir tedawî bûne. Ji van 10-15 kes kurd bûn, ev jî perçeyên cuda ên Kurdistanê bûne. Ji bo alîkarîyê, têkilîya min bi 5 kesan jî van ve heye. Lê ez bawer dikim di vir de hajmar ne ewqasî girîng e. Ya girîng ev e ku divê mirov qebûl bike ku ev problem di nav kurdan de jî heye. Her wusa eva vatîniya me ye ku em alîkariya van mirovên xwe bikin. Îro li Swêdê tu daîrên an jî cihên tedawiyê di vî warî de ku bi taybetî ji bo mirovên ji rojhilata navîn hatine, tune ne. Ya girîng ew

e ku em ji bo ku rê li van tiştan bigirin, divê di nav xortan de bixebitin ku ewana nekevin riyên wusa. Xort divê zêde beşdarî xebatên kulturî bibin ku xwe baştir nas bikin û zanavekê xurt bigirin. Her wusa di nav hemî kurdan de divê di her warî de xebatên civakî bînin kirin. Gelek kurd hene ku xwedî problemên civakî ne. Divê em van mirovên xwe wusa bi tenê xweserî problemên wan nehêlin. Di vir de divê bê gotin ku rola komelên kurd û Federasyonê jî girîng e. Lê divê em li benda kesî jî nemînin; em bixwe yek bi yek jî be, biçin bi wan re têkilî deynin, alîkarîya wan bikin; bi kêmanî bi wan re bipeyivin, peywendiyên rojane girêbidin û eger ji me hat alîkarîya çareserkirina problemên wan bikin. Divê em ji bîr nekin ku kurdek bêyî alîkarî qala problemên xwe yê aileyî, yan jin û mêrtî, yan cînsî, yan her problemek be, ji kesî re nake. Ji dorûberê xwe fedî dike, naxwaze kurdên din bi problemên wî-wê bihesin. Lê ev yek yek wan kesan hîn bêtir bi esrarê ve girêdide. Ji ber ku her mîlîmetreyê ku ew ji civaka kurd dûr dikevin, ewqas nêzî esrarê dibin û problem jî bere-bere meztir dibe, ji dest me derdikeve, êdî em nikarin tiştêkî bikin.

**Abîd Dîyarbekirî
Asistanê pirsên civakî**

Li Ser Romana Elîyê Evdilrehman

ROHAT


Berî çend meha romana nivîskarê Kurdên Sovyet Elîyê Evdilrehman bi navê "Şer Çîya De" bi tîpên krîlî ve, li Erîvanê der çû. Ev romana ku ji 460 rûpelî pêk hatîye, çawa nivîskar dîde kîvşê, di navbera salên 1970-1985'an de hatîye amade kirin, nivîsandina vê berhemê demeke dûr û dirêj kişandîye.

Di destpêka romanê de nivîsareke Çerkezê Reş çîh girtîye, ew di vê kurtenivîsara xwe de li ser babeta roman nivîsinê û romana Kurdî li Sovyetê disekine. Di dawîya romanê de jî, nivîsareke dîroknas Karlanê Çaçan li ser nivîskarê vê berhemê, jiyîna wî çîh girtîye. Dîsa di dawîya romanê de, wek beşeke romanê bi xwe nîn be jî, beşeke bi navê "Navbirîya Biçûk" heye. Piştî romaneke wusan dirêj, nivîskar baş jî kirîye, wekî parçekî bi xwendevanan ve awa li ser pîyan sohbet bike derheqa dijwariyên nivîsandina romanekê de.

Çawa nivîskar di vê "sohbeta" xwe de jî dîyar dîke, ev romana bi navê "Şer Çîyan de" beşa yekemîn e ya romana ji du beşan pêk hatî.

Ev romana Elîyê Evdilrehman li ser tekoşîn û mêrxasîya Kurdên li dorberê Çîyayê Girîdaxê, serhildana sala 1930'yî û li ser hovîti, zordestî û tevkuştina hukmeta Tirkîyê hatîye nivîsandin. Mirov eger romanê bi nav bike, wek "romaneke dîrokî" ye. Çawa tê xuyanê, nivîskar di derheqa dîroka vê serhildanê de baş kûr bûye, vekolandiye, lêgerînên fireh berî nivîsandina romanê pêk anîye. Bi gelek kesan ve deng kirîye, gelek dokumentên arşîvan li ber çavan re derbaz kirîye.

Li jor jî me got babeta giring di romanê de Serhildana Girîdaxê ye. Ev çîyayê muhtaşem di nav Kurdan de bi Çîyayê Girîdaxê tê zanîn, di çavkanîyên kevn de Ararat, bi Tirkî Axrî, Farisî Koh-i Noh, Ermenî Masik û bi Erebi jî



Nivîskarê Kurd Elî Evdilrehman, nuha li Qazaxistanê dijî.

Djebel al-Hariş tê navkirin. Ev çîyayê ku di despêka romana nivîskar ya yekemîn de (Gundê Mêrxasî, 1968), ji ber zordestîyên mezin "cemidî bû" û "kirasê xwe yê sipî li xwe alandibû", di vê romana nû de serî hildide, diteqe...

Ev romana nû her çiqas Serhildana Çîyayê Girîdaxê tîne zimîn jî, roman jî alîyê din de, li ser mêrxasîya welatparêzekî Kurd ango Şêx Zahir hatîye nivîsandin. Di romanê de tekoşîn û evîna Şêx Zahir bê sînor e, agir li ber çavên wî dipeke.

Di despêka romanê de, nivîskar can dide vî çîyayê dil bi kul û gezeb şewitî, wî jîndar dîke, wek mirovekî bi çîyan re dipeyîve. Girîdaxê mezin û biçûk wek du biraderan dibîne. Paşê ev herdu bira jî dîya xwe, ji tebiyetê gazin û loman dikin "Çima tebiyetê em tenê bona birîndarkirinê û rewşa me xirabkirinê xuliqandîye". Nivîskar di vê despêka

romanê de problemên ekolojîk û polîtîk gelek baş di nav hev de hunandine, hevîr kirîye. Çîyayê Girîdaxê di vê beşê de pelên hêşîn û stranên aşîtiyê li xwendevanan dibarîne.

Şêx Zahir kurê Şêx Emer e. Şêx Emer, ji nesla Şêx Evdilqadirê Gêlanî tê. Malbateke walatparêz û şîr helal e. Piştî binketin û pêpeskirina serhildana şêx Seîd di sala 1925'an wek vê malbatê zordestîyên li der Kurdan her diçin zêde dibin.

Şêx Zahir di nav van zordestîyan de mezin dibe, li Wanê diçe medresê, li wir dixwîne, dibe xwendevanekî jêhatî. Ji alîyê din ew li hemberî neheqîyan, êrişan berxwe dide, ew bi mêranîya xwe ve tê nasîn. Di salên dawîn de ew dibe hedefê zordestîyên resmî, paşê dest ji medresê ber dide, diçe tevî çeteyên li dijî hukmetê dibe. Şêx Zahir bi mêrxasî, tekoşerî, mirovhezî û cengawerîke mezin ve li dijî leşkerên Tirk şer dîke. Navê wî li nav şênîyê dorhêla Wanê û Bazîdê de her diçe belav dibe, dibe destan, çîrok û stran. Pêkhatina

vê prosesa efsaneffî, tirs-xofeke mezin di nav hêzên dijmin de peyda dike. Ev hêzên dijmin ne tenê Tirk in, di nav wan de Kurd jî hene, wek Edoyê Hesên û Îsa Beg. Van Kurdîroşa çawa di romanê de jî tê xuyanê xwe wek "Padişahên Kurdistanê" hesabandine, çawa di rojên me de wek "parêzkarên Gundan" (Köy Koruyucuları).

Şêx Zahir wusan xurt dibe, êdî jî bo hukmetê dibe faktorekî nerehetîyê, leşkerên Tirk hertim lî pey wî ne. Weke ku di kilamekê de jî tê gotin: "Ew qaçaxê dewletê, firyarê mala şêx e". Çawa di romanê de tê xuyanê Şêx Zahir jî bo ku hêzên xwe bi hêzên Kurd yê mayîn ve bike yek, diçe hêla Bazîdê Îbrahîm axa dibîne. Îbrahîm axa re wusan jî digotin Birikê Hesikê Têlî. Hem Şêx Zahir, hem jî Îbrahîm axa wek du serokê leşkerê serhildana Girîdaxê tên zanîn. Şêx Zahir, wusan jî nasiya xwe dide Îhsan Nuri (Nivîskarê romanê wî Nuri Îhsan bi nav dike). Hevduhîna van hersê mîrxasên romanê, di romanê wek platformeke yekitîke germîn tê xuyanê, dema ew jî hev vediqetin: "Îbrahîm axa û Nuri Îhsan netika (enî) wî radimûsin".

Ev ramûsana di romanê de dibe nîşana yekitîya rojên pêş. Di romanê de beşeke mezin li ser zordestîyên hukmeta Tirk e. Ordîya Tirk dema dibîne, êdî nikare zora Kurdan bibe, vê carê jî hewayê bi alîkarîya balafiran (Firinde, Teyare) topan li ser Kurdan de dibarîne. Ev axa Kurdistanê dibe "Newala Cehenemê". Wek gelek Kurdan jina wî Simbil jî di nav van êrîşên hov de can dide. Şêx Zahir jî tê birîndar kirin, paşê jî wî dîl (esîr) digrin. Lê belê telal û berdevkên hukmetê bi lez nûçeyan belav dikin ku Şêx Zahir "teslîm" bûye. Lê belê ew jê dernaxin wekî Şêx Zahir jî aliyê bi sed hezaran mirov de bûye stran, ketîye li ser zar-zimanan:

*Şêx Zahir kire gazî-çê bin, çê bixebitin
Jor qewata me xudê ye, jêr guman Kurd in.*

*De, fedayîno lêxin, bav û birano lêxin
Piştê eskerê Kemal bistînin, revê pêxin.
Esker qir kin, top û teyara bişewitînin
Nav û dengê Kurda li dinê xin.*

Roman her çiqas romanêke dîrokî û şer be jî, car-carina xemil û nexşên tebîyetê bi destê Eliyê Evdilrehman xweşiktir, rindiktir dibin, wek tasvîrkirina danê êvarê: "Royê êdî gultîyê xwe yê zêrîn hindik mabû ji erdê berev bikira". Dema leşkerên Kurd kom-kom berbi hemêz û sîngê çiyayê Girîdaxê rê dikevin, nivîskar berî vê yekê tebîyetê jî hişyar dike û bi hunereke mezin ve tebîyetê jî cihê xwe dileqîne: "Çemê Kurdistanê bi ava çeman, kanî û baranê gur bibûn, hinek jî, ji kendalê xwe derketibûn, bê westandin şev û rojê dikişyan, rast-best werdigirtin". Bi rastî mirov nikare ewqas jî nivîskar zêdetir tebîyetê seferber bike.

Ji aliyê din, di gelek cihên romanê de îfade û zûgotinoka "Îdir, Erdîş, Wan" pir caran zêde hatiye ducarkirin an jî ber çavên nivîskar revîye. Nivîskar di dawîya romanê de xwastîye, dostîya navbera Kurdan û Ermenîyan nîşan bike, bo vê yekê jî xwendevanan dibe rojên buhîrî, salê 1915'an, ev beşa bala xwendevanên bê sebir belav dike. Lê belê çî dibe bira bibe, piştî 60 salan di nav rûpelên romanekê de bîranîna vê serhildana Girîdaxê hem jî bo pêşketîna edebîyata me, hem jî bona ronahîkirina rûpelekî dîroka me, gaveke girîng e.

Çawa nivîskar dide kîvê berdeewama vê romanê heye, dixwaze wek beşên duwemîn biweşîne, lî ser mîrxasên pêşenîya yekemîn Îbrahîm axa û Îhsan Nuri bisekine. Nivîskar şerê Şêx Zahir wek şerê "pêşenîya duwemîn" bi nav dike. Em hêvî dikin ku tekoşîna "pêşenîya yekemîn" jî bo me xwendevanan, di nav demeke kin de bibe romanêke duwemîn. ●

Kitêbek Karîkaturan Bi "textên Almanî" (!)

Di hejmara Berbangê ya 65'a di rûpela 26'a de li gel îlana çend kitêbên din, îlana kitêbeke bi navê "Moments Methods of Torture The Military Prison of Diyarbakir" jî heye. Li gor îlanê, kitêb, kitêba karîkatura ye. Nivîskarê wê Zulfîkar Tak e.

Di îlanê de bi çend rêzan hatiye gotin ku Zulfîkar Tak, metodên îşkencê di girtîxanên Tirkîyê de bi riya karîkaturan raxistiye ber çavan û ew bi "textên Almanî" di pitûkekê de top kirine.

Berî nuha jî hin girtîyan çend kitêbên karîkaturan weşandibûn, min jî wan yek bi dest xistibû. Lê kitêbeke karîkaturan bi "textên Almanî" ev cara pêşî bû ku min dibihîst. Lema jî ji min re tiştêkî pîrr xerîb û nuh hat. Bi

hawakî dudilî min jî xwe re got, qey di dewsa kaxetê de "text" bi kar anîye. Li gor guherandinên li dinyayê, dibe ku di warê sinetê karîkatur de ev jî teknîkek nuh be! Yanî kitêbeke jî textan...

Çima nebe! Lê cardin jî vê yekê ez anîm heyecanê, mereqa min zêde kir. Ev li aliyekê, li aliyê din min qet fahm nedikir ku çima "textên Almanî" hatiye bi kar anîn... Vê pîrsê ez gelekî mijûl kirim. Lê dawîya dawî min got mûnkun e ku "textên Almanî" jî bo karîkaturan cînekî baş e. Îcar a çêtir ew bû ku min jî xwe re yek bixwesta û bi çavên serê xwe bidîta.

Min lê nerî ku mektubê jî adresa xwestinê re binivîsînim, min nivîsa Amed Tigrîs a bi sernivîsa "Filîmekî

Kurdî" jî xwend. Di vê nivîsê de jî cumleyek wiha heye: "Dengê kasetê bi kurdî ye, lê textên wê bi swêdî hatine nivîsandin."

Piştî vê cumlê êdî min baş fahm kir ku ew "text" çî "text" in. Yanî ne ew textê ku em her roj goşt li ser hûr dikin, ku bi kêmasî min wer fahm kiribû. Bi gotîna "text" armanca hevalan ne textê ku em giş dizanin, lê tekst, yanî metîn bûye. Rast e bi swêdî û bi hin zimanên din tekst, yanî metîn wek ku di Berbangê de hatiye nivîsandin, tê nivîsandin, lê bi Kurdî nabe. Gava wek Swêdî bê nivîsandin ew wek tekst nayê xwendin, wê wek "text" bê xwendin.

Zinarê Xamo

JI BO KU EM GULA BERBERO DI BERFÊ DE JI BÎR NEKIN!

Ehmed Huseynî

**BAVÊ FELEK te digot:
"Ez ji dû pišta Felekê venagerim!"**

Gava ku roka "XECOKÊ" di kezeba ezman de har dibû, gava ku rojên me ji bîstan û bexçên fireh dihatin û ji simbêlên ku êşa salan û derdê miletekî tevî hilgirtibûn. Hunermend tê, kulemek ji zaroktîya xwe, girên ji tozê, heriya gundan, reçên biwestan, wêran û zindanê û peymanî evîndarekî ji beja Kurdistanê hildigire. Hunermend M. Şêxo tê, tovê êşê di dilê me de duguvêşe, xewna me belav dike li deşt û zozanan, li gundên bê gundî, hêsrên me bi ser kavlî û koçan de direşîne. Derd, derdê ku belav dibe mîna zuxuran di bin sîmê sitemkar de di qorzîka çavê berbangê de vedîşart û distira...

Di mirinê de bo jînê distirê, di xweşiyê de bo girî distirê û dibe hozanê hemû rexên şîmê, dinale, dilerize, diçilmise. Lê çavên xwe ji yên nêrgizê naşkîne. Ji sala ku hatiye dinê (1948) ta roja ku şîmî di ser dev re çû (9.3.1989) Bavê Felek emrekî bi azar û kul buhurand. Zarokî bi dijwarî derbas dibe di malbateke cotkar û belegaz de li gundê Xecokê. Nêzî Qamişloyê li Kurdistana Sûriyê. Bejinzirav, çavreş, porzivir, kiras bi xwêdan, bi ava zebeş û tirî, xwas û nenûkdirêj berê xwe dide gundê Berko, li teniştê hevalê xwe Farûq rûdinê. Tava nîvro ye û Xwedayê germê ketiye xewa şêrîn, ji qalikê kundirekî, tembû-

rekê çêdikin û ji wê gavê de tiliyên bi xemê hinekirî û dilê ji genim çêkirî, fêrî tîpayekem ji dojecha sazê dibe. Têlên tembûrê carekê bi dizî "di cejna qurbanê de" ji bajarê Qamişloke dikire û wan li ser rêça welat û azadiyê girêdide.

Gav dest pê dike bi hêrs û bi tevzînok, bi hêsrên dil, bi devkirina lêvan, bi hezkirina welatê kew û berîwan. Ji qalikê kundirê dest pê dike û gav bi dû gavê de tê...

Sala "1969" Bavê Felek li Beyrûtê fêrî mûsiqê dibe bi awakî zanistî û li gel komên folklorî û dengbêjên kurd pêşkêşî şev û cejnên kurdî dibe û hin sitranên xwe çap dike û belav dike. Pêre dengê wî li mal û kolanan, li gund û bajaran, mîna çemekî zelal diherikî û axîn di pêlên sitranê de difûriyan...

Ji Beyrûtê vedigere qamişloke, li karekî digere. Divê ji xwêdana eniya xwe bijî. Li "rimêlanê" dibe pale "bîna gazê û dengê tembûrê çi ji hev re dibêjin?" Lê ev e jîna bindestan, ev e kesê ku dilê xwe biqêşere û di hênikayiya bayê sibê de bêje: Fermo welatê min!

Piştî xebata demekê di bexçê petrolê de, qeremûşkên xwe, lepên bi qirêj, nijadperestî dilive, weris li dor gepa nan dişidînin, dixwazin dengê Bavê Felek bixînin an miletekî bêdeng bikin zindan, lêdan, diwarên tazî û reş û jê re dibêjin: Emê tiliyên te hilkin!

Bersivê dide û tiliyên dil wê çawa bîna hilkin? Û Bavê Felek serê bilind berjêr nake, an xwe nafiroye û bejna dirêj tev dibe tiliya welat. Sala 1974

“ Stira... ji paleya ceh û genim, pembo û garis, bo oxira dawî stira... bo cenga dawî, bo maça dawî, bo çemê dawî ji xwîne stira... û dengê wî beriya navê wî hilperikî xerîta Kurdistanê, têlên tembûra wî asoyên lêvên birîndar xemiland û sibeha perîşanên Kurd yên di seqemê de, di koçbariyê de, di birçibûnê de bi dengê xwe pêça!

”

berê xwe dide şoreşa Kurdistanê, tembûrê davêje milê xwe û tariya sînoran pê diqelêşe, bejna wî û çiya li hev dihat. Cara yekem, ku li bin siya çavê pêşmergan "Bavê Felek" xewa bêtirs dikir û reşê azadiyê ji dilreşiya bindestiyê nas dikir...

Di sala 1975'an de li Kurdistana Îranê koça xwe datîne.

" Ji Mahabad kaniya xwîna şehîdan vî sirûdî bo we pêşkêş dikim, hingî te-sîra wê li me bû".

Ji ber ku şîmî ne bêhêvîbûn e, û ji ber ku Bavê Felek bi xwe mamostê şîmî ye û dizane bê kînga şîmî dibe bêhêvîbûn sirûda "xortên me lê ne bê jimar" bo gelê Kurd pêşkêş dikir û bi awakî rêzanî û hûr sitranên ku xweşikbûna Kurdistanê diyarî dikin. Bavê Felek bê hejmar di wê demê de pêşkêş kirin. Rast e, bi bayê Felekê re giriya û li ser kavlîên welat dengê şîkestî raxistî ma. Lê her û her "gulê nade bi malê dinê" û li ser gulê tê kuştin.

Sala 1983 berê xwe dide Qamişloka şêrîn "bajarê evîne, ciyê govend û birîne" li wê ye dermanê axîne". Xort, keç, pîr, kal, zarok, darên tiwê, şîva hesin, mezirb, toza tîr, baran fedyok li hêviya Bavê Felek radiwestin. Bêriya dengê xwe kirine, bêriya êş û evîna xwe kirine, wî li ser kolînga xwe dikin, bi baskê evîne dinixumînin û wî ji zordestiya demê diprêzin. Ji êşa ku gelê Kurd ji sedsalan de di dilê sitranekê de veşartîye M. Şêxo tê. Ji wan gundên biçûk û bêdeng fêrî derdekî mezin dibe û pê

dijî... Bi wê tarîbûna ku xwe berdabû ser sibehe wî, jîyan himbêz dikir. Bi rastiyeke sipî û tenik, bi nîjadeke kwîr şînî wergerand, kir dengê ku bîna çîya jê tê, ku bîna ezîfî folklorî milletekî cengawer û evîndar jê tê...

Hêdî hêdî axîna xwe, bi dîroka welatperweriyê, bi qîrîna pêşmergan, bi jîna Kurd, bi konê reş, bi ala rengîn dipêça û dadigirt...

Sitra.. bi kûr-kûr û jî derd û kûlên ku gav û saet Kurdistan tê de dijî.

Ji şevên bê heyv, ku keça Kurd li ser piştîyê pûş xwe veziland, di havîneke germ de û xwêdana hêviyê jî ser eniya xwe paqij dikir...

Stira... jî paleya ceh û genim, pembo û garis, bo oxira dawî stira.. bo cenga dawî, bo maça dawî, bo çemê dawî jî xwîne stira... û dengê wî beriya navê wî hilperikî xerîta Kurdistanê, têlên tembûra wî asoyên lêvên birîndar xemiland û sibehe perîşanên Kurd yên di seqemê de, di koçbariyê de, di birçîbûnê de bi dengê xwe pêça!

Bavê Felek hunermendekî rastîn bû, jî nav mîlet derket û jî bo wî huner, sitran, saz danî rex tivingê, sitran bi ceng û xebata gelê Kurd re perçim kir. "Û pêwîst e ku di şer û xebatê keve ta çermê xwe"(1)

Û ta deqa dawîn Bavê Felek dixwest li Kurdistanê bimire, axa wê dilovan e, nerm e, pîroz e û xemgînê mîna min divê li zemîneke xemgîn bê veşartin... Lewra xwe jî sînga welat berneda û tu carî çentê xwe amade nekir bo welatê xelkê.

Azareke deyûz hat, konekî nû vegirt, evîndarê axê, gul jî nav destê Qamişlo-kê revand. Gelê Kurd laşê nazik û pak li ser darbesta dilê xwe kir, bi karnivaleke mezin, bi hunerê, bi evîne, bi şîniyeke bê hempa berê xwe da goristana "Hilêlikê".

Pîrejînekê dikir hewar, porê xwe dikşand û ban dikir:

"Bejna çîya çû!"(2) Bejna ku jî Kurdistanê hez dikir ta sinorê mirinê çû!

Nîşe:

1) Milê: Hunermendekî Firensî

2) Pîrejînekê jî Qamişlo-kê bi dû laşê Bavê Felek de dimeşîya û ta HILÊ-LIKÊ ev hersê gotin tenê digot:

Ji Evîna Kevnegundî

- M. Mayî -

Bîra min têt
Hêj min tu ne naskiribûy
Ez zaroyek biçûk bûm
Ew çîyayê li ber gundê me
Bi mezinîya xwe
Hevalê zarokîniya min bû
Esman bi lindîya xwe
Heyv û stêr bi dûriya xwe
Hevalên zarokîniya min bûn

Bîra min têt...
Dema hêj ez zarok bûm
Berî te nas bikem
Min zimanê derewan jî ne dizanî
Tu hatî û...
ALFABE ya derewan
Di bin milê te de bû
Bîra min têt
Dema ez zaro bûm
Xwedê jî nuke mezintir bû
Berî te nas dikem
Ez û Xwedê wekû cotek hevalan bûn
Me pir jêk hez dikir
Tu hatî..
Te Xwedê jî min kûvî kir
Esman, esman jî te berze kir

Tu çi dizanî?
Ka ce min û heyvê
Çi eşq jêk hebû?
Ez û heyv
Li şevên kewçerîne di gehijtîm êk
Min ew bi çavan dipereşt
Wê jî
Bi gîrnîjînan ez dimêjandim

Tu çi dizanî?
Ka wê şevê
Rûbarê gundê me
kîj lawje digot?
Guhên te helan bûn
... kevîr bûn
tiştêk ne dibihîst!
Ax...! bo wê şevê!
Ax... mixabin
ku te ne dizanî
ka wê şevê
dengê rûbarî çendê xweş bû

Çavên te jî kûre bûn
Te xemla gundê me
li şeva kewçerîne ne dît
Ax... bo wê xemlê!

Te nedît
Ewê şevê
Heyv li esmanî Balavî bû
Di nav gerên
Rûbarê gundê me de
balav dikir

Tu çi dizanî?
Ez û heyv û rûbar
sê aşiq bûn
Em hersê
aşiqên Gundî bûn
Em hersê aşiq û
Me hersêka eşqek hebû
Dilên me jî jêk ne diman
Em hersê aşiq û
Me hersêka
bi eşqa xwe gund xemiland
Ez...
Ez da jî nav baxçê şîrên xwe
Ya herî ciwantir kem û
diber serî rakem
Heyv...
Heyv wekî dêmê yara min
dibîşkurî û
gund digel xwe dibir seyranê
Rûbar...
Rûbar jî da destê xwe det bin guhê
xwe

qîrket lawje û
heyranên dilveker
Em sê aşiq û
Me hersêka eşqek hebû
Em sê aşiq
Me hersêka bi eşqekê gund dipereşt

Tu çi dizanî?
Hêêêêêêy.. Hêy mala te!
Hêj tu nebûy
heku min û gundî hez jêk dikir
Hêj tu nebûy
hekû min û eşqê hez jêk dikir
Evroke jî
ji xemên eşqa gundî
zerkê heyva me girt û
strana eşqê
rûbar jî pîr kir û
Min jî..
kitêba derewên te
hezar û hezar carî xitim kir

Stockholm, Payîza 1989

Ferhengoka Termînolojîyên Hiqûqî bi swêdî û kurdîya jorîn hate amadekirin


Ev ji mêj ve ye ku Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, bi hev-kariya Xwendingeha Gel ya Bilind Biskops-Arnö, ji bo berhevkirin û amadekirina terîmên hiqûqî bi zimanê swêdî-kurdî (kurmançî), xebateke zanistî û kolektîf dihat meşandin.

Heta nuha ev xebata di bin serokatiya mamostê zimanê kurdî Reşo Zîlan, wekê kurseke akademîk hat birêxistin. Gelek tercuman, mamoste û karmendên Kurd di vê xebatê de beşdar bûn. Carna jî hiqûqnasekî swêdî di vê kursê de amade dibû û alîkariya vê xebatê dikir.

Kursa berhevkirin û amadekirina terîmên hiqûqî bi zimanê swêdî û kurdîya jorîn (kurmançî), di vê payizê de û di bahara 1991'ê de jî bête domandin.

Armançê vê xebatê ew e ku ferhengokê termînolojîyên hiqûqî bi swêdî û kurdîya jorîn bête bete berhevkirin û belavkrin.

Bêguman ev kar ne karekî ewqas hêsan e. Hûn bi xwe jî dizanin ku karûbarê çêkirin, berhevkirin û peydakirina termînolojîyên hiqûqî bi zimanê kurdî, ne hêsan e. Her weha, bêşik, ew dê çewtî û kêmasiyên vê xebatê hebin. Ji ber ku, di vî warê de, gelek asteng û kêmasiyên me bi xwe hene. Berî her tiştî demûdezzeh û sazûmanên me yên zanyarî nînin. Bi tevayî jî bo vê yekê, ferheng, pirtûk û kovarên xas û bi zimanê kurdî jî tunene. Dewletên zordest û nîjadperest, hîn jî nahêlin ku em bi zimanê xwe bixwînin, binivîsînin û bipeyivin. Ji ber van sedemên eşkere ne ku em bi xwe jî pir caran ji ber tunebûna ferhenga terîmên kurdî, di karê xwe yê wekî tercumanî, mamostetî an jî rasterast axaftinên xwe de terîmên û peyvên zimanê biyanî biyanî (tirkî, farişî, erebî, swêdî) bi kar tînin. Lewra, divê em jî êdî li gor îmkaniyetên xwe, ji bo pêşdebirin û dewlemendkirina zimanê kurdî xebat bikin.



Dema ku Dr. Celîlê Celîl ji Sovyetê hatibû, çû xebata tercumanên Kurd li Xwendingeha Gel ya Bilind Biskops-Arnö ji nêz ve nas kir.

Belê, divê mirov di cihekî de dest bi xebatê bike. Di xebat û keftelehtë de çewtî û kêmasî çêdibin. Lê, wekî ku bi xwe jî dizanin, dîsa bi xebat û hewildanê ew çewtî û kêmasiyana hindik dibin an jî ji holê radibin.

Kursa berhevkirin û amadekirina termînolojîya hiqûqî bi swêdî û kurmançîya jorîn ya ji bo havînê hatibû programkirin, bi dawî hat. Encama vê kursê, ango nêzî 1000 terîmên hiqûqî-ku hatine berhevkirin, weke fêrfengokeke biçûk (broşûrek) hatiye amadekirin. Ev niv berhema xebata termînolojîyê, bi alîkariya beşdarên kursê hatiye amadekirin. Ew kesên vê berhemê dixwazin, dikarin ji navnîşana jêrîn peyda bikin. *(Nişe: Ji ber ku rûpelên Berbangê têrî vê ferhengoka hêja nakin, em nikarin wê di Berbangê de belavbikin. Berbang)*

Hêvî û daxwaz ew e ku hûn li ser vê berhemê bixebitin, ji bo alîkariya pêşvebirin û dewlemendkirina vê xebatê, dîtî, pêşniyar û rexnên xwe jî bişînin

adresa jêrîn. Kesên ku bixaze dikarin beşdarî vê xebat û kursê jî bibin.

Dîsa, bi hevkarîya Xwendingeha Gel ya Bilin Biskops-Arnö, Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê ji bo vekirina beşa tercumanîya kurdî li zanîngê û xwendingehên bilind, daxwaznameyek ji Serkariya Zanîngê û Xwendingehên Bilind (UHÅ) re şandiye. Em hêvîdar in ku ev daxwaza me bête pejirandin û di zanîngê û xwendingehên bilind de jî Kurdên li Swêdê bikaribin bi zanyarî pişeya tercumanîyê bixwînin.

Soreş Zîrek

Berpirsiyarê xwendin û perwerdekirinê, yê Federasyonê.

Navnîşana xwestina ferhengokê:

Soreş Zîrek

Box: 26019, 750 26 Uppsala

Tel: 018/162188 (kar)

BIBIN ABONÊ ROJNAMA "RIYA TEZE"



Жь сала 1990-и
ношър дьабо

ОРГАНА КОММУНИСТИЧЕСКОГО ПАРТИИ И РАБОЧИХ КЛАССОВ
- ВРЕМЯ ИЛИ СПЕДИ СЪМ ЧЛЕНОВЕ. ИЗДАНИЕ НА КОМУНИСТИЧЕСКОТО ПАРТИИ И РАБОЧИХ КЛАССОВ
- РИЯ ТАБА. ОРГАН НА КВА. БЕРКОВИТО СЪВЕТА И СЪВЕТА МИНИСТРОВ АРМ. ССР

Приветствуй кому воляти, йоньин!

РИЯ ТЭЗЭ

№ 32 (4082)
ЧАРШОМ
30-с
АПРЕЛЕ
САЛА 1988

В номере 26
марта 1988
Цена 2 копейки

Г А З И Е Д
КОММУНИСТИЧЕСКАЯ
П Р Е С С А


ЩАБДАРИЙА
АМЪНАЙА БОРБЪ РАСТИЙА ЭМР

ИЛИ ТЪ ЧИТИ ЗАБОРА ЕВАНГЕЛИСТ
ГЛАВНИИ ВЪС ПОДЪБИ ЧИТИ ИЛИ ПРО ...
... ..

ЖУРНАЛИСТ
БОРЩЕ ВЪИИ ПРОФЕСИОНАЛО

... ..

Cihan sal bi sal, meh bi meh tê guherandinê û rewşeke nû werdigire. Û mestirin guherandin li Sovyetê ye. Em Kurdên Sovyetîstanê, di hêlekê de bi çavên hevvelatîyên Sovyetê li wan guherdinan dinêrin, di hêlekê da jî bi çavên kurdî. Ev 60 sal in ku rojnama me ya "Riya Teze", bûye çav, dêm û dengê Kurdên Sovyetîstanê. Di nav van salan de çawa ku di nava jiyana bineciyên Sosyetîstanê, herweha di nav xebata rojnama me de bi sebebên objektîf û sùbjektîf gelek şaşî, kêmasî hebûne.



Timûrê Xelîl weke mêvan hat Swêdê

Me pir salan jî gelek mirovan gazin bihîstine ku rojnama "Riya Teze" çawa pêwîst e ji bo gel kar nake, lema jî pir mirov naxwazin bibine abone. Ez jî bi wan re. Ev tişt rast e. Her çend rojnama me nava salên dirêj de bona gel hinek xebata hêja kiribe jî, lê xebata nekêrkatî jî çêbûye. Çima? Ji ber ku berê li bal me, li her derî "perda hesinî" hebû û me jî li ser vê perdê perdekin çêkiribû.

(kirilî tê weşandin.) Herweha me jî kovar û rojnamên Kurdan Berbang, Kurdistan Press, Armanc, Roja Nû, Bergeh, Mîrkut û h.w.d. tiştên heweskar wergirt û weşand. Me jî bo nasandina pirtûkên kurdî yên ku li Ewropayê tîrîn çapkirin, maqale û nivîsar belavkirin. Me bi weşandina nivîsarên li ser rewşa kurd û Kurdistanê, bi nûçe ji Kurdistanê, kurdên hemû komarên Sovyetîstanê bi rojnamê re girêdan. Em ê di demekê kurt de dest bi weşandina hin nivîsaran bi tîpê latînî bikin.

Perestroyka û Glasnostê firsend da me ku em xwe nû bikin. Berpirsiyarê me Titalê Efo jî nû ye. Ew di nav demeke kurt de, bi alîkariya rewşenbîr, nivîskar û rojnamevanên Kurdan xemil û rewşeke kaw û ciwan dan naveroka rojnamê. Ew bi her awayî dixwaze ku rojnama me ne tenê bi zimanê Kurdan (wekê berê), lê bibe ya kurdan û tew di ser de jî bibe bi dilê hemû Kurdan. Me dest pê kir ku rojnamê de dersên kurdî bi tîpên latînî belav bikin (Wekî tî zanîn rojnama me bi tîpên

Me riya nûkirinê daye pêşîya xwe û ber bi wê riyê dimeşin ku gelê me bi rojnama me memnûn be.

Belê, rojnama me ber bi xwenûkirinê de diçe. Em hêvîdar in ku Kurdên bîrewer wê ji me re nûçe, serpêhatî, çîrok, helbest û nivîsarên bi kurdî bişînin. Em bawer dikin ku ji vê yekê aboneyî me wê zêdetir bin. Lê perestroyka

û Glasnostê ji me re çend problem peyda kirin. Çi ne ev problem? Berê em li ser dotasiya dewletê dixebitîn. Ango, Partiya Komunîstê Ermenîstanê, hukumeta Komarê û Şewra bilind temamiya mesrefa rojnama me dida.

Îro, wek hemû kovar û Rojnamên Sovyetîstanê, divê xwe bi xwe xwedî bikin. Lema jî em bangî (gazî) gelê xwe dikin û dibêjin: Alîkariya we yê herî mezin ji bo me ew e, ku bibine aboneyê rojnama "Riya Teze". Çiqas zû abonên me zêde bin, ewqas baş e. Ji bo abonetîya rojnamê hûn dikarin herin postaxanê û daxwaza abonetîya "Riya Teze" bikin. Ji ber ku rojnama me di hemû kataloga kovar û rojnamên cihanî de bi reqema rojnamê 69124 qayitkirî ye, hûn dikarin bi riya postê û bi hêsanî bibin abone.

Daxwazek me yê din jî ev ku bi alîkariya Kurdên me, em kompitoreke ji bo tîpên latînî peydabikin. Em bangî we dikin û gîlî didin ku em ê bi naveroka rojnama xwe ya heweskar, di bin "deynê" gelê xwe de, derkevin.

Navnîşana me ev e:
USSR, Yerevan- 375023
Ûl. Ordjonîkîdzê, 2
"Riya Teze"
Tel: 0097 -8852- 529612
529694
529741


Timûrê Xelîl
Serokê beşa aborî ya "Riya Teze".

" Şoreşê bêdêng yên edebî û peresendina îdeolojîka kurdî

û

Berev rewşenbîriyeka netewî ya pêşketinxwaz "

Rastî Hirorî



Pirtûka Ehmed Qerenî bi navê "Şoreşê bêdêng yên edebî û peresendina îdeolojîka kurdî û Berev rewşenbîriyeka netewî ya pêşketinxwaz", ji aliyê Komela Nivîskarên Kurdistan, di tebaxa 1989'an de li Kurdistana Başûr hatiye weşandin.

Ev pirtûk ji 152 rûpelan pêk hatiye û bi kumanciya jorî bi tîpên erebî ye. Pirtûk herdu babetên jorîn hembêzî xwe dike.

Di babetê yekem de nivîskar torên kurdî bi ser pênc xwendingehan de dabêş dike û navê her yekî ji wan bi tevayî "Şoreşeke bêdengiyê di edebiyata kurdî de":

1-Qonaxa yekem: Xwendingeha Melayê Cizirî (1407-1480??)

2-Qonaxa duyem: Xwendingeha Xanî (1650-1706)

3-Qonaxa sêyem: Xwendingeha Hacı Qadirê Koyî (1815-1892)

4-Qonaxa çarem: Xwendingeha Goran

5-Qonaxa pêncem: Xwendingeha Cîgerxwîn

Nivîskar çaxê di navbera xwendingeha sê û çaran de, bi durustî piştî şerê cihanê yê yekem û dabêşkirina Kurdistanê, bi qonaxa "krisîzan" bi nav dike, pê re belgeyên selmandina vê çendê berçav dike. Her wusa Qerenî sexlet û sîmayên her xwendingehêkê destnîşan û şirove dike. Her weku Cizirî ansîklopediyêkê têkûz, ya dîrokî, sosyolojî, hizirkarî û bi awakî giştî bi ya rewşenbîrî dide nasîn. Xanî bi serkêşê peyda bûna

hizra netewî li qelemê dide. Pêşengiya beşdarbûna edebiyata kurdî di xebata netewî de û rêbîlî kirina peyda bûna hizra dewleteke kurdî dide Hacı Qadirê Koyî. Afirandin û ciwankariya edebî, nûkariya helbesta kurdî ji aliyê form û ruxsarî digel sîmayên romansiyet û realîsma sosyalîst û şoreşvanîyê vedigerîne bo Goranî. Bi lênerîna Qerenî qonaxa Cîgerxwînî, qonaxa dû terzên edebî ye: Yek edeba xweser û helperist û yê duyê edebê tagirê çinayetiye. Cîgerxwînî jî bi alahilhirê edeba çîna proleter li qelem dide û li derbarê xwendingeha wî de dibêje ku "ev xwendingeh pitir ji hemûyan nûnerîya hesta şoreşvanîya kurdî dike û tagir û şagird û piştevanên wê yekcar dimeşîne..." Di gêngaşeya xwe de li ser pirsra îdeolojîka kurdî, Qerenî di wê baweriyê de ye ku ew ta nuka ji van çar stûna pêk tê "netewya seretayî, proleter, burjuwaziya biçûk û dînî". Vêra diçe û dibêje ku hizra dînî û netewîya seretayî serkeftin bi dest xwe nanîne. Li dawîya vî babetî jî encamdexîya hizirkirina xwe bi vî rengî dadiçîne "... divê bizava durustkirina şexsiyeteke heja û hisyar bikin ku ev ji sexletên kevna yên dubara û ji îdeolojîka dagirkeran û zoriya dujminan û xwînrejîya çewsêneran rizgarbûyî be". Evê çendê jî dike erkê partiyeke pêşeng ku peyda bibe û hewla vakirina wê bike.

Di babetê duyem ya bi navê "Berev rewşenbîriyeka netewî ya pêşketinxwaz" de, Qerenî qala rewşa xebata

polîtîk û bizava rewşenbîrî û erk û karê her yek ji wan di gel peywendî û tesîrên wan ên hevguhêr dike. Pêşdebirina tevgera bîr û hizirkirî girêdide bi gelek prosesên giring mîna rexnekariyê, serbestiya derbirîna bîr û rayan û mumkûnbûna hevbendiyan di navbera nivîsevanî û xelkî de û her wusa bi raya nivîskarî, ev hevbendiya bixwe dibin jêderekî pir giring bo demokrasîyê.

Qerenî vî babetê dawîyê mîna projekî bo awayê durustiyê hizirkirî û şarandina tevgera rewşenbîrî nîşanî me dide û hinek erkan jî têxe pêş çavan. Mîna:

- Nivîsandina dîroka Kurdan û ronkirina noqtên guman li ser
- Vejandina kelepuoê netewayetî
- Giringîya wergerandinê
- Pûtedan bi edebê zarokan
- Pûtêpêdan bi rolê jinan

Nivîskar di vê pirtûka xwe de hewl daye dergehî li pirsra îdeolojîka neteweya kurdî û erkê rewşenbîrî, nexasim di avakirina îdiolojîyan de vebike. Her wusa di warê rewşenbîriyê de çî giring e bête kirin bo vehandina canê îdeolojîyêkê pênasname mirovê Kurd biparêze û bibe bingeha rigarbûna wî.

Ev karê Qerenî hewildaneke pîroz e bo bêtir pêdaçûn û vekolînê li ser rewşenbîriyê û rola wê ya giring di peyda kirina îdeolojîyêkê kurdî ya dilxwaz û bikêrhatî bo miletê me di van rewş û kawdanên doza me tê de diçe. ●

ÇIROK

SMIRNOFF

Hesenê Metê

Gelto î xwediyê malê bi rûkenî didomîne û dibê:

- Wek ku min got, Xusrew... ku biqewume, ez ji deh jinên lepdarî jî jîrtir im. De êdî tu û bextê xwe... de fermo!

Xusrewê ku bi mêvandarî hatiye mala hevalê xwe, bi dilxweşî li xwarinên ser masê dinêre, destên xwe di hev re dide, bi devekî avî li Gelto vedigerîne:

- Bi Xwedê, tu jî ne hindik î! Ca lê binêre... wey, weywey!.. dibêje û hinekî din jî xwe ber bi masa xwarinê dike.

Ji bo Xusrew, bi rastî jî tiştêkî seyr e. Lewra masên wusa, pîrî caran di çirokan de bi xwarinên weha têne xemilandin. Ji xwarinên goştî sê babet, ji şorbên sivik du babet, birincek hebhe-bî û bi mewûjên sor, selete û hêşînayî bi awayekî wusa li ber hev hatine danîn ku ji bo hunermendekî herî mezin jî ne asan e ku ji bo pêjnên xwe tiştêkî weha bifikire. Du sê xwarinên din jî hene ku ew nizane wan bi çi binavîne. Ji bilî van jî, ji çend babetan selikek tije fêkî li hêleke din î masê, li bendî hevalbendan e. Lê tiştê ku bêtir bala Xusrew dikêşîne ev e, hevalê wî dest bi vexwarina meyê jî kiriye. Meyên giran! Şûşekê vodka bi du piyalên vala li hêleke masê ye.

Piştî ku Xusrew bi rewşek matmayî çavên xwe li ser hemî tiştên ser masê digerîne, ne bi devê xwe lê di dilê xwe de weha dibêje: «Xwedê dizane, Gelto bi her awayî hatiye guhertin. Ango ne Geltoyê heşt sal berê ye.» Û bi vê guhertina hevalê xwe jî gelekî kêfxweş dibe.

Gelto têdigêhîje ku hevalê wî ev rewşa ha ne dipa. Ji bo ku tiştêkî nebaş neyête ser hişê hevalê wî, zûzûka vedigere ser û dibê:

- Binêre Xusrew, em ê îro li kêfa xwe binêrin... bixwin, vexwun û ku te bivê... em hertiştî jî bîra bikin û jî ji yanê xwe ya mayî, em rojekê jî ji bo xweşiya dilê xwe bibuhurînin. Ya sitar, ma kevîrê bibare! Bi vê hevdişîna me ez ewqas kêfxweş im ku, Xwedêyo!..

Xusrew di vî kevnehevalê xwe de guhertinekê dibîne, lê bi çiqasî û bi çî awayî ye, nizane. Lewra berê, ji bilî

çend hişkepeyvên polîtîk tiştêkî ji devê wî hevalê wî dernediket. Û anuha jî li ser vê masa pîrozwer çêlî jiyane, çêlî kêfxweşiya dilan dike. Lê dîsa jî Xusrew xwe pêve bernade, zêde jî dirêj nake û bi kurtebirî dibêje:

- Ma çi pêwîst dikir ku tu ewqas wexta xwe... serê xwe bêşîmî. Me ê bi hev re tiştêkî sivik...

Gelto destê xwe li ba dike, peyva wî dibire û dibê:

- De lê binêre, ha! Wext!.. ma ev jî kîjan wextê de ye ku me hevdu ne dîtiye, malava! Heşt sal kuro, heşt sal! Ne bi gotinan e, ezbenî!.. Bi Xwedê heta mehekê jî ez te bernadim û hew!..

Herdu hevalbend li ber masa xwarinê rûniştine, giran giran dixwin û hêdî hêdî jî dipeyivin. Mijarên galegalên wan jî demên buhurî dest pê dike. Di navbera hevdişîna meriv de çiqas wext derbas bibe, meriv jî ewqas dixwaze li wan kevnerojên buhurî vegere. Loma ev herdu hevalbendên kevn jî bi galegalên xwe diçin demên xwe yê buhurî û li wir dijîn.

Li ser rojên buhurî, li ser pêwendiyên rojên kevn, li ser heşasiyên berê tê peyivîn û dûre peyv tê li ser polîtîkaya rojên kevn disekine. Di vê navberê de mîna ku tiştêkî keti be bîra Xusrew, vedigere ser Gelto û dibê:

- Ero, min bihîst ku... Xwedêyo, ev çî rewşa me ye! Em hemî derbeder bûne! Min bihîst ku Mervano jî li van derîna ye. Ma tu tew wî nabînî, çawa ye?..

Bi bihîştina navê Mervano, mîna ku Gelto hinekî venicîqe, li şûşa vodka yê dinêre û dûre bersiva hevalê xwe dide:

- Na... Berê, me heroj hevdu didît. Em di dersxanekê de li kêleka hev rûdiniştin. Lê dûre dilê me jî hev ma û min xwe jê dûrxist.

Mîna ku Xusrew jî pîrsa xwe poşman bû be, hinekî jî xemgîn dibe û dibê:

- Heyf e bi rastî. Çima?.. Mervano xortekî baş bû.

Gelto bi enirîn û bi hêrsbûyîneke şêrîn dibêje:

- De başbûna wî serê wî bixwe, lo! Meriv weke wî xwe ewqasî jî wenda nake! Başbûna çî?.. De tu guhdar bike

ez ji te re kat bikim: Ez û wî, em bi hev re di dersxaneke zimanê swêdî de bûn. Di dersxanê de, ji çend welatan biyanî hebûn. Ji wan yek jî keçeke polonî bû. Ku te li keçikê binêriya, te ê bigota ev keçika ha, rasterast ji kerxanê reviyaye. Nexweş! Heroj bi mistek boyax dihat dersxanê. Dema ku mamoste dixwest em herkes bi kurtî li ser welatê xwe bipeyivin, ew jî radibû, ji bo pîskirina sîstema sosyalîst çî dihate ber devê wê digot. Digot:

«- Goşt tune, kinc tune, sol tune, tişt tune... tiştên ku hene jî bi deşt merivan nakevin...»

Ez hêrs bûm, di ciyê xwe de ricifim û min kir ku di dersxanê de biqûrim û bibêjim, «Tu ruyê xwe reş dikî, ku tunebûneke weha li welatê bavê te daketi be, de ka bibêje tu bi kuvarkên kîjan guherê mezin bûye, dêlik! Rast e, perê boyaxa dev û lêvên te ji te birîne. Lê ew pere, wek alîkarî ji hogirên Hebeşistanê re hatiye şandin, tégêhîştî!» lê zimanê min têr ne kir ku ez van gotinên dilê xwe jê re bibêjim. Hemî kesên di dersxanê de jî wek berxikan guhdariya wê dikirin. Tenê ez rabûm û min jê re got:

«- Tu derewan dikî.»

A, wê çaxê tev hemî xwendekarên dersxanê, Mervanoyê me jî rabû piştgiriya keçikê kir û ji min re got:

«- Tu neheqiyar li keçikê dikî. Te ew welata tenê bihistiye, lê keçik li wir jiyaye û li wir mezin bûye. Ew, ji te baştir bi welatê xwe dizane!»

Ez vegeyiam ser û min jê re got:

«- Mervan, çiyê te û wê anti-komînîstê bi hev dikeve, bavê min?!.. Ma ji bo te ne şerm e ku tu xwe dikî rewşa parêzgerêkî wê? Te bi salan ji bo sistemeke wusa şer kiriye. Ku rewşa mayîna li welêt dest bida, te ê ji mîna min... heta ku çavên te di kortikên xwe de biçûya xwarê, simbêl û porê te mişt tayên sipî bibûya, xelekên reş xwe bera binê çavên te bida û ruyê te biqermiçiya... te ê şer bikira. Erê, ez wek navê xwe jî dizanim ku te ê şer bikira! Lê çawa tu anuha radibî derewên keçeke beradayî rast dipeyitîni, ez ténagêhîjim!?...»

Lê Mervano wek feylesofekî serhişk

li min vegevand û got:

«- Çişer, çî dagêr, çî rêdar û çî sîstem dibe bila bibe, divê ji bo jiyanêke xweş be: jiyanêke bi goşt, jiyanêke bi kinc û jiyanêke bi sol be...»

Min baş bala xwe dayê ku ew rasterast wan gotinên keçika beradayî li min vedigerîne. Wê çaxê jî bi hêrs vegeyiam ser û min gotê:

«- Serê te û feylesofiya te bixwe!»

Dûre bi enirîn rabûm ser xwe, ber bi dêrî çûm, derketim der, min derî hişka li pey xwe girt û careke din jî li wê dersxanê venegeriyam. Ez bawer im hemî kesên di wê dersxanê de jî tégêhîştin ku ez çiqasî hêrs bû bûm... A, ji wê rojê û vir de jî ez û wî, em êdî hevdu nabînin.

Piştî wê çîroka xwe û Mervano, Gelto vedigere ser Xusrew û dibêje:

- De ka tu bibêje, ezbenî. Ma ne tişteki seyr e ku yekî nola min û Mervano rabe, piştgiriya keçeke weha bike?.. Keçeke ku ji welatê xwe î sosyalîst reviya be!.. Bi şerefa min û te, şîrê wê heram e!.. Ma ne şîrheram be, ji sistemeke sosyalîst direve? Ma ew bi xwe jî nabîne ku tevayiya gelên dunyayê ji bo sistemeke wusa xwîna xwe dirêjînin!

Mîna ku Gelto bi wê hevoka xwe ya dawîn re hinekî jî hêrs bû be, destê xwe davêje qirpika şûşa vodka, piyalan dadigirê û dibê:

- Lê serê xwe bixwe, dev jê ber de em îşev çêlî politikayê nekin... em ji xwe re vexwun.

Herdu piyalên dagirtî bi du peyvikên noş li hev dikevin û ber bi ciyên pêwîst xwar dibin. Piştî qultekê, Xusrew piyalaxwe dadixe, bi mitûmatî li hevalê xwe dinêre û dibîne ku wî çawa çavên xwe girtine û heta dilopa dawîn jî piyalê di devê xwe de diguşişîne. Dûre Gelto bi oxîneke dirêj re diranên xwe bi hev de dişidîne, du sê caran çavên xwe dikuskusîne û piyalaxwe li ber Xusrew dibîne. Dixwaze bi matmayî li hevalê xwe binêre û herweha du awurên matmayî li hev dikevin. Gelto bi pilepil serê xwe dixwe ber xwe û dibê:

- Ev çî ye, ezbenî?.. ma meriv weke te vedixwe?

Xusrew hîn bi wê matmayîna xwe ye û dibê:

- Bi navê Xwedê, heta roja îroyîn jî min ne dîtiye ku kesek weke te wê vodka weha hişk vedixwe. Malava!.. Ma ev vodka ye, malava, vodka! Bi kêmanî te pepsi-cola û cemed jî li nav bixista, dîsa dibû. Lê...

Gelto:

- Lê... Pepsî-cola şerbeta emperyalîstan e... Ez difikirim ku em ê îşev dev ji politikayê berdînin... em ê ji xwe re vexwun, dibêje, dîsa destê xwe dirêjî şûşe dike, piyalaxwe ya vala dadigirê û didomîne: Lê mîna ku tu jî dibînî, herçiqas meriv nexwazin jî destê merivan ji politikayê nabe... Em bi aveke politikî hatine avdan. Binêre Xusrew, ne ku ez bi van gotinên xwe pesnê Sovyetê... pesnê sistemê didim. Lê bi rastî jî mêrikan pir xweş çêkirine. Wusa xweş çêkirine ku pêwîstiya dilopeke şerbeta emperyalîstan jî nake ku meriv li nav bixîne. Ez hertim ji wê vodka vedixwum. Bawer bikî... carina ez du şûşan jî didim ber hev û vedixwum. Vexwarina wê vodka pir xweş e. Tew merivan nayêşîne, wek şîrekî nûdotî di gewriya meriv de xwe bera jêr dide û di dest de merivan sermest dike...

Piştî ku Gelto wê piyalaxwe şîrê nûdotî jî di gewriya xwe de bera jêr dide, pê xwe sermest dike, destekî xwe ber bi xwarinekê dirêj dike, li gotinên xwe yê jorîn zêde dike û dibêje:

- A, ev jî yek ji wan seletên wan î populertir e. Wek ku tu jî dibînî: kartol û hêkên xaşandî, goştê beraz û mirîşkan, pîvaz û gizêr, û baqilên xatûnî li nav hev dikeve... û ev xwarina pîrozwer jê derdikeve. Ev hemî nexşên ha jî hevalekî min ji min re gotî bû. Li Moskwayê dixwîne. Digot, meriv qeymax jî li nav dixîne. Bi ûrisî jî navekî lê dikir, Xwedêyo! Çî navekî xweş e! Salat Stolîçnîy(*).

Heta ku şûşe vala dibe, Xusrew jî hêdî hêdî dixwe, vedixwe û her guhdariya hevalê xwe dike. Lê her ku Gelto vedixwe, serî lê germ û ziman lê dirêjtir dibe. Li ser hertiştî dipeyive. Di dawiyê re jî dema li ser çem û çîyan dipeyive,

pesnê hinek tiştan dide û weha dibêje:
- Zozanên Ûral ji zozanên Rocky Mountains'ê hêniktir û hêşintir e... ava çemê Volgay'ê ji ava Mîssîssîppiyê zelaltir û xweştir e..

Bêyî daxwaza xwe, Xusrew li vir peyva hevalê xwe dibire û ji nişka ve:

- Tu çawa dizanî?..

- Çi çawa dizanim?

Mîna ku Xusrew ji pirsra xwe poşmam bû be, hinekî nermtir dibêje:

- Ango tu çawa dizanî... hêniktir û hêşintir e, an jî zelaltir û xweştir e? Na xwe tu heta wan deran jî çûyî?

Nola ku Gelto bixwaze tişteki pêşan bide, destê xwe radike û dibê:

- Na. Ev hemî tiştên ha min di pirtûkekê de xwendî bû, min di nexşeyekê de dîtî bû... Ne tenê min di nexşeyekê de jî dîtî bû. Herweha min ji hinekan jî bihîstî bû... Ji hinek devên ewle...

Xusrew bi pişirîneke heyfîn li hevalê xwe vedigerîne û dibê:

- Binêre kekê Gelto. Bi rastî jî pir kêfa min ji te re tê. Bi taybetî jî guherîninê ku di te de bûne. Lê çiqas heyf e ku... zimanê min nagere ku ez van gotinan ji te re bibêjim. Lê ku tu li min negirêyî, wê çaxê ez ê bibêjim hinekî jî serê xwe biguherîne. Binêre, tu çêlî hinek tiştan dikî û tu bi xwe jî dibêjî; min bihîstine an jî di nexşe û pirtûkekê de xwendine...

Gelto berê xwe dide hevalê xwe û dibê:

- Xusrew, çavê min! Ez jî ji te hez dikim... weke birayekî xwe î piçûk ji te hez dikim. Lê ez jî hertiştên sistemê jî hez didikim. Tu viya jî bide xatirê ruhê min î sosyalîst. Û ya din, ma ne xweştir e? Bi serê min û te bajarên wan, merivên wan, navên wan... bi kurtî hertiştên wan xweştir e, Xusrew! Hertiştên wan!..

Bi van gotinên xwe re Gelto destê xwe davêje şûşa vala, radike, lê dinêre, dûre hinekî jî bi serxweşî bi masê de dide û dibêje:

- Vodka wan jî xweş e.

Xusrew serê xwe dike ber xwe, di dilê xwe de, «Na!.. serê Gelto ji berê jî kevntir e. Di warê xwarin û vexwarinê

de gavek havêtiye, lê ew gava xwe jî berwar havêtiye.» dibêje, dûre bi çavekî bêhêvî û xemsarî li hevalê xwe dinêre û bi pişirîn dibêje:

- Ez dibêm qeyê tu hîna çîroka vê vodkayê jî nizanî.

Gelto bi serekî germ û çavekî matmayî:

- Çawa, çîroka vodkayê? dibêje.

- Ango li kuderê, çawa derketiye... dûre çî bi serê wî navî de hatiye...

Gelto bi ken herdu destên xwe ber bi şûşa vodkayê dirêj dike, peyvên Xusrew dibire û dibê:

- Çawa nizamim, ezbenî! Smîrnoff e. Navekî xurû sovyetî ye.

- Rast e, navekî ûrisî ye. Lê bi taybetî li Amerîkayê weke patent cî girtiye û li gend welatên din jî derdikeve.

Gelto bi enirîn di bin çavan re li Xusrew dinêre, hinekî jî bi hêrs dibêje:

- Ez nizamim tu tinazên xwe dikî, an te dil heye ku tu jî min hêrs bikî. Smîrnoff çima li Amerîkayê derdikeve, ez ténagêhîjim!

Xusrew radihêje şûşa vala, mîna ku bi tiliyên xwe tiştên li ser şûşê pêşanî hevalê xwe bide û dibê:

- Binêre, ezbenî, di dema Çar Aleksandr III. de merivekî bi navê Pierre Smîrnoff heye, siparişa hemî mey û vexwarinên welêt û bi taybetî jî ya derûdora qesrê ew dike. Bi hinek rê û formulên xwe yên nû, Pierre Smîrnoff li dor sala 1818'an vê vodkayê çêdike. Lê bi hatina şoreşa oktoberê re, ji bilî kurê wî yê bi navê Vladîmîr, tev fabrika wî serê hemî kesên malbata wî jî wenda dibe. Vladîmîr, tev formula vodka bavê xwe, di ser Polonyayê re direve Fransayê û ji wir jî diçe Amerîkayê. Li wir, bi alîkariya tacirên dewlemend fabrikekê tê damezrandin û vê vodkayê dişa çêdikin... Bi gotineke din, weke wê şîherama polonî, xwediyê vê vodkayê jî ji welatê xwe î sosyalîst direve.

Gelto bi rewşek matmayî li hevalê xwe dinêre û bêdeng guhdariya wî dike. Wek sofîyekî ku destê wî bi destê xirabjînekê bû be û destmêja wî hati be şikandin, di ciyê xwe de sipûsar dibe û ditengije.

ROUND

Ehmed Huseynî

Oda me...
ku di bayê wê de
welat,
û çavên bendemanê
xwê dabûn!!

Kenê te...
ku bi dizî,
êşa serê "Xabûr"
xwîna serê şûr
tê dabûn!!

Zingilê dergeh...
ku xwe spartibû
pencên tirsê!!

Û dilê te...
-wê havîne
ku di esmanê stnga min de
bartiya...
û çirîya
bi seqema pirsê!!

17.7.1990

Ew hemû mijarên ku dûre di navbera herdu hevalbendan de dibe û didome, Gelto zêde beşdarî wan nabe. Her li şûşa vala dinêre û difikire. Ji nişka ve dilê wî li hev dikeve û verşiya wî tê. Dema bi destûra havalê xwe jî ber masê radibe û ber bi destşokê diçe, di ber xwe de dike pilepil û dibê:

- Ez bawer im, min îşev pir vexwar.

Nîse:

(*) Salat Stolîçnyî: Seleta Paytextê.

Kurdî vane ki:

HEME PARTIYÊ KURDAN JEW BÊ Û NÊ FERSENDÎ MEREMNÊ!

Îraqî, Kuweyt îşgal û talan kerd tepiya, weziyetê Rojhelato Miyanîni xirabêrî bî. Bi se hezarana êsker û silehî bigemî û teyarana anciya mintiqa. Kîştê ra Îraq û çend dewlet û grûbê Ereban, kîştê bîni ra Emerîka, dostê ci koma mîletan xo herbî rê hadre kenê. Îraq û Emerîkaya wazenê silehanê xo-yê "modernan" şardê mintiqa ser o biceribnê.

Bi na meselaya alaqebiyayîşê hemî dinyay helbet bîleheq niyo. Çimkî esas mesela, mesela petrolî ya. Di dinyado ewroyên di zî petrol kewto heyatdê (jiyandê) her merdimî. Weşa ya zî xirabbiyayîşê heyatdê merdîman ser o, tesîrê vayey, ya zî ercaneyda petrolî zaf o. Dewletanê zengînan ekonomiyê xo sayedê petrolî ya visto lingan ser. Ki petrol nêbo, fabriqayê înan ze ayreyê ki ser ra awî bibirneyo, çiyê rê nêbenê. Petrol zî bolkî Rojhelato Miyayîn di vijeno. Qandê coy na mintiqa her tim balê dinyay ancena.

Nê hedîseyê dimayênî Kurdan zî alaqa kenê. Çimkî, dewletê ki Kurdistan îşgal kerdê bi awayêdo aktif a di na mesela miyan dir ê.

Hele Îraq, o yo serreyê govendî anceno û dinyay rê meydan wazeno. Tirkîya kîşt ra wazena xeyalanê xo yê Mûsil û Kerkûkî biyaro ca, kîştê bîni ra zî wazena êsker Sûdî û dewletandê bînan ra çend qurîşî bigiro ki ekono-

miyê xo raşt kero.

Qezenc kerdîş, ya zî vîni kerdîşê dewletan do tesîrêdo zaf gird o do herb bivijîyo. Ki herb bivijîyo do Kurdistan meydanê herbî bo. Ki Kurdistan meydanê herbî bo, şarê ma do lingan ver di şiro. Hetta zey Helepçe, seranserê Kurdistanî şeno bîro zehîr(jar) kerdîş.

Ewro, melsela 25 milyonan Kurdan û Kurdistanî zaf aktuel biya. Labirê Kurdî meydan di çiniyê. Ma vajê partî, grûb û cepheyê Kurdan, ê sekenê? Heta ewro, ne piya ne tenya vengêndê înano gurr nêvijiyayo. Vîni aseno ki do noqor zî neşê nê îmtîhanî bîni ra bivijîyê...

"Weziyeto ewroyên, ê Rojhelato Miyanîni di ganî (gerek) Kurdî se kerê? Min na persî, Kurdand çîhar heme perçandê Kurdistanî, Kurdandê Lubnanî û Kurdêdo Sowyetistanî ra kerd. Cewabê ki înan day min, ma yê çap kenê. Nê cewaban di nixteyê mustereki, watişê kewtişdê Seddamî, cephe viraştîşê Kurdan, tarîxdê xo ra ders gortîş, û no fersend ra îstîfade kerdîşê Kurdan ê.

Ez hêvî kena heme partî, cephey û grûbê Kurdan, ê siyasî tayn zî goşanê xo bidê veng û rayandê Kurdan.

H. Diljen

Zagros (28 serre, karker, Kurdistan-dê Sûriya ra):

Ki Saddam bikewo kurdî do zaf bi quwet bibê.

Nika ke Kurdanrê ardim nêkeno. Ganî organîzasyonê kurdan. Piya bixebitiyê. Kamcî dewlet ardimê Kurdan bikero baş o. Ki Sowyet, Emerîka û dewletê bîni ardim bikerê Kurdî dewleta xo ronê û na dewletê resmî qebûl bikerê Kurdî do xurtî bê û Îraq do zaf zehif bo. Bi kilmeyay a, ki Saddam bikewo Kurdî do zaf quwetêrî bê.

Bavê Azad (35 serre, karker, Kurdê Lubnanî):

Bê piyakerdîşî ma nêşenê bireyê

Mintiqa di çend ki xirabey bibo, çend ki intîqa pê miyan kewo, çend ki xirabey bi Seddamîya bibo do Kurdan rê hendi baş bo. Û fina zî, çendi ki Kurdî ver a pê jewbînan şîrê, piya bikerê, xo miyan di cephey virazê, do Kurdan rê hendi baş. Ez bawer nêkena ki ma Kurdî bê piya yewbiyayîşî û cepana bişê xo bireynê. Cepheyê Kurdi-

standê Îraqî îmkânêdo zaf rind o, ki ez bêra lejdê Îraqî û Kuweytî ser, go-reyê fikirdê min a, do nezdî ra çiyê bibo. Bokarê ullah şimadi bo...

Bavê Nesrîn (33 serre, telebe, Kurdî-standê Tirkîya ra, labirê Lubnanî di biyo gird, nika zî Swêd dir o):

Dişmenê Kurdan teniya Seddam niyo

Nê wezyetê bahdoyênî, fersendên do zaf girt. Visto Kurdan dest. Çimkî, heme dinya nika wazeno Seddamîra bireyo. Gerek ma kurdî zî nê fersendê

girdî qandê xo rind bikar biyarê. Ti do vajê seni? Ki ez ba, gerek heme partî, grûbî û Kurdê bînî xilafetanê xo yê siyasî pey di verdê, piya berê wery û xo jew kerê. Ki do kamci dewleta îtifaq bikerê, gerek nê itifaqê xo bi protokola saglem bikerê. Çimkî gerek ma qet xo vîra nêkerê ki, dişmenê Kurdan Seddam teniya niyo. Ê ki ameyê Seddamî ri zî heta ewro Kurdan rê dosteyênda samimî nişan nêdayê.



Gulistan (30 serrê, dengbêj, Kurdîstandê Tirkîya-Sewregî-ra)

Gerek Kurdî, bi çimdê menfetêde xo ya bewniyê meselandê mintiqa û dinyay ra

Ki ez ba, gerek Kurdî, Rojhelato Miyanîn di goreyêmenfetêde xo hereket bikerê. Ê bi no çima bewniyê meselandê mintiqa û dinyay ra. Çimkî heta ewro, ma Kurdan zaf çî qandê menfetêde şari kerdê û kê ki dest esto ma zî qandê menfetêde xo esto. Semedê perîşaney û riswa biyayîşde şardê ma zî pêro ney ra yo.

Ewro fersendêdo zaf muhîm kewto Kurdan dest. Heme dinya Seddamî rê werişt. Kurdî, gerek nê fersendî qandê menfetêde welatêde xo bi kar biyarê. Kam ki qarşidê Seddamî ya yo gerek Kurdî ardimê înan bikero. Labelê no ardim gerek bi tayin prensîbana bo. Nê prensîbî zî, menfatê şar û welatê ma bê.

Qandê çî zî, gerek verî verî Kurdî xo miyan di roşê, qisa xo jew kerê, pê ra

bawer bikerê.

Lej çiyêdo baş niyo. Gerek heme merdimêy lejî ver bivijiy. Gerek kes ardimê qerarandê Komda Milatan zî bikero. Ze ki min cor di zî va, gerek ma goreyê menfetêde mileti û welatêde xo ya bewniyê meselan ra. Ewro menfetê welat û mileta mazî di kewtişde Seddamî dir o.

Husên Seîdî (41 serrê, muşawirê maciran, Kurdîstandê Îranî-ra)

Wezyeto ewroyîn qandê kurdan zaf baş o

Wezyetê ewroy, qandê Kurdan zaf baş o, Hele qandê Kurdîstandê Iraqî fersendêdo zaf muhîm vijyayo orte. Çimkî wezyetê Kurdîstandê Iraqî zaf bibî xirab. Kurdê Iraqî bix, nêşenê tayan mudaxelanê acil bikerê û xo no wezyet ra bireynê. Nika no fersend eynan destî esto. Mesela, dişmen nika nêşeno quwetê xo hemî biroşo Kurdistanî ser. Çi ki ci rê belayêdo girt abiyayo. Heta nika rejimê Seddamî ser o Kurdan se vatê kesî goş nêneyê ma ya. Labirê ewro fersendê kewto ma dest, gerek ma heme Kurdî bi propoxandayêdo xurt a, dinyay îkna bikerê ki ma senî heqlî bî.

Gerek Kurdî heme, bê îtilafandê siyasîyana qisanê xo jew kerê û piya dekewê hereketêdo muşterek. Ki wexto Îraq bêro parakerdiş, bişê Emerîka û dewletanê bînan îkna bikerê ki ê zî Kurdîstandê serbix qebûl bikerê.

Ahmed (35 serrê, telebe, Kurdîstandê Iraqî-ra)

Ganî Kurdî bi heyecana hereket nêkerê

Kurdî gerek dişmendê xo di lejê xo tim bikerê. Gerek lejê Kurdan sist nêbo. Labelê, ganî mileta Kurd û partiye ci yê siyasî hayê xo bê, ki fina nêkewê adirdê dişmenî miyan. Çimkî Seddam winî merdimêno ki qet belî nêbeno o do sekero. Ki her kes ey ver ra werzo, o do bix dekewo adirdê xo miyan. Gerek mileta Kurdî bi heyecana here-

ket nêkero. Ganî Kurdî bolki bi hesab û kitab bê, bi sîyasetkî û dîplomatkî hereket bikerê ki zey her finan na fina zî ma kokê viyedê xo nêwirênê. Emerîqa Seddamî vero werişt. No nişan dano ki Seddam kewto belayêdo girdî miyan. Ê o do belayê xo bivîno.

Simko (34 serrê, muzîsîyen, Kurdîstandê Tirkîya-Diyarbakir-ra)

Ganî Kurdî hesabê xo baş bikerê

Hukmî ser ra kewtişê Seddamî, do Kurdan rê zaf çiyêdo baş û pîroz bo. Qandê coy gerek Kurdî zî lejdê vîstîşde Seddamî di cayê xo bigirê. Labelê gerek hesabanê xo baş bikerê ki mesela ra bi qezen a bivijiyê. Dinya menfatî ser o yo. Gerek Kurdî zî menfatê xo biparêzê. Gerek ma zî Seddamî ro dê. Labelê ma xo nêdê vernî û xo qurbanê şardê bînî nêkerê. Kewtişê Seddamî dima, do mintiqa di dewrêdo newe destpabikero. Reyaperesteya Ereban, mesela petrolî do zaf aktuel bo. Gerek ma Kurdî hesabê xo baş bikerê û nê heme çiyar rê hadre bê.

Husên Kurdîjad (35 serrê, telebe, Kurdîstandê Îranî-Wurmiya-ra)

Ma Kurdî gerek karê miyandê xo bikerê û hadrê bê

No lej, lejê (herb) Kurdan niyo. Gerek Kurdî qîsta kesî nêgirê. Gerek bolki karûbarê Kurdan piya viraştîş cepheyêdo heray ser o bo. Kurdî gerek bi cepheyêdo winaya hadre bê, ki fersendê vijya îna ver wexto bişê ci ra feyde bivîne. Yanê bişê lej o ki esto qandê xo bi kar biyarê. Ma Kurdî gerek karê miyandê xo bikerê, hedre bê.

Mistefa (35 serrê, karker, Kurdîstandê Tirkîya-re)

Ez wazena Îraq di sî siyêri sero nêmano

Bi raştêya, ez wazena herb bivijiy. Wexto ki qetliamê Helepça yeno min vîrî, ez vana Îraq di sî siyêri ser o nêmano.



Sabiha (35 serrê, mahlîm, Kurdîstana Tirkîya -Elezîz- ra)

Bê cepheyêdo xomiyani Kurdî nêşenê giraneya xo ronê

Gerek Saddam bi tewirdê rejimêdê xo ya bîro vîstîş. Tirkîya wazena Saddam bikewa, labelê nêwazena rejimê partîda Baasî bikewo. Tirkîya vana "ki rejimê BAASÎ bikewo, do Kurdî bi quwet bê û ortaxê hukatêdê Îraqî bê. Wezyetêdo wina şeno sereyê ma zaf bitewno". Qandê coy ser a şiyayîşê Saddamî rê e; labelê şiyayîşê baasî rê "ne". Kes nê niyet û waştêkandê Tirkîya ra zî fam keno ki Kurdan rê çiyê hergî baş, vîstîşê Saddamî û rejimêdê Baasî yo. No jew.

Ê didinê; gerek heme organîsazyonandê Kurdan ra cepheyêdo hera û gird viraziyo. Ki cepheyêdo winasîn nêviraziyo Kurdî nêşenê giraneya xo ronê û şerdan ra îstîfade bikerê.

Ê hîrîni; di weziyêdo ewroyêndi gerek Kurdî heta (kişta) Emerîka û welatandê bînan nêgirê. Gerek ma tarîxêdê xo ra dersî bigêrê. Heta nika kê ki sozê ardim kerdîşê Kurdan dayo se, bi ca niyardo. Hemîni qandê menfetdê xo, xo nezdiyê Kurdan kerdo, wexto ki karê înan qediyayo, Kurdî paştî ser veradayê û şiyê. Ki Kurdî bi xo jew nêbê kes nêşeno ma rê havilê bikero.

Timûrê Xelîfî (40 serrê, Jûrnalîstê "Riya Teze", Sovyet-Erîwan-ra)

Gerek rejimê Seddamî orte ra werzo

Bi ê min bo, gerek Kurdî tewirdê nê lejî nêbê. Çirê? Çimkî no lejê ma niyo. Yanê lejê milletê Kurdî niyo. No lejê dewletan o. Ki lejê ma biyayê, Kurdê Sovyeti zî miyan di, gerek ma pêro piya biyayê. No jew.

Ê didinê, ez qayil niya ki na mesela bi herb a safî bo. Çimkî lej do erdê Kurdîstanî ser o bibo. Do Kurdîstandê Îraqî di zî, ê Tirkîya di zî û cayandê bînan di zî. Labelê, çiyê est o. No lej di kam sûcdar o, kam ki guhakar o, gerek cezayê xo bivîno. Kam gunakar o? Seddam û çorşmeyê ci gunakerê. Gerek ê bi fizîkî orte ra berê hewadatiş. Ma vajê Seddamî eşto Kuweytî ser. No sûcê şardê Îraqî niyo, sûcê Seddam û rejimêdê ci yo. No rejim gerek bîro weşanayîş. Çimkî rejimêdo faşîst o. Milletê ma rewnayo ki no çi zanayê, labelê dinya hewna newe peyhesiyayo... Qandê coy ne ki welatê bêro wêrankerdiş, gerek no rejim orte ra werzo.

Kiştêra baş o ki na mesela bi lej a bîro hal kerdîş. Çimkî ki rayna çinêbo, do piro dê. Ki redê Kurdîstanî herbî ver nêkewtê, no lejê ma niyo, gerek Kurdî miyan nêkewê.

Ahmedê Mihoy (36 serrê, Kurdîstandê Tirkîya ra)

Vinderê wa Seddam banco

Seddamî heta nika belayê zaf girdî ardî Kurdan sere. Nika zî balayo girt ameyê ey sere di. Vinderê wa banco. Wa sereyê ci şiro da ci ra.

Xidir (42 serrê, teknîker, Kurdîstandê Tirkîya -Dêrsim- ra)

Ganî Kurdî mabêndê Seddamî û Emerîqa di teref nêbê

Gerek Kurdî, bi quwetandê demokratîkî ê bînan piya îşkaldê emperyalîzmî ver o vinderê. Gerek qarşidê

şowenîzmdê Baasî û dîktatoreyda Seddamî ver bivijiyê û rejimê Seddamî weşanê. Yanê gerek Kurdî mabêndê Seddamî û Emerîka di teref nêbê. Cayê Kurdan gerek safandê quwetandê demokratîkan bo.

Selim Keya (41 serrê, aboqat, polîtîker, Kurdîstandê Tirkîya ra)

Kewtişê Seddamî Kurdan rê çiyêdo qutsal o.

Zilm kotî di û bi kêya bibo wa bibo ez tim ver vijiyêna. Îraqî bi zor a Kuweyt îşkal kerd. Gerek ma ne jewrî qebûl nêkerê û ver bivijiyê, meştî ma nêşenê dinya-aalemî rê vajê zilmdê ê dewletanê ki Kurdistan îşkal kerdo ver o bivijiyê.

Kiştê bîni ra zî, Îraq dîrek Kurdan alaqe keno. No rewnayo ki lejê Kurdanî ki bi Seddamî ya yo domeno. Weşanayîşê Seddamî gerek her Kurdî rê armancêdo zaf qutsal bo. Kurdan miyan ra kes nêşeno na armanci ra fek verado.

Winî aseno ki, şertandê ewroy di bes bi Kurdana weşanayîşê Seddamî winî rihata niyo. Bi qerardê Komda Milatana Ewrûpayî ameyê mintîqa û wazenê Îraqî Kuweyt ra mecbûrê peydi antişî bike-rê. Goreyê fikirdê min nê qerarî, qandê ajbiyayîşî û qandê orte ra werznayîşêdê neheqey baş ê. Bi ablûka û ambargoya vîstîşê rejimê Seddamî qandê Kurdan hewna baş o. Kurdî gerek nê şertan di polîtîkayên da xo ser taqîb bikerê.

Mihemed Qasim (38 serrê, karker, Kurdîstandê Îraqî (Silêmanî) ra)

Seddamî rê paştî vijyayîş Kurdan rê xiyaret o

Ki ez ba, gerek Kurdî no lej di bête-refî bê. Seddamî zaf çiyê xirabî bi ma Kurdan sere di ardê. Labelê no nîno o mane ki Kurdî şirê ardimê Emerîka bikerê. Çiyêdo wina qandê Kurdan baş niyo. Bi raştêya, paştîya Seddamî girotiş zî qandê Kurdan xeyanet o.



Gülfar (Aboqat, j. Kurdistanê Tirkîya - Diyarbekir ra):

Seddami kışta ca girotiş karê aqilan niyo

Verê heme çî, gerek Kurdî beyniyê tarîx dê xo ra. A rojê, min BBC di goştareya beyanatên da Mahmûd Osmanî kerd. Ez ecêb menda. M. Osmanî vatê. "1974-1975 di Emerîka soz da ma, labirê soz dê xo ser o nêvinderdi, ma rê xiyanet kerd. Qandê coy zî gerek ma Seddamî hetî cayê xo bigirê" Baş o, di 1974-75'î di Seddamî se kerd. Şaro

رۆژنامه ی کراسنه یه زفیزدا، ئۆرگانی وزارت ی بهرگری سۆقیهت، له ژماره ی رۆژی ۲۵-۷-۱۹۹۰ دا، له لاپه ره ی یه که می دا، له ژنر سهر دیری : « کۆبوونه وه ی کورده کانی سۆقیهت » دا ده نووسی : « کۆمه له ی یه کبونی کورده کانی سۆقیهت له رۆژی سن شه مه ی ۲۴-۷-۱۹۹۰ له لۆژنی کاخ کۆبوونه وه یه کیان ساز کرد. با به تی سهره کی نه و کۆبوونه وه یه -- چاره نووسی کورده پهره وازه بووه کان - بو. له رۆژی ئیستادا، له ناوچه ی کراسنه دار دا، ۱۸ ههزار کوردی را کردو و له تهرمه نستان و ۲ ههزار کوردی ئۆزبیکستان چاره یه کن. که به نا چاری شونیی خۆیان به چی هیشته وه له بهر ئالۆزی و دژواری و هه لچونی ناسیونالیزی دا له ناوچانه دا. وه ک ده رده که وی بنا خه ی نه و باره دژواره ده گهریتته وه بۆ ۶ سال له مه و بهر، دوای له نیو بردنی ئۆتۆنۆمی کوردستان له ئازربینجان له سالی ۱۹۲۹ دا، که به ده بیان ههزار کوردی موسلمان به زۆری را گۆنیزان بۆ کازاخستان و تاسیای ناوه ندی... یارمه تی ده ری سه رۆکی کۆمه له ی « یه کبون » مسته فا گوتی : ئیمه ده زانین ئیستا له خاکی ئیمه دا، جگه له کورد، میلیه تی تریش ده ژین، قسه له وه نیه، ئیستا شالای گهرانه وه ی کورد بۆ نه و شونیه... ، به لکو ده بی عه داله تی میژوووسی بگهریتته وه و ئۆتۆنۆمی کورد بگهریتته وه. له کۆبوونه وه که دا به یار وه رگیرا که نامه یه ک ئاراسته ی سه رۆک کۆمار بکه ن و داوای لی بکه ن، شونیک بۆ کورده کان له خاکی رووسیادا تهرخان بکه ن که تیندا پینکه وه چی نیشین بین.

فه قیر به د حال م ژ به ختی کوردا
قه ی لاری خانی و فه قی ته یران
بۆ نه وی زولمی هه مه هینجا روح دان
یا منه ده لال گهر من نه خۆشه
ژ زولما دوژمن خوون وا درژا
دلی وی ده لال کرن چار پارا
مرن، کوشتنا هه ر چار کورده ستانا
ده جال ده خوازن ولاتی کوردا
هه موو پا قۆ که ن ژ سه ر خه ریتا
گه لی خو فۆ و خوون خورا
به زانن کورده ستان نه ئاسورستانه
لی بکه ن تۆ فان

کورد نه دار کۆلن ژ چیندا را که ن
و نرا باوژن یا خو خۆ خه لاس که ن
کورد شیر ی چیان، دلی وانه زانه
شه ری شه ری وان عه ردو ئاسمانه
گه لی خو فۆا هون رند به زانن
به قری، کوشتنا کورد خه لاس نا بن
خواستنا کوردا، کورده ستانا نازا
تیندا سه ره ست بن ده نگ ی خورت و قیزا
لو ما ده بیژم عه لی هه ژاره (به له نگازه)
به ی کورد و ولات شه و و رۆژا ده ناله
گهر باوهر نا که ن
دلی من که رت که ن
رند ته ماشه که ن
هون دی باوهر که ن.

دوای عه لی عه بدوله رحمان، چه ند که سیک تر دو ان و باسی میژوو ی کوردیان کرد له میژو زه مانه وه تا سه ده ی بیسته م، به درژی باسی رووداوه کانی کورده ستانی عیراق و به کاره ی نانی چه کی کیمیای و ته خت کردنی گونده کانی کورده ستانیان کرد. کۆبوونه وه که نزیکه ی دوو ساعه تی خایاند و، ههروه ها چه ند به یارنکیان وه رگرت، له وانه پی داگرتن له سه ر ئۆتۆنۆمی کورده ستانی سور و گهرانه وه ی کورده کان بۆ شونیی باو با پیران.

**کۆنفرانسی کورده کانی سۆقیهت له
رۆژنامه و گۆفاره کانی یه کیتی ی سۆقیهتدا**

خۇپېشاندىن كۆپۈنەھەي كوردەكانى سۆقىدەت لەمۇسكۆ



ئەز دەبېئۇم گەلەكى : يان مرن، يان كوردستان، كوردستانا سور
پاشان بەبايىش شاعىرى كوردەلى عەبدولرە حمانى
پىشكەش كرد ، ئەويش دوو شىعەرى خۇي
خونىدەھە، لە يەكياندا دەلى :

ئاخ گەلىنو كوردستان مۇو دومانە
نە مۇ و دومان، رۇوسالانە
لى مۇ دومانە، دەورو قورفانە
توقانا تورك و عەرب و عەجەمانە
پەرسى دەنە من، ئەز شاعىر چەوا جواپى
دەدەم:
من را ژدەبېئۇن زاف زوو كال بووى،
دېن تە قەرمچىيە، گورو ژال بووى
قوربان مەجبورم بەدەم جواپا وە
كو هون باوەركەن ژ شاعىرى خۇە
ئەو كوكول و دەردى ئەز پى د نالم
پالە كەفر ژى بەر وى دەھەلن
دلم بەھرە، بەھرا كوكول و دەردا

لەرۇزى ۲۴-۷-۱۹۹۰ لە لوژنىكاخ (نزيك ستادىزنى لىنىن)
لە شارى مۇسكۆ، نزيكەي ھەزار كورد كۆپۈنەھەيەكيا ن بۇ
داخوازىەكانيان رىنكەخت، كۆپۈنەكە بە سەركاپەتى مەمىد
بەبايىش و عدلى عەبدولرەھمان بوو نوئىنەرى كوردەكانى
كەرغىزىيا؛ كازاخستان و تەرمەنستان يش بەشداريان تىندا كوردبو،
ھەرەھا لە كۆپۈنەھەكەدا نوئىنەرى پارتى دىموكراتى كوردستانى
عىراق دكتور مەمەد صالح جومە و مەلا مەمەدى جوازى و
نوسەرى ئەم رىپۇرتاژە تامادەبوون. ئەو دروشمانەي لە
كۆپۈنەھەكەدا ھەلگىراپوون:
۲. ھەزار كوردى را كوردولە تەرمەنستان
كورد داخوازى ئۆتۈنۇمى خۇ دەكەن
دوومىليون كورد داخوازى يەكپوونى خۇيان دەكەن
دوو مىليون كورد لە يەكپىتى سۆقىدەتدا پەرش
وېلاو كراوتەتەوہا
خۇپېشاندەھەكان ئالائى كوردستان يان ھەلگرتبوو،
ھاواريان دەكرد : كوردستان ، يەكپوون
لەسەرەتادا مەمىد بەبايىش كوتى : ئىنمە ھاتوون تا مانى
ئۆتۈنۇمى وەرنەگرىن ناگەرئىنەھە، وەك لە نكۆ عەيانە لە
كوردستان خون دەرۇى، كورد كورد لە كەرغىزىيا و تەرمەنستان و
جى باشقە دەردەكرىن، ئىرۇ ئەم ھاتىنە وئىدەرى، بەتەخمىنى من

پنویسته حکومەتی ناوەندی کارێکی وا بکات ژبانیان ناسایی بی و له بودجەیی دەولەت پارەیان بۆ تەرخان بکری، دەکری ئەو پارەیه لەو کۆمارانە وەرەبگیری که کوردەکان ناچار کران لێیان رابکەن. ئێمە وای دەبینین که کۆنفرانسەکه مان بانگەوازی ئەنجومەنی بالائی سۆقیەت و حکومەتی سۆقیەتی بکا بۆ چارە سەر کردنی پاری کوردەدەرەدەر بوهکان.

- ئێمە دژی ئەوەین که مەسەلەیی ئۆتۆنۆمی بخریتە رۆژەف، هەر چەندە دەزانین که کارێکی دژوارو ئالۆزە و، بەکەسەر لەوانەیه جێ بەجێ نەکری، وەک هەندێک داوا دەکەن.

- پاری سیاسی و سیکۆلۆجی و کۆمەڵایەتی نازرینجان لەبەرئالۆژی کێشەیی نەگۆرنی کەرەباخ، لەوانەیه لە رۆژی ئێستادا لە بەرژێوەندی چارەسەر کردنی مەسەلەیی ئۆتۆنۆمی کورد نەبێ...، لەوانەشە، خەریکمان بکات و مەسەلەیی گشتی بزووتنەوی رزگاربخوازی گەلی کورد لە ولاتانی رۆژەهلاتی نیوهراس تپشت گوی بخت.

- کۆمەڵەکه مان نارەحەتی دەرەدەبری لەوێ که هەندی کەس دەیانەوی ناکۆکی بخرنە نیوان کوردە موسلمان و ئێزیدیەکانەوه. بۆ هەموو لایەکمان ئاشکرایە که ئەوه لە خزمەتی یەکیەتی کوردەکانی سۆقیەت نیه... هەر کەسیک بیهوی ناکۆکی و دووبەرەکی بختە نیوانمان بەوهی ئەوه موسلمانە ، ئەوی تر یەزیدیە ، ئێمە بە توندی دژیان دەووستینەوه و دەم کوتیان دەکەین.

یوری نەبیف داوای: دامەزراندنی رێکخراوێکی یەکگرتوی کوردی لە سۆقیەتدا کرد، که بتوانی بەرژێوەندی کوردەکانی سۆقیەت بپارێزی و سەرپەریشتی بێت : نامادەکردنی مامۆستا و کادیری نیشتمانی، چاپکردنی کتێبی خوێندن و پەرتووکی تر بەزمانی کوردی، رێکخستنی رادبۆ و تەلەفزیۆن بەزمانی کوردی بۆ هەموو کوردەکانی سۆقیەت بکات.

- کۆمەڵەیی رۆنایی پێشنیار دەکا:
- دامەزراندنی ئەنجومەنی نیشتمانی کوردەکانی سۆقیەت، لەسەر بناغەیی دەنگدانی نەینی و گشتی کوردەکانی سۆقیەت بێت.

- ئەنجومەنی نیشتمانی کورد، که دەریری خواست و ئاواتی کوردەکانی سۆقیەتە، لەباری قانونیشەوه، نوێنەراییەتی کوردەکان دەکا لەئۆرگانەکانی بەرزی دەستەلاتداری سۆقیەتدا.

- ئەندامانی ئەنجومەنی نیشتمانی، مافی (ستاتۆسی) ئەوهیان هەبێ بەپەرلەمێنتاری گەلەری سۆقیەت بۆمیزین، ئەنجومەنەکەش پلەو پایەیی ئەنجومەنی بالائی کۆماری ئۆتۆنۆمی یاخود ناوچەیی هەبێ.

رۆژی ئەوه هاتووه یەک ئۆرگان بەناوی کوردەکانی سۆقیەتەوه بدوی، که لەرێگای هەلئۆرگانی دیموکراتی هەل بژێردایی و لەرووی قانونی نیو نەتەوه بیهوه دانی بی تری...
له کۆتایی وتارەکهیدا، کاک یوری نەبیف لەسەر پەپوهەندی نیوان کوردەکانی سۆقیەت و کوردی دەرەوه (کوردستان) دوا و گوتی :

له ماوهی دەیان سالدا، کوردەکانی سۆقیەت بە جۆرێکی

دەستکرد له خەباتی نەتەواپەتی گشتی دوورخراپوونەوه. مەسەلەیی کورد لەکۆمەڵگای سۆقیەتی دا، مەسەلەیکی تاییەتی (لەکەییکی سپی) بوو. ئێمە ئاگاداریان لەدەنگوپیاس و پاروودوخی نیکه راگرا و ئەفریقایی خواروومان باشتەر هههوه، لەو پرۆسەیی راستەوخۆ لەنزیکی سنووری یەکیەتی سۆقیەت، له کوردستان روویدەدا.

حکومەتی سۆقیەتی و دەزگای راگەیانندی گشتی خزیان بی دەنگ دەکەن له تاوانەدرندەپەکانی که بەرانیەرەدەر دەکری لەو ولاتانەیی لێی دەژین. بەپروای ئێمە ئەو پشت گوی خستنه، پارتەقایی بەشداریه له تاوانەکاندا. سەپارەت بەوه، ئێمە وای لێکەدەپنەوه که یەکیک له گرنگترین ئەرکەکانی ئێمە لەبەر دەم کوردەکانی سۆقیەت، هەولێان و کار تی کردنه له راگەیانندی دەنگو پیاسی راست و باپەتی دەرپاری هۆکاری ژینوسید دژی گەلی کورد، لەم بوارەدا هیوامان بە رێکخراوەکانی کوردی دەرەوهیه.

هەندی جار من بیر لەوه دەکەمەوه که سیاسەتی دەرەوهی ئێمە له بنگەوه گۆرنی بەسەر هاتووه، تهنیا له پەپوهەندی بەرانیەر بە خەباتی رزگاربخوازی نەتەواپەتی گەلی کورد بی گۆرن ماوه. لەوانەیه، لێرەدا ئێمە « تاوانبارین » ئێمە کوردەکانی سۆقیەت. لەبەر چاوی هەموو جیهاندا، بەئاشکرا، دژ بە نۆرمی دان پیندرای شارستانیەتی هەموو جیهان، میللەتی ئێمە له عیراق و ولاتانی تردا، سەردەپرن، ژههری دەدەنی، چەکی کیمیای دژی بەکاردههین، بەزۆر له شوینی خزیانبار رادەگۆرن و پەرشو بلۆریان دەکەنەوه، نیشتمانیەرەوان زیندان دەکەن، تەنیا لەبەر ئەوهی دەیانەوی کورد پیننەوه، دەیانەوی بەنازادی وەک هەموو ئێنسانێک لەسەر ئەم زەویەدا بژین. لەم رووهوه ، ئێمە کوردەکانی سۆقیەت چی دەکەین؟ بۆ کەس گوی لەدەنگی بیزاریمان نیه، بۆکۆپوونەوهو خۆپیشاندانی بیزاری لەبەر دەم بالیژخانەیی ئەو ولاتانە ناکەین؟ بۆ داوا له حکومەتی سۆقیەت ناکەین رێکەوتنی دوستانەیی لەگەل حکومەتی عیراق هەلەوشیننەوه؟ بۆ ئێمە دوستانەیی لەگەل فاشستەکان دەکەین؟ بۆ داوا ناکەین چەکی نوی بۆ لەشکری عیراق راگری، ئەو چەکی دژ کورد بەکار دینن؟ بۆ دەنگی پشتگیری کوردەکانی سۆقیەت بو براکانبان له دەرەوهدا نابیسترێ؟

دەبادەستمان لەسەر دلمان دانین، راستگۆیانە دان بەوه داہنی، چون ئێمە بۆین ولەکوئی بۆمان باش بی، لەم ولاتە یان لەو ولاتەدا یاخود لەو کۆمارەدا، ئێمە هەردەم بیر لەکوردستان دەکەینەوه.

بۆ ئەوهی خۆراگری، وە ک ئیتنوس (رەگەزی)ی خۆمان بپارێزین، زمان و ترادایسۆنی خۆمان بپارێزین، پنیویستیمان بە کوردستانه.

دەبا بژین و کار لەپینا و کوردستاندا بکەین.

رینکخراونکی سیاسی و کۆمهلایدی یه، بهرزه و هندی کوردهکانی گورجستان ده پاریزی، ده بری ویست و خواستی نه وانه پاشان دریزه به قسهکانی ده دا: له سایه ی چالاکمی کۆمهله کمان، نیستا کۆمهله گای گورجستان گرنگی پتر ده داته باری کورد و بزوتنه وهی رزگار یخوازی کورد، به تایبه تی له کوردهستانی تورکیا. رینکخراوه سیاسییهکانی گورجستان داوای دهنگوباسی بابه تیمان له سدر کوردهستان لی ده کهن، به تایبه تی که کورد دراوسی ی گورجستانه. نیمه ههولده دهین داخوایه کانیان نه نجام بدهین، به لام به داخوهه، نیمه دهنگوباسی کوردهستانیان که مه. پنیسته بلین که دهنگو باسی ته واوله سدر بارو و خوی کورد له ولاتی رۆژهلاتی ناوه راست، گرنگی سیاسی ههیه بۆ رینکخستنی بزوتنه وه یه کی پشتگیری جیهانی له گهله گهلی کوردها. من نهو نمونه یه تان بۆ دههینمه وه: رۆژانه له یه کیستی سۆقیه تدا، رۆژنامه و رادیو و تله فزیون به کۆمهله دهنگو باس ده گه یه نته خه لک له سدر خه باتی عاره به کانی فله ستین له خاکی داگیر کراودا، له سایه ی نهو دهنگو باسانه له ولاتی نیمه دا بزوتنه وه یه کی پشتگیری به ته وژم ههیه بۆ خه باتی نیشتمان پهروه رانی فله ستینی. کۆمهله گای سۆقیه تی چه ند دهنگو باسیان ههیه له سدر خه باتی کوردهکان؟ له م روه وه پنیسته بیرنگ بکه یه نه وه.

پاشان یوری ئه رک و کاروباری نه مرزی کۆمهله ی رۆنایی روهنده کاته وه: له رۆژی نیستادا مه سه له یه کی زۆرمان له بهر ده مه دایه، له وانه هه ندیکیان ته کنیکین و په یوه ندیان به رینکخستنه وه هه یه، نیستا هه ولده دهین شانیه سهره تایه دروست بکه ین، ههروه ها له شاره کاندای کۆمهله کمان بکه یه نه وه. تا نیستا له شاری باتۆمی لقمان کورده وه، نیستا له شاره کانی تیلاقی، رۆستاقیلی هه ولی لق کورده وه ده ده ین.

تا نیستا نه وانه ی داوای نه ندانه تیان له کۆمهله کمان کورده گه یشتۆنه ته ۱۵۰۰ که س، هه ندیکیان کورد نین، ههروه ها کۆمهله که مان خه ریکی پاره کۆکورده وه یه. نیستا هه موو پنیسته یکی ته کنیکیمان بۆ ده رکورده ی رۆژنامه کمان که به ناری « رۆنایی» یه ناماده کورده، رۆژنامه که له سدر بناخه ی ئه لف و به یی لاتی نی چاپ ده کری، ههروه ها نیازمان هه یه به لوتینی ک به زمانی روسی و گورجی یش ده ریکه ین. نیستا خه ریکی زه مینه خۆشکردن بۆ کورده وه ی مه له ندیکی کولتوری کوردی له شاری تیلیس دا.

جینگای خۆشحالیه، که هه ندی رینکخراوی گورجی پینشیار ده کهن که له گورجستان دا کۆمهله ی پشتگیری گه لی کورد دا به زرت. پاشان ده لی: نیمه باش ده زانین که ئه رکی په یوه ندی له نیوان گه لانی کورد و گورجی ده که وینه نه ستۆی نیمه، باشیش تیده که ین که ناوچه ی پشت قه ققاس راسته وخۆ په یوه ندی هه یه له گه ل کورده ستان، نه وه ش کارنکی گرنگه بۆ خه باتی رزگار یخوازی گه لی کورد، بۆی هه ولده دهین له تیلیسدا بناخه ی رینکخراونکی سیاسی و کولتوری به هیز دروست که ین بۆ بزوتنه وه ی نیشتمانی کورد ... پاشان دینه سدر باسی کیشه ی کورد له سۆقیه ت و ده لی:

- نه وه ی نیمه ناره حه ت ده کا، باری کورده ده ره ده ره کانه، که

رۆناکبیران به شداریان کورده، ههروه ها هه ندی له و کوردهانی له شونیی خۆیان راو نه واون و ده رکراون وه ک ئه رمه نستان و که ریزیا. رۆناکبیران داواکانیان به جۆرنگ دارنشته وه، به لام را کورده کان داخوایان ته نیا کورده ستانه. واته گه رانه وه ی ئۆتۆنۆمی کورده انه. نه وه ی په یوه ندی به کورده کانی ئه رمه نستان و گورجستانه وه هه یه، هه ندیک ده لین له وانه یه نه گه ر ئۆتۆنۆمیش به کورد به ری، شونیی خۆیان به جی نا هیلن، دیاره نه وه شتیکی سرۆشتی یه، به لام نه گه رته وانیش رۆژنگ تووشی ته نگانه وه هاتن، ناچار بوون له شونیی خۆیان رابکه ن، نه وه ئۆجاخیک هه یه روه ی تی بکه ن. (ده قی کۆنفرانسی رۆژنامه نووسیه که، نه گه ر بۆمان لوا، له ده رفه تینیکی تردا بلاو ده که یه نه وه).

لیزه دا نمونه یه ک له و راپۆرتانه بلاو ده که یه نه وه که له کۆنفرانسیا پینشیکیش کرا:

**کورتە ی وتاری نوینەری
گۆمهله ی رۆنایی له
گورجستانی سۆقیه ت
یوری نه بیییف**

یوری له سهره تادا په یه ی بۆ نه وه راده کیشی که به یی نه واری سالی ۱۹۸۹، ژماره ی کورده کان له گورجستان ۳۳ هه زاره وه له وانه ۳. هه زاریان له شاری تیلیس ده ده ژین. و ده لی: نه و کورده انیه له گورجستان ده ژین، نه وه ی نه و کورده انیه که له سالاتی شه ری یه که می جیهان دا ناوچه ی خۆیان له کورده ستانی تورکیا به جی هیشته وه وله پشت قه ققاس گیرساونه ته وه. پاشان باسی و رووداوه کانی گورجستان ده کا، به تایبه تی داوای کاره ساته که ی ۹ نه پرینی ۱۹۸۸ له تیلیس دا و ده لی:

نیمه به شیکین له کۆمهله گای گورجستان، ناتوانین ده ست له نه وۆنۆ بوه ستین به رانه بهر به رووداوه کان، به لکو پشتگیری داخوایه کانی گورجیه کان له پیناوی سه ره خۆیی ده وه لته ی گورجستان دا ده که ین. داوایی باسی چونیه تی دامه زراندنی کۆمهله ی رۆنایی ده کا که به شیکه له رینکخراونکی سه رانه سه ری گورجستان به ناوی: > کۆمهله ی رۆستاقیلی. کۆمهله ی رۆنایی له شوایه تی. ۱۹۹ دامه زرا و له کۆنگره ی دامه زرانی دا ۷. نوینه ر به شداریان تیدا کرد. کۆمهله که له مانگی مایس به ره سه می له لایه ن ده وه لته وه تۆمار کرا. کۆمهله ی رۆنایی، کۆمهله یه کی کولتوری نه ته وه یی و

سەر بکەن.

بەشدارانى كۆنفرانس يەك بىرۈن ،كە لەسەر بناخەى
قانۇنەكانى يەكئىتى سۇفەت :» لەمەر ئازادى
پەرەپىدانى نەتەوئەيى ھاوولاتيانى يەكئىتى
سۇفەت،ئەوانەى لەدەرەوئەى سنورى رىكخستنى
دەولەتى ناسيونالى خۇيان دەژىن، ياخود ئەوانەى
دەولەتيا نىلەلەخاكى يەكئىتى سۇفەتدا» بەپىوستى
دەزانين :

-گەراندەوئەى ناوچەى ئۆتۆنۆمى كوردەكانى سۇفەت
كە لەرابرەودا ھەبوو(كوردستانى سور) ،لەگەل لەبەر
چاگرەتتى ئەو زيانانەى پىنان كەوتە.

-دامەزراندەوئەى ئۆتۆنۆمى ناسيونال، لەوانەى
يارمەتى دەرىن بۇ كۆكردنەوئەى يەكگرەتتى گەلى كورد
كە لەسالانى ستالىننەتدا تووشى پەر وىلاو و ژىنوسىد
ھاتوون، ھەرەوھا دەبىتتە بتمانى بەحكومەت ونەھىشتنى
مەترسى(ھەرەشەى سامناك)،كە لە ئەنجامى
توندىبونى گىروكىشەى نە تەواپەتى نىو ولاندا ھەىە.

-ئىنەلەو بىرواىەداين،كە حكومەتەكان و مىللەتانى
ئازىرىجان، ئەرمەنستان، گورجستان و كازاخستان ،
كەرغىزىياو توركمانستان ،داخووزى گەلىكى زولم لىنكراو
تىنەگەن و ھەلى دەسەنگىن و يارمەتى چارەسەر
كردنى كىشەكەى دەكەن.

تكامان ھەىە نوئىنەرانى گەلى كورد چ لەئۆرگانەكانى
دەستەلاتى ناوئەندى ،يا ناوچەى شونى خويان بگرن و
ھەرەوھا بىخىرنەنىو كۆمىسونى ئەنجومەنى بالاي سۇفەت
لەمەر مەسەلەى كوردەو.

لەھەندى كۆمارەكانى ئاسىياى ناوئەندى دا،بارىكى
ناھەموار بۇ كوردەكان درووست بوە و مەترسى
تەقىنەوئەى ھەىە، جا تكتاتان لى دەكەين سنورىك
داپنىن بۇ فشار و پالەپاستۆى كوردەكان، لەھالەتى
مەترسى لەسەر ژيانىان، شونى راگوئزانىان بۇ ديار
بکەن.

بەناوى كۆنفرانس ئەو زاتانەئىمزاىان كوردە:

نادرۇف.ن.ك،كىتايىف ئى.ن؛ بەبايىف م.س؛
شاكرۇ م.باگرامۇف.گ؛عەفدال.ئا؛ ترەپىزنىكۇف.گ

پاشى خوئىندەوئەى بەيانى كۆتايى كۆنفرانس پەيامنىرى
رۇژنامەو گۆڧارەكان دەستيان بەپرسىياركرد. ھەندى لە
پرسىيارەكان راستەو خۇ پەيوئەندىان بە كۆنفرانسەكەو ،
ھەندىكىشىان دەربارەى ھەلوئىستى سۇفەت لەمەر
كىشەى كورد بەگشتى وئەى دەنگى يەكئىتى سۇفەت
لەبارەى بەكارھىنانى چەكى كىمىاوى لە كوردستانى
عىراقدا ھەبوو. پرسىيارەكان ئاراستەى نوئىنەرانى بەرەى
كوردستانى عىراق دەكرا، پەيوئەندى راستەوخۇيان ھەبوو
لەسەر ھىرشى ئىران وعىراق بۇ سەر كوردستان و
بەكار ھىنانى چەكى كىمىاوى لە ھەلەبجە دا .

پرسىيارى كەنالى چواری تەلەفونى ئىنگلىزى:
ئايەھىچ بەنەمايەك ھەىە بۇ جى بەجى كردنى ئەو
ئامانجانەى لەبەيانى كۆتايىدا ھاتوئە؟

ئادۇف:بەلى ھەىە، چ لە روى ئابوورەوئەى،يا
لەبارەى كادىر، چونكە بناخەىكەى باش لەم رووئە
لەئەرمەنستانى سۇفەتى ھەىە،بەتايبەتى لەرووى
چاپەمەنى و رۇژنامەو رادىو و كادىرى زانستى،پەو،
ھەرەوھا لەگورجستانىش تارادەىك كار كراو.جا ئەگەر
مەسەلەكە گەىشتە ئەو رادەىە كە كورد ئۆتۆنۆمى
وەرگىرى ، بىنگومان ھەموو جۆرە زەمىنەىكەى بۇ ئامادە
دەكرى. چونكە كە رىنگا درا كۆمەلە رىنكخرى، ئەو
مافى ئەوئەشى دەبى ، قوتابخانە بكااتەو و كادىر ئامادە
بكات.

كەنالى چوار: دوتنى لەكاتى فلىم وەرگرتندا، يەكىنك
داواى فلىمەكەى لى كرم، كە پىنم گوت ناكرى، گوتى
ئەگەر نەىدەى دەزانى چ روودەدا! لىم پرسى تۇ كىنى؟
گوتى من جەماعەتى بەبايىشم. ئەمرۇ لەكۆنفرانسدا
ئەو سەرنجى راكىنشام ،كە ھەندىك چاوەروانى تۇ بوون
، ئىوئەش لە تىرىبوونەو بەدەست ئامازت دەكردن كە
ھىنم و ھىنورە بىنەو، پىاوەكانى تۇ ھاوارىان دەكرد و
دەنگىان بەزر دەكردەو، تۇش بى دەنگت دەكردن .

پىاوەكانى تۇ چىيان دەوئەى؟ بۇ وا رەفتارىان دەكرد؟
بەبايىف: زۆرەى ئەوانە لە كەرغىزىياو ھاتوون،
لەوئەى ئاگادار كراون كە لەماوئەى مانگىنكدا دەبى شونى
خۇيان بەجى بەپىلن و بۇ كوى دەچن كەىفى خۇيانە،
بۇئش ئەوانە ھاتوونەتە مۇسكۇ تا چارىنك بۇ خۇيان
بەدۆزنەو .. لەماوئەى ۱۵ رۇژدا پىنوئستە جىنگاىان بۇ
دىارى بكرى ، چونكە بارىان زۆر گران و دۆوارە ..
ئادۇف : لەو كۆنفرانسەدا ژمارەىكەى زۆر لەزانانە و

پانگه وازنگ بو سدرۆك كۆماری يەكئیتسی
 سۆقیەت هەقال مێخاییل گۆریاچۆف
 بو ئەنجومەنی بالای یەكئیتسی سۆقیەت
 بو سدرۆكایەتی ئەنجومەنی بالای یەكئیتسی
 سۆقیەت

بەرێز مێخاییل گۆریاچۆف.

هەفالانی بەرێز

ئێمە، بەشدارانی کۆنفرانسی زانستی و پراکتیکی سەرانسەری - کوردەکانی سۆقیەت: مێژوو و سەر دەم، کەبۆ یەكەم جار لەرۆژانی ۲۵-۲۶ ی تەمووزی رابردوودا، لە ئینستیتوتی مارکسیزم - لێنینیزمی سەر بە کۆمیتەیی ناوەندی پارتی کۆمونیستی یەكئیتسی سۆقیەت (پ.ک.س) کە لەلایەن بەشی پەيوەندی نیو نەتەوه کانهوه رێکخرا بوو بە هاوکاری بەشی پەيوەندی نەتەوايەتی ئینستیتوتی مارکسیزم-لێنینیزم و لەگەڵ ئینستیتوتەکانی سەر بە کۆمیتەیی ناوەندی پارتەکانی کۆمونیستی ئازربایجان، ئەرمەنستان، کازاخستان و گورجستان و ئینستیتوتی رۆژەلاتناسی ئاکادیمیای زانستی یەكئیتسی سۆقیەت بەسترا.

راپۆرت و وتارو لیکۆلینەوه و کورتەباسەکانی زانایان لەسەر باری کوردەکان لە کازاخستان و ئازربایجان و ئەرمەنستان و گورجستان و کەغیژیا و ناوچەیی کراسنادارگونمان لینگرت و لیمان کولینەوه، هەرۆهە و تاری مینوانەکانی دەرۆه ی سۆقیەت کە لە ئەوروپا و ولاتانی رۆژەلاتنی نیوهراس تاهادە بویون، هەموو وا لیکدەدەنەوه کە باری بەستنی کۆنفرانسیکی ئەو، تەنیا لەباردۆخی پرسترویکادا، هەلی بۆ رەخسا، کە پارتی (پ.ک.س) دەست پێشخەری ئەو گورانکاریانەیی کرد، بەمەبەستی چەسپاندنی نۆرمی لێنینی، لەیەكسانی راستەقینەیی هەموو گەل و نەتەوه کان بێ جیاوازی، هەتا ئەو نەتەوانەیی دەولەتی ناسیونالی خۆباشیان نیە، یاخود ئەوانەیی کە وتبویون بەر شالاری سەرکوتکردن و راگوزان.

بەم بۆنەیهوه، روتان تی دەکەین و داخواریتان لی دەکەین، مەسەلەیی کوردی سۆقیەت، کە لەسالانی دەسەلاتی ستالینیت و مەنگبوندنا کە لەکەیی کردو، چارە

گۆرانکاری دیموکراتی و درێژەدان بەلبیرەلیزەکردنی ژبانی گۆمەلایەتی و سیاسی و نەتەوايەتی لەولادتدا دەرەبری. بە گزنگترین باری لێهاتوو و پەيوەپێدانی هارمونی هەموو گەلان و کەمایەتیەکانی دادەنی.

مێژویی دەولەمەند و پر لەرووداوی دراماتیکی کورد دەمان گەینیتە ئەو بروایە کە نازادی و خۆشگۆزاری گەلان، نەک لەسەر بێکەیی دژایەتی بەرژەوهندی گەلیک بەرانبەر گەلیکی تر ئەنجام دەدری، بەلکو لە کۆمیتەیی هارمونی و ریزلینکرتن و بروا پێک کردن پێک دی، کە لەهەموو جۆرە دەربرینی ملهوری ناسیونالیزمی و گوشەگیری نەتەوايەتی و هەرەشەیی روحی دورویی.

لەباردۆخی ناسیاسی و ئالۆزی ولادتدا، کوردەکان دلسوزی و ئەمکداری ترادیسون و مێژویی و پەيوەندی روحی لە گەل ئەو گەلانەیی پێکەوه دەژین رادەگری و، بەشداریی لەرەخساندن و داپین کردنی بارودۆخی هەمە لایەندی پەيوەپێدانی مێللەتانی گەرۆه و بچوک دەکا.

سەرۆکی کۆمیتەیی رێکخەر، ئاکادیمی ئاکادیمیای زانستی کازاخستان - نادرۆف. ک.ن. سەرۆکی هاوکاری کۆمیتەیی رێکخەر و یارمەتی دەری سەرۆکی ئینستیتوتی مارکسیزم - لێنینیزم - کیتاییف. ئی.ن.

ئەندامی کارا - ئاکادیمیای ئەرمەنستان - شاکرۆی محز.

سکرتیری بەرپرسیار و سەرۆکی کۆمەلەیی <یەکیبون> - مەمید سولەیمانۆف یەکیب.

ئەندامی کۆمیتەیی رێکخەر، سەرۆکی بەشی پەيوەندی نەتەوايەتی ئینستیتوتی م.ل. - ئیدوارد بەگراوۆف

سکرتیری بەرپرسیاری کۆمیتەیی رێکخەر و رۆژنامەنوس - ئازا عەقدال

بەرپرسیاری گروپی لیکۆلینەوه ی کیشەیی ئەو گەلانەیی تووشی فشار هاتوونە لە بەشی پەيوەندی نەتەوايەتی ئینستیتوتی م.ل. - ترەپیزنیکۆف. گ. یی.



په یوه نډېدې کانی تری کورده کانی سؤقیهت و کوردی دهرهوه درا، ههروهه ها نیمکانیهتی گه یشتنی چاپه مهنی کوردی له دهرهوه خرایه بدر چاو. بهشدارانی کؤنفرانس، پینان له سهر نهو بیره داگرت، که ده مینکه روژی نهوه هاتوه، که چاپه مهنی کوردی له یه کیستی سؤقیهتی بگه ریتهوه سهر تلف و بیژی لاتینی وهک نهوهی نیستا له دهرهوهی سؤقیهت به کار دینریت، بؤ نهوهی نهو پهرژینه دهستکرده له سهرینگی په یوه نډی نیو کوردان لایبری، و کورده کان هه موویان بتوانن چاپه مهنی یه کتر بهویننهوه. له کؤنفرانسدا گؤتراوه، که کورده کانی سؤقیهت، نارزو مهنن و کرنگی زور دهدهنه چاره نویسی هاوخنه کانیان، و خه باتی خویناویان له پیناو مافه کانی دیوکراتی ومافی چاره نویسیدا. بهشدارانی کؤنفرانس نهو راستیه یان دهست نیشان کرد که به داخوهه سیاستی بیر کردنهوهی نوی، تا نیستا کوردو خه باتی نه ته وایه تی یه که ی نه گرتوتهوه و رژی مهسه له ی کوردی له په یوه نډی نیونه ته وایه تی رژی هه لآت ورژواوا دا هه ل نه سه نگاندهوه.

کؤمه له ی سهرانسهری کورده کانی سؤقیهت جی به جی بکری. که میکانیزمینگی کاری لینه اتوی بؤ ترخان بکری، له گه ل دیاری کردنی بازنه ی کیشه کانی کؤنکریت و له گه ل دهسته ی سهر کردایه تیه ک که له م نه خشه یه دا دامه زرانن و پیشخستنی مه له نډی کولتوری کورد له مۆسکؤ دا و لقه کانی له ناوچه کورد نیشینه کاندای شونینگی گرنگ و تایه قه مند ده گیزیت.

کؤنفرانس هیواداره، که رنکخراونگی بالای و، به ته وای و، خه ریکی چاره سهر کردنی کیشه ی ژبان و کاروباری نهو کوردانه بیت که له بهر تووندی و دژواری په یوه نډی نیو نه ته وایه تی یه کان، ناوچه کانی خویان به جی هیشتهوه .

په یوه نډ بهوهی له سهرهوه گؤتراوه، کؤنفرانس نهو نه رکه ی دیاری کرد که پنیوسته زه مینه خویش بکری بؤ دامه زرانندهوهی ناوچه ی تۆتۆنومی کوردستان و رنکا دان به حی نیشین کردنی، یاخود کؤ کردنهوهی به شی زوری کورده کان له ناوچه یه کی تری سؤقیهت دا له گه ل له بهر چاوگرتتی باری سروشتی و ناو و ههوا و پیکهینانی ناوچه یه کی تۆتۆنومی بزبان .

کؤنفرانس لهو پروایه دایه، که دا بپن کردنی مافه نه ته وایه تی و دیوکراتیه کانی کورده کانی سؤقیهت ده کری به جزینگی تریش چار بکری، به مه رجینک لهو شونانه ی کورد به کؤمه ل پیکه وه ده ژین نهو باره یان بؤ به خو لقیتری که که تترؤل و گه رانتی دهسته لاتی ناوه نډی و تۆرگانه کانی ناوچه یی مسؤگه ر بی.

کؤنفرانس رنکخستنی په خشی رادیوی کوردی به گرنگ ده زانی و، ههروهه له مۆسکؤشدا.

- دامه زرانندی دهستگای چاپه مهنی کوردی له سهر بناخه ی تلف و بیژی لاتینی بؤ چاپ کردنی نه ده بیاتی کوردی.

- کؤنفرانس پشتگیری ته وای خوی بؤ سیاستی گؤرانکاری دیوکراتی و درنژه دان به لیبیره لیزه کردنی ژبانی گؤمه لایه تی و

بهشدارانی کؤنفرانس، به سهر سورمانه وه ته ماشای بی دهنگی یه کیستی سؤقیهت ده که ن، به رانیه ر قه لچو کردنی کورد، به تایه تی به کار هینانی چه کی کیمیاری له سالی ۱۹۸۸ له کوردستانی عیراقدای.

نیمه یارمه تی و شتگیری رژیمنیک که قه ساوهت به کار دههینتی بؤ سهر کولتورنی خه باتی عادی لانه ی گه لی کورد له پیناو مافی نه ته وایه تی دا به کارنکی ناسایی نازانین.


نیمه لهو پروایه دایه، که وهختی نهوه هاتوهه یه کیستی سؤقیهت له روانگه و روحیه تی بیری نوی وه، ده پینشخه ر بی له هینانه گوری لیکؤنینهوهی مهسه له ی نه ته وایه تی میلله تی زور لیکراوی کورد، له رنکخراوه نیو نه ته وه یه کان دا و، به تایه تی له رنکخراوی نه ته وه یه کی گرتوهه کاندای.

نهو راپؤرت و کورته پاسانه ی له کؤنفرانسدا پینشکیش کران، تابلوی ته وای باری نه ته وایه تی و قانونی کورده کانی سؤقیه تی نیشان دا، که بنه مای ده وه مان ده داتی نه نجامه کان دهست نیشان بکهین و رینوننی و راسپه رده کان به تۆرگانه کانی بالای دهسته لاتداری راپه گه یین.

کؤنفرانس وا ده بیینی، که له نیو برنی ناوچه ی تۆتۆنومی کورد له سالی ۱۹۲۹ دا، پینشیل کردنیک زهقی مافی نه ته وایه تی کورده، بؤیش ناشکرایه که خواستی کورد بؤ گه رانندهوهی تۆتۆنومی کورده کان له پیکهینانی میکانیزمی به تواناو و کاریگه ر بنه مای ره وای هه یه. پیکهینانی میکانیزمینگی نهو تۆ که ریز له مافی نه ته وایه تی کورد بگری که پنیوسته خه ریکی بین و ناگری دوا به خیریت . بؤ جی به جی کردنی دهست و برد، پنیوسته خواست ویستی ژبانی کولتوری نه ته وایه تی کورد ناماده بگری و کاره که رنک به خری ونه خشه ی بؤ بکیشری. بینگومان نهو نه رکه ده توانری له لایه ن رنکخراونگی کؤمه لایه تی، وهک

ناكۆكى و دوپپەرەكى بەختە نىز كوردانەو، بەلام شىخ و مەلای
روناكېبىرى كورد، دەم كوتى ئەم قەوانە ناسازە دەم كوت دەكەن و

بىرارى كۇنفرانسى زانستى سەرانسەرى بەكيتتى سۇقيەت



كوردەكانى بەكيتتى سۇقيەت : مېژوو و سەردەم
لە ۲۵-۲۶-سى تەمووزى ۱۹۹۰، لە شارى مۇسكۇلە ژۇر
سەردىرى : كوردەكانى سۇقيەت : مېژوو و سەردەم كۇنفرانسى
زانستى سەرانسەرى بەكيتتى سۇقيەت پەسترا. لە كارو بارى
كۇنفرانسدا، زاناپانى سۇقيەت و كوردناسانى دەرەو و كومەل
ناسان و كەسانى كۇمەلەيتى و نووسەران و نوينەرانى روناكېبىرانى
كورد، ھەرەوھا نوينەرانى روناكېبىرانى دەرەو بەشداريان كوردبوو .
لە كۇنفرانسدا بە جۇرنىكى فراوان، ژمارەيكى زۇر لە كيشە
كۇمەلەيتى و سياسى يەكان و ژيانى كولتورى و نەتەوھى
كوردەكانى سۇقيەت مناقشە كرا. لە روناگە رىيازى نوئى
دېموكراتى و دەرپىنى ئازاد دا، ھەموو لايەننىكى مېژوو سى بارى
كوردەكانى سۇقيەت تىان شى كوردەو. لەراپۇرت و راگەيانلەن و
وتارەكانى بەشدارانى كۇنفرانسدا، لايەنى پۇزىتىشى بەرەو
پىنشىچونى كوردەكان لە بوارى جۇراو جۇرى ژيانى كولتورى و
نەتەوھى دا دەست نىشان كرا . لە ھەمان كاتدا، لادان و
شىواندىنى سياسەتى نەتەوايەتى لەئاست كوردەكانى سۇقيەتدا، لە
سالانى دەسلەئى ستالىنىيەت و مەنگدا كە ببوھى ھى پىشت گوى
خستنى مافە نەتەوايەتەكانيان و لە ناو بىردنى ناوچەى
كوردستانى سور(۱۹۲۹) لە - ئازرىبىجانى سۇقيەت - دا، خرايە
بەرچا، ھەرەوھا تۈاندنەوھى زۇرەملى و راگۈاستنى سالانى
۳-۴، و داخستنى قوتاپخانە نەتەوھى يەكان و قەدەغە
كردنى كىتىب بە زمانى كوردى، شارەنەوھى راستى لەبارەى
ژمارەى كوردەكانى سۇقيەت پەنجەى بۇ راكىشرا.

(وئەھى شىخى ئىزىدەكانى گورجىستان
وچىگىرى موفتى كازاخستان)-. وەك نمونەى ئەو بەكيتتى
بلاو دەكەينەو.

دیاردەيكى ناكۆكى دارە، كە لە سالانى پرىسترويكەشدا،
چارەسەرى مەسەلەى كورد ناكۆكى و مافە لە كىس چووەكانى
سالانى سەركوتكردنى بۇ ناگەرئىننەو، و تەگەرە دەخرىتە بەر
كارى چاپەمەنى كوردى و پەخش و رادىز و وتنەوھى زمان و
ئەدەبى كوردى. بىگومان بوونى تاقە رۇزنامەيك لە ئەرەنستان
و پەخشى رادىز لە ئەرەنستان و گورجستان، تەنیا وىستى
بەشىك لە دانىشتوانى كورد داپىن دەكا. ھاركارى نىبە بۇ داپىن
كردنى خواستە نەتەوايەتى و روھىيەكانى گەلى كورد. لە
ئەنجامدا، لە ھەندى شونىن بىكەى كولتورى- نەتەوھى و
چاپەمەنى پەيدا بوو، بەلام دىسان بۇ بەشىك لە كوردەكان.
چەندان سالە كەمايەنى كورد نوينەرى خۇى نىبە لە نۇرگانەكانى
بالانى كۇمارە يەگرتووەكاندا، تا رادەيكە لە ھەلبۇاردنەكەى ئەم
دوايانەشدا، تاقە نوينەرنىكى نەھاتۇنە پەرلەمان. ھەر چەندە ئىستا
راست كردنى ھەلەكانى رابردو لە سياسەتى نەتەوايەتى دەستى
پى كوردە، و لە شىواندىن رزگار دەكرى، بەلام لە گەل ئەوشدا
ماقى نەتەوايەتى كەمايەتى كورد رىزىلى ناگىرى، لەراستىدا بەرەو
خەراپتردەوا.
لە كۇنفرانسدا گزنگى بە بارى پەبوھەندى كولتورى و

لە ئىوارەى رۇزى ۲۶-۷دا، كۇنفرانس بىرارى لەسەر
بەيانى كۇتايى وپانگەوازىك بۇ گەرياچۇف دا، ھەرەوھا
لەكاتومىزى ۵ى ھەمان رۇز دا، لە ئىنىستىتوتى ماركسىزم
-لېنىنىزم دا، نوينەرانى كۇمىتەى رىكخەرى كۇنفرانس: نادرۇف،
بەبايىف، شاكرو وئۇردوخان و ئازا، لەگەل ھەندىك لەمىزانەكان :
د.مەحمودعوسمان و سامى عەبدولرەحمان، كەندال
نەزان، د.مەحمەدسالج جومەد، سەلەخ بەدەرەدین و ئەحمەد
قەرەموس كۇنفرانسىكى رۇزنامەنووسىان گرت بۇ
رۇزنامەنووسانى سۇقيەتى و بىنگانە. لەو چاپىكەوتنەدا نوينەرانى
رۇزنامەى اللەاء- (لويان)، لوموند، فرانس پرىس(فرانسا)، پەيامنىزى
كەئالى چوارى ئىنگلىزى، ئازانسى ئرنا(ئىران)، گۇفارى نۇقەبە فرىنسا(م
ۇسكۇ)، ئارمانج و سەردەمى نوئى و بەربانگ سوندا، رىاتازە(بەرىقان)
ئامادە بوون.
لەسەرەتاي كۇنفرانسە رۇزنامەنووسىيەكەدا ئەكادىمى نادرۇف
بەكورتى باسى ھى ھى بەستنى كۇنفرانسى كوردەكانى سۇقيەتى
كرد، پاشان دەقە بىرارى(بەيانى كۇتايى كۇنفرانسى خويندەو):

کیتایف، نیقان نیکیفه رۇفچ - یاردهری سەرۆکی ئینستیتوتی مارکسیزم - لینینیسم.

ریابوڤ فیکتور فاسیلیفچ - سەرۆکی سینکشونی بەشیپه یوهندی نیونه تهوه کان - کۆمیتە ی ناوهندی پ.ک.س.

سازانوڤ نه ناتولی ذکیکسانرۇفچ - چینگری سەرۆکی بەشی پیه یوهندی نه تهوه کان - کۆمیتە ی ناوهندی پ.ک.س.

تراپیزنیکوڤ، گیزوگی یفگینیفچ - سکرتری بەر پرسیار، دکتوری میژوو.

بەینی بەرنامە ی کۆنفرانس، دەهواپه له ماوه ی دوو رۆژاندا چوار کۆپونه وه بکری، له وانه دوو کۆپونه وه ی تینکرای، دوو

کۆپونه وه ییش بۆ دوو سینکشون : ۱- میژوو و ئینتوگرافیای کورده کانی سۆقیهت، ۲- کیشە ی کولتوروو زمان.

بۆ سینکشونی یه کهم : ۲. راپورت دانرابوو، بۆ سینکشونی دوو مه م ۱۹ راپورت. له کۆپونه وه ی تینکرای یه کهمدا، که به

کردنه وه ی کۆنفرانس ده ست پێ کرد سێ کهس وتاری گشتی یان له بهاری کیشە ی کورده کانی سۆقیهت وه پینشکهش

کرد، له کۆتاییدا بریار واپوو کۆپونه وه یه کی تینکرای بۆ نه چام ووه رگرتی بریار و راسپه رده کانی کۆنفرانس پینک بهینرت. به لام

له بهر کهم کاتی، نیوه ی راپورته کان نه خویندرانه وه بریاره را هه مو راپوره کان له گه ل به لگه کانی کۆنفرانس دا چاپ و به لۆ

بکریته وه . له کاتۆمیژی ۱. ی به یانی رۆژی ۲۵-۷-۱۹۹۰ کۆنفرانس

له لایه ن نیقان کیتایف کرایه وه . کیتایف رایگه یاند که له کۆنفرانسدا جگه له زانایانی کورده ی سۆقیهت و نوینترانی کورده

له هه موو کۆماره کانی سۆقیهت، نوینترانی ده زگای ده وه لته یه کیشی سۆقیهت، وه ک وزارته ی ده وه وه ی سۆقیهت و

زارته ی کولتوری و نوینتره ی نه چومه نی بالای یه کیشی سۆقیهت پاریس نیکۆلایفچ نه لینیین که چینگری سەرۆکی نه چومه نی

نه ته واپه تی، نه چومه نی بالای سۆقیهت ته. ههروه ها نوینتره ی نه چومه نی شاری مۆسکو... هتد. پاشان کیتایف

راگه یاند که له کۆنفرانسدا نوینتره ی کورده کانی ده ره وش به شداری ده که ن ناوه کانی خوینده وه :

۱- عه زیز مه مه د - سکرتری گشتی پارتی کۆمونیستی عیراق.

۲- که ندال نه زان - سەرۆکی ئینستوتی کورده - پاریس.

۳ - د. مه مه د سالح جومه - پارتی دیموکراتی کورده ستان - عیراق.

۴ - د. سه عید شه ره فه که ندی - سکرتری گشتی پارتی دیموکراتی کورده ستان - نیران.

۵ - سامی عه بدولر ه حمان - سکرتری گشتی پارتی دیموکراتی کورده ستان - عیراق.

۶ - د. که مال فوئاد - زانای زمانه وانی و نه ندامی سه رکرده تی یه کیشی نیشتمانی کورده ستان - عیراق.

۷- د. عیسه مت شه ریف وانلی پره فیسۆر و میژوو نووس - سویرا.

۸- مه مه د عه لی نه سلان - شه خسیه تی کۆمه لایه تی - نه سه مه یۆل، تورکیا.

۹- ده مه مو د عه لی عوسمان - نه ندامی سه رکرده تی پارتی سۆسیالیستی کورده ستان - عیراق.

۱۰- سه لآخ به دره دین - سکرتری گشتی پارتی هه فگرتری گه ل - سویرا.

۱۱- نه حمه د قه ره مووس - فیدراسیونی کۆمه له کورده ستانه کان - سویند.

۱۲- ره زا چولپان - نه ندامی پارتی سۆسیالیستی کورده ستان - تورکیا، له کورده کانی ئوسترالییا.

۱۳ - سه عید مه لا شه خسیه تی کۆمه لایه تی - سویند.

۱۴- جه مشید هه بده ری - نووسه ر و رۆژنامه نووس - سویند.

نه وه ی شایانی پاسه ژمازه یه ک له میوانه کان له بهر نه گیشتی قیزه بۆیان نه کرا به شداری کۆنفرانس بکه ن. له سه ره تا دا نیقان

کیتایف وتاریکی کورته ی له سه ر ژانی کورده کانی سۆقیهت خوینده وه وتیا یدا مه به ستی به ستی کۆنفرانس که ی دیاری کرد.

پاشان نادرۆڤ وتاریکی دووو درژی خوینده وه له ژیر سه ر دیری «کورده کانی سۆقیهت - کیشه و چاره نووس» له وتاره که دا پاسی

میژوو هاتنی کورده بۆ ناچه کانی پشت قه ققاس وپاشان پاسی شۆرش مه زنی نوکتۆیه ری کرد . ده سه تکه وه ی کورده کانی پاس

کرد، به تابه تی دامه زانی ئۆتۆنۆمی کورده ستان له سالی ۱۹۲۳ و له نیو بردی له سالی ۱۹۲۹ دا، به درژی پاسی سیاسه تی راگۆیزان

و سه رکو تکرده ی کورده و گه لانی تری کرد له کانی فه رمان ره واپه تی ستالین و دوای ستالین. پاسی باری نیستی کورده

له سۆقیهت و مه سه له ی کورده ی به گشتی کرد له جیهاندا، ههروه ها بوچوون و داخوازی کورده کانی پیشاندا له چۆنیه تی

چاره سه رکردنی کیشە ی کورده له سۆقیهت دا. پاشان پاریس نیکۆلایفچ نه لینیینک به ناوی نه چومه نی نه ته واپه تی، نه چومه نی

بالای سۆقیهت وه وتاریکی خوینده وه وتینیدا په نه چه ی بۆ بریاره کانی پارتی و ده ولت و نه چومه نی بالای له مه ر چاره سه ر

کردنی مه سه له ی میلی ئه و گه لانه ی تووشی چه وساندنه وه و سه رکو تکرده ی راگۆیزان هاتبوون و مافی نه ته واپه تی یان پینشیل

کراپوو راکیشا، نه وه شی راگه یاند که له روانگه ی نه وه لگه نامانه وه چاره سه رنیک بۆ کیشە ی کورده ی سۆقیهت چاره نواره ده کری.

پاشان پره فیسۆر شاکرۆی محو وتاریکی خوینده وه له سه ر « باری قانوونی مافی نه ته واپه تی کورده یه کیشی سۆقیهت نا».

له دوای شاکرۆ، رینگا به میوانه کان درا وتار وسلانامه ی خویان له کۆنفرانسدا به خویننه وه. له رۆژی یه کهم و دوومه دا

زۆریه ی میوانه کان وتاره کانیان خوینده وه. (له بهر نه وه ی ده قی زۆریه ی وتاره کانیان له بهر ده ست دانیه و، ههروه ها نه گه ر هه ش بن

له لاپه ره کانی به ریانگ دا جینگایان نا پینته وه ، بۆنه داوای لی بووردن له خوینتران ده که بن) .

له رۆژی دوومه دا مه میند به پایف وتاریکی خوینده وه : « میژوو یه دابوونی ئۆتۆنۆمی کورده ». نه وه ی شایانی پاسه له

کۆنفرانس که دا مه لای موسلمان و شینخی ئیزیدیان به شداریان کرد بوو ، هه ره دوولاش له وتاره که ی خویاندا، پشان له سه ر نه وه داگرت

که بهر له هه موو شتییک نه وان کوردن، پاشان (موسلمان یا ئیزیدی). وه ک له کۆنفرانسدا بۆمان ده رکه وت ، هه ندی لایه ن له کۆماره کاند پڕۆیاگه نده ی نه وه ده که ن که ئیزیدی کورده نینه، تا

له سهر کونفرانسی کورده کانی سؤقیهت له موسکؤ

وه رگیزان وئاماده کردنی: چه مشید چه پدوری



سالی رابردودا و به شداری کردنی نوینه رانی کوردی سؤقیهت و کورد ناسانی سؤقیهت تییدا، رنگه خوشکهر و هاندهر بوو بؤ نهوی سؤقیهتیش هه لوئیستیکی هه بی، به لام نهک راسته وخو باسی مهسه لهی کورد و خه باتی رزگاریخوازی گهلی کورد بکات ، بدلکو شینویه کی ناوخوی پی بدری، نه ک دلی دؤستان و هاوپدیانه کانی به تاییه تی (عیراق) لی بشکی وده وله ته دراوسینکانی (تورکیا و تیوان و سوریا) له خؤ زویر کا! دیاره باری ناوخو و دهره وی سؤقیهت، گؤرانکاری جیهانی و سیاسه تی پیرستریکا و گلاسؤنست، چالاکئی رؤناکییرانی کوردی سؤقیهت ، دهرکه وتنی مهسه لهی کورد له قهواره ی ناوه خوی ولاته داگیرکهره کان و بوونی به مهسه لهی کی نینونه ته ویی و فراوان بوونی پشتگیری جیهانی ، به تیکراییی زهمینه خوشکهری به ستنی کونفرانسی کورده کانی سؤقیهت بوو.

کؤمیتتهی ریکخهری کونفرانس له ۲۵ کس پینکها تیرو به سه رؤکایه تی نه کادیی نادرؤف ، نادر کهریؤقیچ.

له و ۲۵ کسه ۶ یان کورد نه بوون. نه وشه شه نه وانن:

به گرامؤف ئیدوارد ته لیکساندرؤقیچ - یارده ری سه رؤکی کؤمیتته، دکتوریزانستی فلهسه فه، پره فیسؤر.

نیمیلیانیکؤ نه ناتؤلی فاسیلیچ - راویؤکهری به شی پدیوه ندی نه ته وایه تی کؤمیتته ی ناوه ندی پ.ک.س.

به ر له سالنیک کورده کانی سؤقیهت وه ک هه موو گهلانی تری یه کییتی سؤقیهت ، به تاییه تی نه وانه ی مافی نه ته وایه تی و مرؤقایه تی یان پینشیل کرابوو له سالانی ده ستله تی ستالین و برؤنیتف ، دوو چاری راگوزان و سه رکوت کردن هاتبوون ، که وته چالاکئی بؤ داوا کردنی مافه کانیا ن. سالنیک له مه ویه ر کورده کانی سؤقیهت چه ند بیرخهره و یان پینشیکش سه رؤکی سؤقیهتی و نه نجه مه نی بالائی سؤقیهت کرد و له موسکؤ خؤپیشاندانیا ن کرد. له و ماوه یه دا له هه ندی بریار و به لگه نامه کانی سؤقیهت له به ره ی پینشیل کردنی مافی مرؤف و نه ته وایه تی هه ندی له گهلانی دانیشتوی یه کییتی سؤقیهت ، له ته ک ناوی نه لمانه کان و ته ته ره کان و یونانیه کان ناوی کوردیش تۆمار ده کرا.

جگه له وه ی رووداوه کانی نه وچه ند سالانه ی کوردستان ، به تاییه تی دوا ی به کار هینانی چه کی کیمیاوی له لایه ن رؤنمی عیراقه وه دؤی گه لی کورد و بی ده نگی سؤقیهت له م رووه وه، هه روه ها به ستنی چه ند کونفرانس و کؤنگره یه ک دؤی به کار هینانی چه کی کیمیاوی و مه حکومی کردنی رای گشتی جیهان بؤ تاوانی قه لاچؤ کردنی کورد و پشت گوئ خستنی مافی مرؤف له هه موو به شه کانی کوردستان . بینگومان به ستنی کونگره ی پاریس له ئوکتؤبه ری

نامه‌ی یکی گزاره‌ی هیئت سیاستی کوردستان

بۆ کۆبوونه‌وه‌ی

بالی سهرانی ئه‌مه‌ریکا (هوش) و یه‌کێتی سۆقیه‌ت (گۆریاچۆف) له‌ هه‌لسه‌نگی له‌ رۆژی ۹-۹-۱۹۹۹دا

سهرزکاتی هه‌ژا

ئهمڕۆ که‌ ئه‌وه‌یه‌که‌وه‌ داده‌نێش بۆ ئه‌وه‌ی چاره‌یه‌ک بۆ کێشه‌ی رۆژهه‌لاتی ئه‌وه‌راست بۆزۆنه‌وه‌ که‌ له‌ ئه‌نجامی داگیرکردنی کۆرت له‌لایه‌ن سه‌دام حوسینی ده‌یکاتۆر و رۆژی به‌عسی عه‌زله‌وه‌ سه‌ری هه‌له‌اوه‌.

به‌رێزان

وه‌ک ئه‌وه‌ ده‌زان، ئه‌وه‌وه‌ی کوردی ۲۵ ملیۆنی، که‌ له‌ ئێران سنووری چوار ده‌وله‌ت دا ده‌وت، له‌ هه‌موو ماله‌نگی ئه‌وه‌وه‌ی و ده‌یوکرانی هه‌ژا به‌هه‌مه‌ کوردێکی عه‌راق که‌ به‌شێکن له‌ گه‌له‌ که‌مان، ماوه‌یه‌کی درێژه‌ له‌ پێش ئه‌وه‌یه‌ن ده‌یوکرانی و سه‌ره‌له‌یه‌تی خۆیه‌دا، ده‌ی سهرکۆله‌یه‌تی ده‌وله‌تی عه‌راق شه‌ر ده‌کات. هه‌روه‌ها، وه‌ک ئه‌وه‌ ئاگاذاڕن که‌ پارسی به‌عسی عه‌راق و سهرکۆله‌ ده‌یکاتۆره‌که‌ی شه‌رێکی نامرۆقانه‌ و ده‌وار ده‌ی گه‌له‌ که‌مان له‌ ئه‌حم ده‌وات، ئه‌وه‌ ئه‌وه‌ ئه‌وه‌ ده‌وه‌ ده‌ی ئه‌وه‌یه‌ن که‌ گازی کێسه‌ی له‌ ناوچه‌ی هه‌له‌ به‌ له‌ ئاداری ۱۹۸۸ و ناوچه‌کانی بادیه‌ن. له‌ ئۆتی (تاب) ۱۹۸۸ دا به‌کاری هه‌تا.

سهرکۆله‌یه‌تی عه‌راق ئه‌وه‌ ئه‌وه‌ ئه‌وه‌ ده‌یوکرانی کورد ده‌کات، به‌له‌که‌ له‌ ساڵی ۱۹۸۰ دا شه‌ری ده‌ی ئێران هه‌له‌گیرساند و له‌ مانه‌گی واره‌وه‌شدا په‌لاماری کۆتی ده‌ی به‌مه‌ش چاره‌ی ئه‌وه‌ی سه‌ماند که‌ ئه‌وه‌ هه‌ژا کۆسپه‌که‌ له‌ رۆژی سه‌قامگیربوونی ئاشتی و هه‌شبه‌یه‌تی له‌م ناوچه‌یه‌دا.

به‌یازنامه‌ی ئه‌مه‌ریکی ئاشتی ئه‌وه‌ ده‌وتان سه‌باره‌ت ئه‌وه‌ ده‌واتی ئه‌وه‌وه‌ی عه‌راق، باری هه‌یشه‌که‌ی عه‌راقی ته‌گۆزی.

سهرکۆله‌یه‌تی ده‌یکاتۆری عه‌راق کۆسپه‌له‌یه‌ر مانی عه‌ره‌یه‌کانی عه‌راقیشدا. سهرکۆله‌یه‌تی ده‌یکاتۆری عه‌راق هه‌موو ماله‌ ده‌یوکرانیه‌کانی گه‌لی عه‌ره‌یه‌ن عه‌راقیشی په‌شگۆی خه‌سه‌وه‌.

سهرزکاتی هه‌ژا

هه‌به‌ستی کۆبوونه‌وه‌ که‌تان دا به‌ن کردنی ئاشتییه‌کی به‌ره‌وه‌مانه‌ له‌ رۆژهه‌لاتی ئه‌وه‌راست دا، ئه‌مه‌، ئه‌وه‌ ده‌واتی گه‌لی کورد داوا کاره‌ن که‌ کێشه‌ی کوردیش وه‌ک مه‌سه‌له‌یه‌کی گرتک به‌خه‌رته‌ رۆژه‌ی کۆبوونه‌وه‌ که‌تان.

سهرزکاتی هه‌ژا

ئه‌مه‌ وه‌ک له‌یه‌که‌ داخوازیان له‌ ده‌که‌یه‌ن:

- له‌ هه‌موو هه‌نگاوه‌کی ئه‌وه‌ به‌وه‌یه‌تیدا، که‌ مه‌سه‌له‌کانی رۆژهه‌لاتی ئه‌وه‌راست دینه‌ گۆزی، ئه‌وه‌ ده‌واتی گه‌لی کوردیش وه‌ک له‌یه‌تی گرتک به‌خه‌رته‌ به‌ر چاره‌.

داواکانی به‌ره‌ی کوردستان عه‌راق که‌ ئه‌وه‌ ده‌واتی گه‌لی کورد له‌ عه‌راقدا ده‌کات، ده‌یه‌ن راجا و به‌کرت و له‌ ئه‌وه‌ به‌کرتوه‌ که‌ ئه‌وه‌ پارێزگاری له‌ به‌کرت، هه‌وا داره‌ن که‌ ئه‌وه‌ له‌م روه‌وه‌ هه‌نگاوی پێوست باوێن.

ئه‌وه‌یه‌ ده‌واتی که‌ ئه‌وه‌ له‌م کۆبوونه‌وه‌ به‌ره‌وه‌تاندا له‌ سه‌ر رۆژهه‌لاتی ئه‌وه‌راست دا، له‌ مه‌ر مانی ئه‌وه‌ ده‌واتی گه‌له‌ که‌مان به‌یاری چاک وه‌ریگیرن.

داوا‌ی سه‌رکه‌وتنه‌ن بۆ ده‌که‌یه‌ن .

۹-۹-۱۹۹۹

- به‌ره‌ی کوردستان عه‌راق

- ده‌فکری رزگاری خوازی گه‌لی کورد (ته‌فکری)

- پارسی رزگاری کوردستان (رزگاری)

- پارسی ده‌یوکرانی کوردستان - توکیا (پ. د. ک. ت.)


- ده‌فکری سۆسیاله‌سی کوردستان (ت. س. ک.)

- رزگاری خوازی ئه‌وه‌وه‌ی کوردستان (ر. ن. ک.)

- پارسی ده‌یوکرانی کورد له‌ سوویا (اله‌پارسی)

- پارسی ده‌یوکرانی په‌شگۆری کوردی سوویا

- پارسی گاره‌که‌راتی کوردستان (ک. پ.)




داخوازی و مەرجەکانی، وای لە سەدام کرد کە سەری گلۆله وون بکات، وکەوتە هەنجەت گرتن لە دەولەتەکانی کەنداو، بەتایبەتی کۆیت، بە بیانۆی ئەوێ لەکاتی شەری ئێران و عێراق دا، ئەوتی چاوکانیەکانی «الرمیله» دزیو، جا کۆیت پنیوستە نەک تەنیا لەقەرزهکەیی خۆش بێت و دورگەیی > بویانیش بەعێراق بپەخشێ، بەلکو بەشداریش لەبنیات نانهوێ عێراق دا بکات. کۆی هەموو هۆبەکان لەلایەک، خۆ بەزل زانی سەدام لەلایەکی ترهوه، چاوپۆشی دەولە تانی جیهان لە سیاسەتەکەیی لەلای سینیەمەوه، وای لەسەدام کرد کە لە رۆژی ۲-۸-۱۹۹۰ دا کۆیت داگیر بکات. سەدام لەو رگرتنی ئەو بریارهێ دا تووشی هەلە بەکی بەگەرە بوو، کە پەلامارو دەست درێژی کردە سەر شارەگی ژبانی ولاتە سەرمایەدارو پیشەسازەکان چونکە باری نوێ نیووه ولەتان و هاوکاری نیوان سوڤیەت و ئەمریکای لەبەر چاوە نەگرت. جا دونیای هەموو لێ هەستا، ئەنجومەنی ناسایشی نیووه ولەتان بە بەدک دەنگ بریاری ۶۶ وەرگرت، وداوایان لە عێراق کرد کە بەزوتترین کات و بەبێ مەرج خۆی لە کۆیت بکیشیتەوه، ئەگینا ئاھلۆقەیی ئابووری دەدری، بریارەکانی ئەنجومەنی نیووراو گەیشتۆتە ۶۶۷، بەلام سەدام تا ئیستا نیازی دەرچوونی پیشان نەداوه، بەلکو لەگەڵ ئێزان کەوتۆتە مامەلە کردن و چۆک دادان بۆ داخوازیەکانی تاران و ریکەوتنامەیی ئەلجەزایسری ۱۰۰۱۹۷۵ بینگومان هەلونیستی ولاتە بەگرتووه کانی ئەمریکا و هاوڕەییانەکانی کە دژی سەدام وەستان و لەبەر چاوی رەشی شینخەکانی کۆیت نیه، نە مەسەلەیی پینشیل کردنی مافی مرۆڤه، بە لکو مەترسی گەیشتۆتە سەر بیرەنەوتەییەکانی کەنداوی فارسی و، هەر وەها عێراق بوەتە دەولەتێکی بەهێز لە رۆژەلاتی نیوهراستدا، کە مەترسی لەسەر بوونی ئیسراییل هەیدە.

و هیزە بەرھەلستکارەکان ئەوێ چەندان ساڵە بە گۆی جیهانی رادەگەین و داوای پشتگیری گەلی عێراق و کوردستانیانی لێ دەکەن ... بەلام کە پرۆشکی ناگر خەرمانە کە یانی گرتەوه، ئەوسا لە گۆی گا دەرچوون... بینگومان ئەگەر سەدام حوسین هەزار ئەو نەندەیی تر خوینی کوردی برنشتبایە، ئاسەواری گەلی کوردی بسرببایەوه و هەر بێ دەنگ دەبوون. ئەگەر چی ئینە لەگەڵ شەر نین، چونکە ئەگەر شەر روویدات و شک و تەر پینکەوه دەستووتین بینگومان بێ ئەمەکی سەدام و هەلگرانەوێ، لە بەرژووەندی کوردەو، بەلام لەناو بردنی رۆمی سەدام و تینکشاندنی هیزە چەکدارەکەیی لە ئەنجامدا لە بەرژووەندی هەموو گەلاتی رۆژەلاتی ناوهراستە. لە رۆژی ئیستا دا ئاخۆ، بزوتنەوێ کورد چۆن هەلس کەوت لەگەڵ رووداوەکان دەکا؟، وەک شەری ئێران و عێراق خۆی ناکاتە پاشکۆی ئەم و ئەوا بە بەدک دەنگ و بەدک هەلونیست و بەدک سیاسەت سوود لەو دەرفەتە وەرەگەری؟! . . .

ئیستا هەموو رۆژنامە و گۆڤارو دەزگاکانی راگەیانندی جیهان سەدام حوسین بە دیکتاتور و بە هیتلەر دەشوبهینن و هەزار پاش ناوی بۆ دەدۆزنەوه، بەلام هەر ئەو سەدام حوسینە بە کە بزوتنەوێ کورد

داگیرکردنی کویت له لایهن رژیمی به عسی عیراقه وه

جهمشید جه پداری



له و رژۆهی که به عسی دهستی به سهر حکومی عیراق دا گرتوه، به رده وامه له پیشینل کردنی مافی مرۆف له عیراق و کوردستان دا. له ماوهی ئه و چهند سالانهی دواییدا، به تایبته دواي ئه وهی سه دام حوسین بووه سه رۆکی عیراق، لاقاوی خورن عیراقی گرتوته وه، به هه زاران ئینسان بونه ته قوربانی، جگه له کوژراوه کانی شه ری ئیران و عیراق (۹۸-).

په ده فرۆشت، بینگومان لیستهی ئه و ولاتانهی چه کیان به عیراق ده فرۆشت ده بیان ده ولته ده گرتته وه ، له ئه و روپای رۆژاوا تا په کینتی سؤقیته. له دواي ناگر بهستی شه ری نیوان ئیران و عیراق له سالی ۱۹۸۸ دا، رژیم ده رفه تینکی باشی به ره خسا به لیدان و سه رکوته کردنی خهباتی چه کداری له کوردستان و تاراده په کی زور هینه به ره هه لستکاره کانی مه پدانی خهباتی له کوردستان دا په شوبلا و کردوه . دیسان جیهانی نازاد و ده ولته زله یزه کان، شینخه کانی که ندا و ده ولته موسلمانان له ئاستی تاوانه کانی به غدا به ده نگ بوون .. سه دام ههستی به وه کرد وه ک بلیزی له شه ره که دا < سه رکه وتوو> ده رچوه، له هه مان کاتیشدا ، قهیرانی ئابووری قهرز و کینشه ی ناوه خو تهنگی په هه لچنیوه ، هاوکات باری نه ناشتی نه شه ره که له ئیران دا، و پاشه گهز نه بوونی ئیران له

۱۹۸۸، ئابووری عیراق تینکچوه، ولات ، به تایبتهی کوردستان ویزان کراوه. ئه وه سی ساله رژیمه په ک له دواپه ی په کانی عیراق به هه موو تاوانا یانه وه به زووتنه وهی کورد سه رکوته ده کهن، تا راده په ک له کاتی شه ری ئیران و عیراق، حکومهتی به غدا په نای برده بهر دژوارترین چه ک، چه کی کیمیایی که یاسای نیو ده ولته تان قه ده غه ی کردوه، ههروه ها به رده وامه قه لاچۆ کردنی که لی کورد. به لام رای گشتی جیهان و ده ولته زله یزه کان و ده ولته تانی ئه وریا که هه رده م قه وانی مافی مرۆف لی ده ده ن و باسی نازادی ده کهن ههروه ها ولاته عه رب و موسلمانان گویان که ر کردبوو، چاویان له هه موو تاوانه کانی رژیمی به غدا دا پۆشی بوو، به لکو له کاتی شه ری نیوان عیراق و ئیران دا هه موو لایه ک دهستی یارمه تیان به رژیمی دیکتاتۆری عیراق درێژ ده کرد ، و تازه ترین چه کیان

بن. پاشان کاک شیرکۆ بِنکَس و تارنکی به سۆزی خوینده وه. له کۆتاییدا کاک ئهمیری قازی به ناوی خانه واده ی قازیه وه سوپاسی ههموو رنکخرا وههیزه سیاسیه کانی کرد که به نامه و پروسکه سهره خوشیان لی کردن و به شداری خهم و پدژاره یان بوینه ، ههروه ها سوپاسی ئه وه خه لکدی کرد که ئهرکی به شداریان کیشاوه له ری و ره سمی ناشتنی تهرمی عیفه تی شهید داو ئاماده بوینه

دهسته ی نووسهرانی به ریانگ ئه و تاوانه مه حکوم ده که ن و سهره خوشی له خانه واده ی قازی ده که ن



مال ئاواپی له عیفه تی قازی

بوو. خوینی گهشی پای عیفه ت ، لاپه ره به کی تری خویناوی و شه ره فه ندی میژووی کورد و خانه واده ی قازی تۆمار کرد. ئه و تاوانه چه په له ی داگیر که رانی کوردستان که ده ستیان نه پاراسته وه له به کار هینانی ههموو جوژه چه کینگ بۆ کپ کردنه وه ی دهنگی ئازادی گه لی کورد و خه بات گیزانی میلله تانی ناوچه که. ئه گه ر دوژنان پینان وایی به م کاره درندانه یان چۆک به ئازادپه خوازان داده نین به ده له چوینه ، چونکه ئازادی وه ره گیرئ و نادرئ وه ک ف. بِنکَسی شاعیر ده لی:» داری ئازادی به خوین ئاو نه درئ قه ت به ر ناگری».

له رۆژی ۶-۹-۱۹۹۰ دا ، له شاری فینسته رۆس، له ولاتی سوید دا، له رنکای نامه ی ته قینه ره وه، که خرابوه سه ندوقی پۆستی کاک ئهمیری قازی، به ده لکه وت ئه و رۆژه عیفه تی هاوسهری سه ندوقی پۆستی کرده وه و نامه که به کسه ر ته قیده وه و داوی ۴. ده قیقه به ک پای عیفه ت گیانی پاکی سپارد و دوومالی له دوا به چی ما. له رۆژی ۲۲-۹-۱۹۹۰ دا له ری و ره سمی ناشتنی تهرمی شه هیدی نیشتمان، خوشکه عیفه تی قازی دا زینتر له دوو هه زار که س، له ههموو پارچه کانی کوردستان، له ههموو شارو شاروچه کانی سوید بۆ به شداری کردن له ناشتنی تهرمی شه هید روویان کردبووه فینسته رۆس .، تهرمه که له ناوه ندی شاره وه تا قه برستان که سن کیلومیتهر رنکا بوو ، هه رچه نده رۆژنکی دژوار و باران بوو به لأم له گه ل ئه وه شدا خه لکی رنچه کی به ست، له کاتی به ری که وتنی تهرمه که تا قه برستان ماتهم و بی دهنگی شاپه ری به سه ر خه لکه که دا دا کینشابوو ، خه لکه که ها ته یون دوا مائاوی له عیفه ت به کن و به لین دوویات به کنه وه بۆ گلکۆی شه هیدان که درۆه به خه بات ده دن تا ئه و رۆژی کوردستان ئازادی وه ده ست دینی.

مامۆستا مه لا ره حیمی عه باسی له وتاره کهیدا داوی له ههموو کوردان کرد: به ک بگرن، ناکۆکی و دوو به ره کی وه لاده ن. سه رۆکی کۆمیته ی سویدی بۆ پاراستنی مافی کورد C.H. Herrmansson تاوانی کوشتنی عیفه ت و قهرقهرنی کوردی مه حکوم کرد و پشتگیری کۆمیته و کۆمه لگای سویدی نیشان دا بۆ خه باتی ره وا و مافی مرۆفی کورد که به ئازادی و سه ره سه تی بژین له کوردستان یا له هه ر شوینی تر

عیفہ تی قازی

لہ کاروانی شہیدانی
کوردستان

نہوتی چرای تازادی خونین و تارہتی خدہاتکہرانہ



رژنمہ داگیرکەرەکانی کوردستان،
ئەوانەیی بە خوینی کورد
تینوون، تینووتیان بە لاقای خوین
ناشکی که هەموو رژژنگ لہ
کوردستان داریشتویانە و دەپرژن،
هەموو بستنیکیان لہ خاکی
کوردستان بە خوینی ئالی
پینشمەرگەو رژلە تینکۆشەرەکانی
کوردستان ئاوداوە، هینشتا خوینی
شەهیدانی هەلەبجەو بادینان
نەمەیی بوو وە کە رژنمی
ئاخوندەکانی ئیزان تەوری خزیان
وہشاند و تیرۆریان گواستەوہ یز
دەرەوہی ولات، لہ ۱۳-۷-۱۹۸۹
دا لہ شاری قیندا، زانای گەرورە
رێبەری لێھاتووی کورد دکتۆر
ئاورەحمانی قاسملو و دوو ہەقالی لہ
خویندا گەوزاند و شەھید کرد. لہ
دوای کوشتنی د. قاسملو، بە کرێ
گیراوەکانی ئیزان چەند تیرۆری
تریان لہ ئەوروپا بە ئەنجام گەیاندوہ
لەوانە: تیرۆرکردنی فرەیدونی
کشاورز (قبرص)؛ د. کاظمی رەجوی
(جنیٹ)؛ عدلی کاشف
پوور (تورکیا)، قوربانی ئەو جارە،
داکینکی دلسۆزی کوردستان
، عیفەت خاتوونی کچی پینشەوای
نەمری کوردستان قازی محەمەد

بەريانگ

ئۇرگانى فېدراسىيەنى كۆمەلە كوردستانىيە كانەلە سۆند

بەرپرسيار
ن. كرىف

دەستەي نووسەران

ئاسۇگەرمىيانى ئا. تگريس
ج. حسەيدەرى ل. جەنگين
م. ماسايى م. عەلى. ك
رۇھات تەمۇزىين

ئابونەي سالانە: ۱۰۰ كرونى سۆندىيە
بۇ دەزگاکان ۲۰۰ كرونى سۆندىيە

دەستەي نووسەران بەرپرسيار تىبەلە نووسىن و وتارەكانى
فېدراسىيەن و لەور نووسىنانەي بە تىمىزاي خاوەنەكانىيان
پلاۋدە كرىنەۋە.

ئاونىشان:

BERBANG
Box 45205
104 30 STOCKHOLM

تەلەفون:

08-668 60 60

پۇستگىرۇ:

64 38 80-8

زھارە (۶۶)، سال ۹
سىپتەمبەرى ۱۹۹۰

لەم ژمارە يەدا

بەشى كرمالچى خواروو

- ۶۴- داگىر كوردنى كوئىت.....
۶۲- نامە يەكى كرايەۋە.....
۶۱- رېپورتاژنىك لە سەر كۇنفرانسى كوردە كانى سۇقىدەت لە مۇسكۇ.....
۵۹- بەيانى كۇتايى كۇنفرانسى مۇسكۇ.....
۵۷- بانگەوازنىك بۇ گورباچۇف.....
۵۵- وتارى گۆمەلەي رۇنايى لە گورجستان..
۵۳- خۇيشاندانى كوردە كانى سۇقىدەت لە مۇسكۇ
۵۲- كۇنفرانسى كوردە كانى سۇقىدەت لە راگە ياندنى سۇقىدەتدا.....
۵۰- پىنگاي ھەق.... (پاشماۋەي ژمارەي رابردوو)
۴۸- كورد قران و ياساي نىۋدە ولەتان.....
۴۴- پەناپەرانى كوردى عىراقى لە توركييا.....
۴۲- پۇستەي بەريانگ....
۴۱- خەلانى بەريانگ بۇ چىرۇك و ھەلئەست

كرمالچى ژووروو

- چ، نە سىياسەتە ن. كرىف..... ۵
دوۋمىنىن گەلى كورد قى جارى ژى نامە يىن ب بۇمبە ب كار
ئانين و عىفەت قازى كوشتن..... ۶
خۇدكە بنانى خۇ و يەردە گىيانى خۇ... ل. جەنگين
وئا. تگريس... ۸
كۇنفرانسا كوردىن سۇقىدەتلى ل مۇسكۇ قايى... ج. حسەيدەرى
۱۵۰۰
پىنۇستە كو ھوققناسىن كورد ل سۆندى... ل. ھەموو ولاتىن
نەورۇبايى رىكخستنى خۇ خورت بكن. ئىبراھىم
گوچلو... ۲۲
ھەر كو دچە ئەسرا كىشى د ئاف بيانان دە زىدە دىبە ..
عابد ديارە كرى... ۲۴
ل سەر رۇمانا عەلى عەبدولرەحمان..... رۇھات
۲۶.....
ژ بۇ گولۇ بەرپرەز د بەرقا دە ژ بىر نەكەين ، نەحمەد
حوسىنى... ۲۸
بىن ئابونى رۇۋنامە < رىا تازە > «بانگ» .. تىمورى
خەلىل... ۳۱
سمىرنۇف (چىرۇك) ،..... حسەنى مەتى... ۳۳
بەشى دىلى (زاا) يى
حەمە پارتىيى كوردان ژەو بى و نى فەرسەندى مەرمەنى!
ح. دلۆنەن... ۳۶
تىمورى خەلىل: ما دۇ ب ھەرقاندى لاتىيا بكەرى. ۴

به‌ربانگ

سال «۹»

گۆناری فیدراسیونی کۆمهله کوردستانییه‌کانه له سوئد

ژماره ۶۶



رووداوێکی میژوویی له ژبانی کوردەگانی سوڤیه‌ت‌دا

